


## JI EDÎTOR

# XWENDEVANÊN HÊJA,

Bi heyecaneke mezin û bi kêfxweşî hejmara yekem a kovara *Komîn*ê pêşkêşî we dikin. Ev kovara ku di bin sîwana Akademiya Zanistên Civakî ya Abdullah Ocalan de hatiye amadekirin, bi armanca vekirina qadeke ji bo têgihiştin û nîqaşkirina dînamîkên veguherîna civakî di aliyê bîrdozî, zanistî û teorîk de ye.

*Komîn*, weke ku ji navê wê jî diyar dibe, wê bibe kovareke ku li gorî îdealên jiyana komînal, hevgirtin, hilberîna hevpar û azadiyê ava bûye. Em di wê baweriyê de ne ku çanda parvekirin û jiyana hevpar ku yek ji nirxên herî qedîm ên civakan e, divê îro hîn bêhtir were kûrkirin. Em ê di van rûpelan de hêza jiyana komînal, wateya civakbûn û têkoşîna bi hev re, li dijî pêkhateya ferdperest, tecrîtkar a modernîteya kapîtalîst, ji nû ve kifş bikin.

*Komîn*, bi îlhama ramanên Rêber Apo û bi modela wî ya pêkhatina civakî ya li ser esasê konfederalîzma demokratîk, ekolojî û azadîxwazîya jinê, armanc dike ku di her hejmarê de bi ramanên nû û nîqaşên nû vê modelê zêdetir bimeşîne. Em ê pêvajoya rizgariya civakan de, çawaniya girêdana di navbera zanîna zanistî û pratîkê de û bandora lêkolînên teorîk li ser tevgerên şoreşgerî binirxînin. Şoreşa Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî ezmûnek li ser bingeha vîna gel a xwerêveberiyê ye. Ev tecrube ne tenê ji bo gelên herêmê ji bo hemû cîhanê xwedî potansiyela jiyanêke alternatîf e.

*Komîn,* ji bo kûrkirina nîqaşan li ser çawaniya avakirina vê alternatîfê de perspektifekî teorîk û pratîk deynê. Mebesta me ne tenê rexnekirin e, di heman demê de çareseriyê ye jî.

*Komîn*, armanc dike ku platformeke nîqaşê ya zanistî û îdeolojîk pêşkêş bike. Em ê lêkolîn bikin ka mirov çawa dikare vîna xwe ya xwerêveberiyê di pratîkê de bi pîvanên teorîk û pratîk ên jiyana komînal bi cih bîne. Di vê pêvajoyê de em ê bi perspektîfeke berfireh binirxînin ka her ferdek çawa dikare li gorî ruhê peymana civakî tevkariyê li vê pêkhateyê bike.

*Komîn,* dê ne tenê bibe platforma ramanê, di heman demê de dê bibe amûra kûrkirina têkoşîna civakî.

Em we xwendevanên xwe yên hêja jî vedixwînin ku beşdarî van nîqaşan bibin û bîr û baweriyên xwe bi me re parve bikin. Em di wê baweriyê de ne ku ji bo avakirina civakeke adil, wekhev û azad, bi hev re dikarin gavên girîng bavêjin.

Bi hêviya dîtina we di hejmara din de…

Bi silavên me yên şoreşgerî,

# NAVEROK


1 JI EDÎTOR

2 LI SER HEQÎQETA HEQÎQETÊ
Firat GERNAS

3 JÎYANA KOMÎN A DEMOKRATÎK Û FERDÊ AZAD
Rêber Apo

4 TÊGÎN Û TÊGEH
Şervan Xebat

5 PÎVANÊN JÎYANA CÎVAKÎ
Evindar Mustefa

6 AVAHÎYÊN CÎVAKÎ YÊN KU SÎSTEMA DEWLETÊ QEBÛL NAKÎN
Delil Zilan

7 KOMÎN ÇÎ YE?
Eylül Rizgar

8 BÎNGEHA JÎYANA CÎVAKÎ KOMÎN
Nesrîn Farqîn

9 TEVGERÊN KOMÎNÎ
Şoreş Mêletî

10 ÇEKA DÎJ KOMÎNÊ: EZ EZÎTÎ
Berxwedan Botan

11 DÎ HEVPEYMANA CÎVAKÎ DE RÊXÎSTÎNA KOMÎNÊ
Sinan Cudi

12 ÇARÇOVEYA XEBATÊN KOMÎN Û KOMÎTEYÊN WÊ?
Cafer Amed


13 TÊKÎLÎYÊ KOMÎNAN BÎ REHENDÊN NETEWA DEMOKRATÎK DÎVÊ ÇAWA BE?
Sinan Xemgin

14 HER TIŞT DI JÎYANÊ DE TÊ QEZENCKIRIN!
Rozan Mêrdîn

# Tezên Azadîyê

## Jiyana Komîn a Demokratîk û Ferdê Azad

RÊBER ABDULLAH OCALAN



Ferd û welatiyê neteweya demokratîk bi qasî azad e, ewqasî jî divê komunal be. Ferdê azad ê sexte yê ferdperestiya kapîtalîst ku li dijî civakê hatiye sorkirin, bi xwe di nava koletiyeke pêşketî de ye. Lê îdeolojiya lîberal îmajeke welê çêdike, mîna ku ferd di civakê de xwedî azadiyên bêserûbinî ye. Rastî bi xwe tiştekî din e, ferdê koleyê kedê yê mûçegir meyla kara herî zêde pêk tîne, wê vediguherîne sîstema hegemonîk û ev ferd şêweyê koletiya herî bipêşxistî temsîl dike. Ferdê em behsa wî dikin di nava perwerde û jiyana pratîk a netew-dewletê de tê afirandin. Ji ber ku bi serweriya pereyan ve hatiye girêdan, sîstema heqdestiyê mîna toqa kûçikekî xistibin stûyê wî çawa dixwazin wî wisa dimeşînin û bi çi deverê ve bixwazin berê wî didin wir. Ji ber ku ji bo bijî wekî din ti çareya wî tine ye. Eger jê bireve ango bêkariyê tercîh bike, ev jî bi awayekî perpitîna şipiya îfade dike. Jixwe ferdperestiya kapîtalîst li ser bingehê înkara civakê bi gewde bûye. Bawer dike ku çiqasî rêûresm û çanda civaka dîrokî înkar bike wê karibe xwe pêk bîne, bi gewde bike. Berevajîkirina herî mezin a îdeolojiya lîberal jî ev e. Slogana wê ya sereke jî bi vî rengî ye, "Ferd heye, civak tine ye." Kapîtalîzm sîstemek e ku bi nexweşî û şewbê ye, û li ser bingehê qedandin û nehiştina civakê heye.

Li hemberî vê, ferdê neteweya demokratîk azadiya xwe di komunalîteya civakê de dibîne ango di civakên piçûk ên bêhtir kêrhatî de dibîne. Kom an komuna demokratîk û azad dibistana bingehîn e ku ferdê neteweya demokratîk lê çêdibe. Yê nebe komun, yê bi komunî nejî, ferdîtiya wî jî pêk nayê. Gelek cureyên komunan hene û di her qada jiyanê de dibin. Li gorî cudahiyan, ferd ji komunekê zêdetir dikare di nava koman de cih bigire. Ya girîng ew e, ferd li gorî qabîliyetên xwe, li gorî ked û cudahiyên xwe zanibe di nava koman de cih bigire. Ferd berpirsiyariya xwe ya beramberî komun an jî koma girêdayî wê ye, weke pîvana sereke ya exlaqîbûnê dihesibîne. Exlaq girêdan û hurmeta ji bo komê û jiyana komunal îfade dike. Komun yan kom jî heta dawiyê xwedî li ferdên xwe derdikeve, bi vê jî wan diparêze û jiyana wan misoger dike. Jixwe prensîba bingehîn a avabûna civak û komuna mirov ev prensîba berpirsiyariya exlaqî ye. Karektera demokratîk a kom û komunan azadiya kolektîf pêk tîne, bi gotineke din kom û komunên polîtîk pêk tînin. Kom û komunên ne demokratîk nikarin polîtîk bibin. Kom û komuna ne polîtîk jî nikare azad bibe. Di navbera demokratî, polîtîkî û azadiya komunê de wekheviyeke şidandî û hişk heye.

Şertê pêşî yê neteweya demokratîk ew e, divê ferd azad be û vê azadiya xwe bi kom û komuna pê ve girêdayî ye, li ser bingehê polîtîkaya demokratîk pêk bîne... Em divê weke prensîbeke exlaqî nas bikin û qebûl bikin ku kesê jiyana wî ya komunal nebe, ferdiyeta wî jî ne mumkîn e. Em divê ji bîr nekin ku endambûna kom an jî komunekê di heman demê de timî aliyekî xwe yê demokratîk heye. Kom an jî komun kengî bi awayekî demokratîk tevgeriya dikare polîtîk be ango dikare azad bibe. Hingê mirov ê karibin serwext bibin ku bi vî awayî her kom û komun di heman demê de yekeyeke civaka exlaqî û polîtîk e.

Her kom û komuna KCK'ê di heman demê de yekeyeke exlaqî û polîtîk e jî. Welatî û ferdên wê jî ferd û welatiyên exlaqî û polîtîk in. Em dema behsa kom û komunan dikin, mebesta me di her qada civakê de komên mirovan ên kêrhatî ne. Mînak gundekî bi xisletên komunê rabe yanî şertên komunbûnê bi cih anîbe, ew kom an jî komunek e, û mirov dikare vê pênaseyê ji bo kolan û bajaran jî bi kar bîne. Kooperatîf, fabrîke, weqif, komele û rêxistiniyeke civakî dikare bibe komunek. Ji ber ku di heman demê de divê demokratîk bin, mirov dikare ji wan re bibêje nîzama komunal a demokratîk

Mirov dikare jiyana komun li tevahiya qadên perwerdehî, çandî û zanistî pêk bîne, her wisa mirov dikare jiyana civakî û polîtîk jî hem komunalîze bike û hem jî demokratîze bike. Welatî û ferdê azad bi tenê dikare di nava vê jiyana komunal a demokratîk de pêk bê.

Bi giştî welatî û ferdê neteweya demokratîk, bi taybetî û bi şêweyê bêhtir berbiçav welatî û ferdê KCK'ê hewcedariyeke jiyana bi berpirsiyarî, exlaqî û polîtîk e

Ev hewcedarî di heman demê de divê weke erk û mafekî bingehîn jî bê fêhmkirin. Kengî netew-dewlet van maf û erkên me yên bingehîn qebûl kirin, Kurd jî dikarin erk û mafên bingehîn ên welatîbûna van welatan qebûl bikin. Avakeriya neteweya demokratîk li Kurdistanê hem ji aliyê teorîk ve û hem jî ji aliyê
pratîk ve hebûna Kurd û jiyana wî ya azad a divê mirov li ser zêde bisekine û veguherîne bi awayekî dîrokî û civakî îfade dikeDi asta eşqeke rastî de heqîqeteke xwefedakirinê ferz dike îfade dike. Di vê riyê de cih ji ti eşqa sexte re nîn e, her wisa cih ji rêwiyên sexte re jî tine ye. Li ser vê riyê, bi qasî hingivê nisilandî di dîroka mirovatiyê de çi tiştê erênî hebe ji rêwiyê wê re hatiye pêşkêşkirin. Li ser vê riyê, pirsa avakeriya neteweya demokratîk wê kengî bi dawî bibe, pirseke bêkêr e, û hewceyî pê nîn e. Ji ber ku heta mirovatî hebe wê ev avakerî temam nebe. Heyînên di gerdûnê de çawa her kêlî xwe ji nû ve diafirînin, mirov jî hebûnek e ku her kêlî dikare bi îradeyeke azad xwe biafirîne û lewma avakeriya neteweya demokratîk jî xwediyê wê azadiyê ye ku dikare her kêlî xwe ji nû ve biafirîne. Ji aliyê civakbûyînê ve ne utopyayek û ne jî rastiyek ji vê bi îddîatir heye. Li gorî rastiyên xwe yên dîrokî û civakî Kurdan bi awayekî bi hêz berê xwe daye avakirina neteweya demokratîk Jixwe bi rizgarbûna ji xwedayê netew-dewletê yê qet jê bawer nekirin û bi darê zorê ketin bin tesîra wî, tiştek ji dest nedan; berevajî ji barekî giran, hem jî ji barekî ew biribûn ber îmha û tinebûnê rizgar bûn. Tevî vê, bûn xwedî derfet û îmkan ku karibin bibin neteweya demokratîk. Ev destketiyeke wisa ye ku çiqasî qîmetê wê bê zanîn ewqasî hêja ye.

Kurd divê weke ferd û civak avakeriya neteweya demokratîk mîna sentezeke tevahiya heqîqet, berxwedan û heta baweriyên xwedawendan ên kevin û ji Zerdeştiyê heta bi Îslamê hemû îfadeyên ji kûrahiya dîrok û civakbûnên xwe dawerivî, fêhm bike, qebûl bike, bike malê xwe û bi cih bîne. Dîsa bi qasî tevahiya doktrînên mîtolojîkdînî û felsefî tiştên zanista civakî ya hemdem dixwaze bide fêrkirin, yek bi yek serîrakirin û şerên berxwedanê hemû û bi awayekî giştî heqîqetên dixwazin bînin ziman, bi gewde û zêhnê avakirina neteweya demokratîk têne temsîlkirin.

Ez ne bi tenê xwe car caran ji nû ve diafirînim, ber bi roja me ya îro, hema bêjin min hewl da ez xwe her kêlî ji nû ve biafirînim. Dema min ev kir, ez bi vê rastiyê û weke heqîqet bi îfadeya wê tevgeriyam. Bi vê, min bi awayekî azad xwe kir civakî, min xwe weke neteweya demokratîk (Kurd) berbiçav kir. Min xwe weke modernîteya demokratîk ji tevahiya mirovatiyê re, ji tevahiya gelên bindest ên Rojhilata Navîn û ferdên wê re pêşkêş kir.

Gelo dibe ku der barê siberoj û paşerojê de utopyayeke min a şexsî hebe? Di çarçoveya sînorên temenê mirov de bi hêviya utopyayên siberojê û der barê rabihuriyê de bi hesreta serdemên zêrîn mirov hewl bide bijî, heke mirov hay jê nebe, dibe ku jiyanê bi xwe pûç bike û ji armanca wê dûr bixe. Ya girîng ew e, mirov bi qedr û qîmetê kêliyê zanibe û bijî. Ya herî qenc ew e, mirov kêliyê bê rabihurî û bê siberoj nejî. Jiyana zanyarane ew jiyan e, rabihurî û siberoj bi awayekî azad di kêliyê de bêne ziman. Moderniteya kapîtalîst û çanda wê ya koleker mirovî ji rabihurî û siberojê bêpar dike û dike ku mirov kêliyê bi awayekî heywanwarî biqedîne.

Li dijî vê çanda jiyanê ya heywanker a ferdperestiya kapîtalîzmê, divê ferdê moderniteya demokratîk hesreta rabihuriya serdema zêrîn û hêviyên siberoja bi utopya bi kêliya komên komunal ên demokratîk re bike yek, xebatê weke azadî bihesibîne û divê di alternatîfbûnê de bi ser bikeve.

Ji ber wê pêdiviya zêde ya dîrokî û civakî, heta niha ez ji bo nasnameyeke kolektîf û azad a Kurd û nasnameya neteweya demokratîk xebitîm. Ji bo kêliyekê be jî firsenda min ji bo jiyana ferdî çênebû. Ji niha û pê ve jî wê firsendek wisa çêbibe nebe, ez nizanim. Lê ez dibînim, ji gel û dostên me bi mîlyonan mirov mîna ku ti karekî bê kirin nemaye aware û beredayî digerin. Ez ji vî şêwazê jiyanê pir bi hêrs dibim. Ez ê ji vî şêwazî re nebêjim, şêwazê jiyanê yê herî rezîl û bêberpirsiyarî, ez ê bibêjim ev înkara jiyanê ye. Ji vî şêwazê dijjiyanê divê her ferd û kom ji sedî sed bibihure. Min timî diyar kiribû ku di jiyana gerîlla de jî awaretiyên bi vî rengî gelekî pêk tên û ez ji vê jî gelekî bi hêrs dibim. Eger mîllîtanekî çekdarî afirînerekî bê sînor ê jiyana azad be, di asta eşqê de ji bo vê jiyanê bi xwestek be û bi qasî ku li parçeyekî çiyê-deverekê destanan binivîsîne zana, biaqil û bi îdea be, divê derkeve çiyê. Kesên bi qasî turîst û çiyageran ji heyecan û îradeyê bêpar bin, eşkere ye ku wê nikaribin bibin gerîllayên çiya, daristan û çolan. Min timî digot, mirovên wisa aware û bêkar jiyaneke bi vî rengî çawa dikujin. Min digot, her kî dibe bila bibe kesê xwe xistibe rewşa aware û bêkaran wî kesî bênamûsiya herî mezin kiriye, rezîl û bêrûmet bûye. Min ev jî gotibû: Ma morî û mêşa hingiv a bêkar heye? Morî û mêşên hingiv kengî bêkar dibin, dimirin. Ew jî bêkarmayînê bêrûmetî dihesibînin û bi mirinê bersivê didin.

Di şertên avakirina neteweya demokratîk de ji bo her mirovê me, ji gedeyê heft salî heta bi pîr û kalê heftê salî, ji jina wî heta bi mêrê wî, asta perwerdeya wî çi dibe bila bibe, ji bo her kesî karek pêkan e. Ji bo her kesî di asta îbadetê de kar an jî karên hem pê re mijûl bibe, hem pê xwe biparêze, hem pê xwe xwedî bike, hem jî pê xwe zêde bike, bi cih bîne û bi wî kar an karan xwe azad bike. Hema bila bi tenê ji îrade û bîreweriya neteweya demokratîk hindik be jî par û nesîbê xwe girtibe!

Mînak ez bûma, ez ê biçûma gundê xwe, Çiyayê Cûdî, qûntara Çiyayên Cîlo, dewrûbera Gola Wanê, çiyayên Agirî, Mûnzûr û Çewlîkê, keviyên Zê, Firat, Dîcleyê, deştên Ûrfa, Mûş û Îdirê, riya min bi ku biketa bila biketa, mîna ku ez ji keştiya Nûh a ji nava tofana xeternak derketî ez ê daketima, mîna Brahîm ji Nemrûd, Mûsa ji Firewn, Îsa ji Împaratorê Romayê, Muhammed ji cehaletê reviya ez ê ber bi xwesteka Zerdeşt a cotkariyê û dostaniya heywanan ve (vejeteryenê pêşî) biçûma, min ê bi îlhama ji wan û rastiyên civaka wan bigirta biçûma ser KARÊN XWE. Hejmara karên min dûrî aqilan wê zêde bûna. Min ê yekser bi komunkariya gund dest pê bikira Mirov komunek an komunên gundan ên nêzî îdealê pêk bianiya wê çiqasî karekî bi coş, azadker û tenduristî bûya! Mirov komun û konseya kolanê an bajarekî pêk bianiya û bixebitanda wê çiqasî afirîner û azadker bûya! Mirov li bajêr akademiyek, kooperatîfek, komuna fabrikeyekê pêk bianiya ma wê rê li ber çi venekirana! Mirov kongre û meclîsên giştî yên demokrasiyê pêk bianiya, li wan biaxiviya, kar bimeşanda wê çiqasî rûmetbilindî û serbilindî bûya! Çawa tê dîtin, sînorê hêvî û hesretan tine ye û li pêşiya pêkhatina wan ji bilî ferd bi xwe ti astengiyeke ciddî tine ye. Ji bo pêkhatina wan a divê hebe, hema bi tenê hinekî namûsa civakî û hinekî jî eşq û aqil e!

**Şertê pêşî yê neteweya demokratîk ew e, divê ferd azad be û vê azadiya xwe bi kom û komuna pê ve girêdayî ye, li ser bingehê polîtîkaya demokratîk pêk bîne...**
**Em divê weke prensîbeke exlaqî nas bikin û qebûl bikin ku kesê jiyana wî ya komunal nebe, ferdiyeta wî jî ne mumkîn e. Em divê ji bîr nekin ku endambûna kom an jî komunekê di heman demê de timî aliyekî xwe yê demokratîk heye**



**1 Abdullah Ocalan, MANÎFESTOYA ŞARISTANIYA DEMOKRATÎK-Pirtûka Pêncemîn: PARASTINA KURDÊN DI NAVA PENCÊ QIRKIRINA ÇANDÎ DE, Weşanxana Şilêr, r.557-561, 608-611.**

# Sosyolojîya Azadîyê
# LI SER HEQÎQETA HEQÎQETÊ



FİRAT GERNAS

Pêşgotin
Cîhana me îro di aloziyên giran re derbas dibe. Her çiqas sedemên vê rastiyê weke siyasî û nakokiyên navdewletî xuya kirin an didin xuyakirin jî lê di bingeh de sedem hişmendî, epîstemolojiya (felsefeya zanînê) heyî û pergala hizrî ya ku hatiye damezirandin e. Têkçûna xwezayê û çavkaniyên xwezayî, zuhabûn, birçîbûn, kedxwarî û ferqa mezin a di navbera aboriyan de, bêkarî, nexweşiyên girseyî, şerên wêranker; teknolojî, hilberîn û ticareta asta herî bilind a sîlehan, pêşxistina sîlehên navokî (nûkleer) û bîyolojîk û hwd… Ev tabloya tarî û tirsnak a sedsala 21'emîn e..! Lê ji hêla din ve vegotinên weke serdema zanist û teknolojî, şaristaniya pêşketî, mafên mirovan, demokrasî, azadî û hwd rojane li ser rûpel û şaşeyan kêm nabin.

Ji van her du aliyên nakok kîjan rast e? Heqîqet kîjan e yan çi ye? Eger ev vegotinên erênî rast bin wê demê çi wateya vê tabloya tarî heye?

Mixabin ev nakokiya giran, li gor vê giraniya xwe nabe rojeva cîhan û jiyanê. Heta, gelek kes pê nahisin û nabînin jî. Yên ku dibînin jî dengên wan pir lawaz e. Ji ber ku zihniyeta Modernîteya Sermayedar (Kapîtalîst) a heyî û pergala navdewletî vê rewşê weke 'normal' nîşan dide û mixabin bi milyaran însanan jî îqna dike.

Mînak; li gor vê pergala Modernîteya Sermayedar; eger dahata 25 însanên herî dewlemend ên cîhanê ku serweta wan bi trîlyon dolaran tê hesabkirin, bi qasî dahata nêzîkî 3 mîlyar însan be, ev rewşeke normal e..?!

Li parzemîneki cîhanê eger însan bi nexweşiya qelewiyê (obezîte) bikevin lê li parzemîneke din zarok ji birçîbûnê bimrin, normal e..?!

Di şer, êrişkarî û dagirkeriyên di çend salan de, bi sed hezaran zarok, jin, bi giştî însan bêne kuştin normal e..?!

Nîvê cîhanê ava paqij nebînin û nikaribin vexwin, rojane di navbêra birçîbûn û têrbûnê de bijîn, normal e..?!

Hindek welat qaşo xwediyê demokrasiya pêşketî bin, mafên mirovan di asteke bilind de be û dahata salane ya her mirovî li jorî 50 hezar dolar be lê li hêla din civak di bin lingê cuntayên eskerî de rojane bê kuştin, çirûskeke mafên mirovan jî xuya neke û dahata salane ya her mirovî ji 500 dolarî kêmtir be, normal e..?!

Li hindek welatan mirin an kuştina însanekê/î her roj li ser manşêtan be lê rojane kuştina bi sedan însanî tenê hejmar û îstatîstîkên dûrî çavan bin, normal e..?!

Eger rojane sarox û fûze biçin li nava fezayê bigerin û agahiyan bînin, bi heta Mars'a ku bi sed mîlyonan km ji me dûr e herin lê ji hêla din ve hindek sarox jî di nava çend çirkeyan de gund û bajaran xera bikin, normal e..?!

Di serdema me de normal çi ye û anormal çi ye? Nirx çi ne û pîvanên nirxan çi ne? Kî van diyar dike? Li gor çi dipîve an ku diyar dike? Heqîqet çi ye û li kûderê ye?

Mixabin ev pirs û bi hezaran pirsên serdema me yan nayên pirsîn yan jî di nava mij û morana fikrî ya modernîteyê de berhewa dibin.

**Pergala Modernîteya Kapîtalîst: Polîtîk, Aborî û Îdarî**

Ji 500 salî û vir de sîstema sermayedarî an ku kapîtalîst her ku çû hegemonya xwe pêşxist. Ev hegemonya piştî 'Şoreşa Pîşesaziyê' (Şoreşa Sanayî) kete warekî nû de. Êdî kapîtalîzmê serdestiya xwe hîn zêdetir qayimtir kir. Hêzên serdest ji hêlekê ve civak tepisandin. Ji hêla din ve jî şerê navxweyî yê desthilatdariyê meşandin. Ingiltere û Elmanya weke du qutub serkêşiya van şerên cîhanî kirin. Di her du şerên cîhanî de nêzîkî sed mîlyon însan hate kuştin, birîndar bû û winda bû. Lê wêraniya derûnî, exlaqî û mirovî hîn zêdetir trajîk bû. Lewma sedsala 20'emîn ji bo mirovatiyê bû sedsaleke sar û windayî. Jixwe têgiha 'şerê sar' her di rojeva mirovatiyê de ma. Piştî Şerê Parvekirinê yê Duyemîn (Şerê Cîhanê yê Duyemîn) civak û mirovatî li birînên xwe yên kûr vegeriya. Lê Modernîteya Sermayedar sîstema cîhanî li gor xwe damezrand. Neteweyên Yekbûyî (NY) hate avakirin. Dewletên herî bi hêz ên weke Emerîka, Çîn, Ingiltere, Fransa û Rusya weke Konseya Ewlekariyê hatin diyarkirin. Yanî ev dewlet weke rêveberê sîstema cîhanî ne. Ji hêla din NY sazîbûna navxweyî li gor sîstema kapîtalîst ava kir.

Saziyên weke ILO (saziya kar û xebat), IFAD (çandinî û cotkarî), WHO (tenduristî), FAO (xwarin û çandinî), WTO (ticaret), OECD (aborî) UNESCO (perwerde, zanist, çand), UNICEF (alîkariya zarokan), IMF (pere), WB (Benqa) ava kirine. Bi rêka van saziyan rehendê jiyanê kontrol dike. Helbet li gor berjewendiyên Modernîteya Kapîtalîst xwe bi rêxistin dike. Mînak dewletên Ewrupî û Emerîka bi sedan salan parzemîna Efrîqa weke mêtingeh bi kar anîn. Hemû dewlemendiyên civakê dizîn. Bi keremata mirovên vî parzemînî lîstin. Niha jî ev pêkanînên wan berdewam in. Lê saziyên NY, piştî ku kapîtalîzmê xwîna mirovan mêt, diçe Efrîqa û parsê (qaşo xwarin û vexwarin) belav dike. Vê yekê jî weke xêrxwaziyê dide nîşandan. Lê di bingeh de veşartina mêtingeriya hêzên kapîtalîst e.

Ji hêla din ve NY xwe li gorî sîstema 'netewe-dewlet' bi pergal kiriye. Civak an gelekî ku ne xwedî 'dewlet' be nikare cihê xwe di nava sîstema cîhanî de bigre. Mînak gelê Kurd li Kurdistanê û hemû cîhanê li gor lêkolînan di navbera 40-50 mîlyonî de ye. Lê cihê xwe di nava NY de nagire. Pergala NY di heman demê de li gor pîvanên 'hêz û quwetê' hatiye damezrandin. Dewletên di aliyê leşkerî, sîleh, aborî, sermayedarî û hwd de xwedî hêz in, rêveberiya NY ne.

Em dikarin ji vê pergala Modernîteya Sermayedar re 'Sîstema Netewe Dewlet' jî bêjin. Paradîgma netew dewlet, xwe dispêre 'yek' şêwazî. Dirûşm jî 'yek dewlet, yek netewe, yek al, yek ziman..'e. Ji bo ku bazar 'yek' be, pêwîst e her tişt yek be. Yek bazar jî di bin kontrola sermayedaran de ye. Piştî ku cîhan li gor vê yekê hate sazkirin êdî kontrol bi berdewamî dibe.

Ev kontrol weke erk li ser navendan hatiye belavkirin. Mînak navenda NY li New York'ê (Emerîka) ye. Ev sîstema îdarî ye. Navenda leşkerî û îstîxbaratî (Nato-Gladîo) li Bruksel'ê ye (Belçîka).

Navenda fînans û pere li Swîsre ye. Navenda aqil jî London e (Ingiltere). Her weha gelek navendên curbecur ku bi erkên din tevdigerin hene.

Sîstema Modernîteya Kapîtalîst bi taybetî piştî ku qutba Pakta Warşowa (bi serkêşiya Yekîtiya Sovyetê) hilweşiya, serkeftina xwe îlan kir. Bi pêşxistina teknolojiya agahî û amûran (înformatîk-dijîtal) jî têgiha 'gerdûnîbûn'ê pêşxist. Li gor vê teoriyê mirovatî di civakîbûyîn, çand, hilberîn û hwd de nêzî hev dibin.

Immanuel Wallerstein di pirtûka xwe ya bi navê 'Analîza Pergala Cîhanî' de vê pergalê şîrove dike. Li gor Wallerstein hêzên ji hêla aborî, siyasî û leşkerî ve qewîn weke 'navend'in. Yên di jî li gor hêza xwe 'nîv derdor' û 'derdor' in. Her ku diçe hêzên serdest wê çanda xwe jî serdest bikin û çandên bindest di nava demê de vemirin.

Pêşketina Çîn û Hindistan, di rewşa niha de teoriya Wallerstein dixe xeteriyê de. Lê kîjan hêz li pêş be, sîstema Moderniteya Kapîtalîst hikmê xwe dimeşîne. Li Çîn vê yekê bi navê 'Partiya Komûnîst', li Ingiltere jî bi navê 'Partiya Karker' dike..! Xala balkêş jî ev e. Kapîtalîzm xwe dixe hemû form û kirasan û hemû nirxan ji xwe re dike kar û pere..!

**Pergala Fikrî ya Modernîte: Pozîtîvîzm**

Ev hêlên pergala cîhanî ya sîyasî, îdarî û aborî bû. Bêguman aliyê civaknasî, derûnasî, etîk, estetîk û felsefî hîn zêdetir diyarker in. Ji ber ku modernîte destpêkê xwe di hişmendiyê de ava dike û piştre xwe bi sazî û pergal dike. Lewre jî têgihan berovajî dike. Naverokê wan vala dike û li gor xwe pênase dike. Demokrasî, azadî, wekhevî, edalet, aştî, mafên mirovan û hwd di rastiya modernîteyê de li hember wateya rastîn û li hember civakê têne şixulandin. Her wiha têgihên mîna hiqûq, tawan, ceza, teror û hwd jî li hember civakê li derveyî naveroka xwe têne bikaranîn.

Mînak bi Ingilîzî 'liberty' û bi Fransî 'libertê' di wateya 'azadî' de ye. Liberalism ji vê peyvê hatiye çêkirin ku her çiqasî wateya azadîgerî be lê di cewher de tam li dijî azadiyê ye. Liberalîzm, di wateya azadiyê de tê bikaranîn lê di esas de parçekirina civakê, bi tenêhiştina kesayet û di dawiyê de teslîmgirtina wan e. Azadiya rastîn; rizgariya ji hemû qalib, dogma û hizrên spekûlatîf e. Hişmendiya herikbar û îradeya xwebûnê ye. Bi kesayeteke afirêner, çê û çeleng, tevlîbûna civakîbûnê ye. Civak û civakîbûyîna herî bi etîk, estetîk û bedew e.

Berovajî vê ramana azadîgeriyê, Modernîteya Kapîtalîst xwe dispêre Pozîtîvîzmê. Pozîtîvîzm berî her tiştî êrîşî fikr û felsefeyê dike. Li gor wê, zanist pêdiviya xwe bi felsefê nîne. Dema ku rê li ber felsefeyê hate girtin wê demê dikare bi hesanî bi têgih û naverokan bilîze. Cewher vala bike û şikil têxe şûna cewher. Jixwe ji vê yekê re 'fenomenolojî' tê gotin. Yanî tiştê xuyayî heqîqet e, an jî heqîqet di tiştê xuyayî de ye. Dema wisa hate fêmkirin, ji xwe êdî her tiştê xuyayî dikeve ber pîşesaziya (endustriyalîzm) kapîtalîzmê de. Navê vê jî dibe 'moda'..! Civak û bi taybet nifşên nû dibin dîlên modayê. Têgihiştinek hêdî hêdî û bi ziravî di mêjiyan de tê kolandin: Eger tu li gor modayê neçî, tu yê paş de bimînî..! Ma kî dixwaze paş de bimînî!?

Piştî moda hate qebulkirin vê carê jî reklam dikeve dewrê de. Ji bo ev şikl û moda bêne ecibandin û kirîn, pêwîst e bêne nasîn. Lê mijar ji nasandine dibore, dibe endustrî û reklam di her kêlî, her santîm û her gava jiyanê de tê bicihkirin. Heta dema tu nûçe an nivîseke online dixwînî, di çar hêlan re reklam êrîşî ser ekran û mêjiyê te dikin. Bi rêya reklamê teroreke fikrî tê meşandin.

Her wiha medya û rojnamevanî jî di pergala kapîtalîzmê de li hember civakê weke sîlehên fikrî û derûnî têne bikaranîn. Hema bêje 24 demjimêran (seat) şerê taybet dimeşînin. Bi taybetî bi pêşketina 'medya civakî' re (li vir jî têgih hatiye berovajîkirin, di rastiyê de rola xwe, ne civakî ye) ev êrîşkarî gihiştiye asteke kujer.

Tevî ku teknolojiya pêşketî gelek derfetên erênî jî bi xwe re tîne, lê ji ber ku çavkaniyên wê di destê navendên taybet ên sermayedaran de ne, li ser civakê heta dawî bandorên neyînî pêk tîne.

Êdî her tişt dibe 'temaşa'..! Kî herî zêde 'tiştên balkêş' nîşan bide, reytînga xwe zêde bike, şopînerên zêde bi dest bixe, rê ji reklaman re veke, wê pere qezenc bike û dewlemend bibe. Dema ku rêkar û zagon bi vî awayî hate danîn êdî pîvan û nirxên civakî, exlaqî û mirovî zêde nabin pirsgirêk..! Însan ji bo çend şopînerên zêde dikarin bi rihetî dev ji rûmeta xwe berdin. Êdî her der dibe temaşa. Telefon di dest de; video li pey video, dîmen li pey dîmen… Temaşa xilas nabe, seat diçin, dem diçe, roj diçin lê temaşa naçe, naqede..! Amûr û meta dibin îdol (şiklê pîroz). İnsanê bê îdol tê şermezarkirin. Pêwîst e tu xwedî îdol bî..! Ev îdol dibe ku sembolek be, modayek be, seatek be, dirûşmeyek be, tîmeke futbolê be, lîstikvanek be, stranbêjek be û her wiha…

Xwendin, fikirîn, nîqaşên bi wate, parvekirin, civat û civakîbûyîn hêdî hêdî vedimrin, têk diçin. Li şûna wan sîmûlasyon (dîmenên ji derveyî rastiyê û derew), temaşa, şikilperestî, moda, reklam û cîhaneke derewîn tê sazkirin. Ev jî êrîşa herî xeter a li ser rastiya mirov û civakê ye. Ji ber ku mirov bi civakîbûn, cewher, nirx û pîroziyên xwe mirov e. Kapîtalîzm jî bi rêka amûrên xwe van nirxan ji xwe re dike armanc. Ji ber ku ev hebin kapîtalîzm dikare sermayê zêde bike.

Êrîşa li ser rûmet û hebûna mirov, di van salên dawiyê de kete ast û qonaxeke nû de ku jê re dibêjin 'Zekaya çêkirî an ku hişê çêkirî' (aqlê çêkirî)… Pergala Modernîteya Kapîtalîst ji bo ku zêdetir û zûtir mal û meta çêke, hişê çêkirî da pêşxistin pêşxistin (jixwe sermayedar bi xwe kar nakin; karmend, karker û pisporan, bi rêya sîleh, pere û hêzê têxin kontrola xwe û bi wan didin kirin).

Eger hişê çêkirî bi vê lezê pêşkeve wê gelek xeteriyan bi xwe re bîne, mînak:

1. Ji ber ku mirov wê xwe bispêrin berhema hazir ku ji hêla hişê çêkirî ve tê amadekirin, di nava demê de afirênerî, hiş, bîr û cewherê mirovatî û civakî wê ber bi xeteriya tunebûnê ve here.

2. Mirovê ku her tişt amade dît, wê ji kedê dûr keve. Dûrbûna ji kedê, dûrbûna ji exlaq û civakîbûnê ye, ew jî mirina însan e.

3. Hişê çêkirî di heman demê de têkbirina mêjî û giyanê azad; afirêneriya çand, hûner, estetîk û wêjeyî ye jî. Mînak, mirovên ku berê bi keda hişê xwe diafirandin, bi afirêneriya xwe wêne xêz dikirin, hizr û raman pêş dixistin; niha di demeke kurt de bi hişê çêkirî û ji heqîqetê dûr, didin kirin.

4. Eger hişê çêkirî ji kontrolê derkeve (jixwe taybetmendiya xwe mekanîk e), dibe ku zirarên pir mezin bide.

5. Bi awayekî cewherî dibe ku hişê çêkirî ji bo mirovatiyê bibe pirsgirêkeke hebûn û nebûnê (man û nemanê / ontolojîk)

Weke encama vê serenavê; aliyê fikrî yê modernîteyê pozîtîvîzm, di bingeh de têkbirina heqîqeta mirov û civakê ye. Nehiştina fikr û felsefe, afirênerî, etîk û estetîk, evîna jiyanê, raz û xeyalên azadiyê ye.

Her çiqas Marksîzm li ser nirxê zêde teorî û zanîn pêş xistibe jî lê ji serdema civaka xwezayî heta niha çavberdana nirxê zêde weke xerabkariya herî mezin tê zanîn. Di hiş û bîra civakê de hatiye kolan. Ji berê de tê gotin ku bingehê hemû xerabiyan temayî an ku çavbirçîtî ye. Di bingeh de dendik an ku tovê sermayedarî û desthilatdariyê bi temayiyê hate danîn. Temayî dibe qurnazî, qurnazî dibe hêz, hêz jî dibe desthilatdarî. Di vê wateyê de pozîtîvîzm, qurnaziya desthilatdariyê ye.

**Moderníte û Jin**

Di mijara heqîqet û moderníteyê de yek ji mijarên diyarker û jiyanî jî rol û cihê jinê ye. Jin bi qasî ku ji 500 salî û vir de yanî bi moderníteyê re hate xistin û şikandin, di ti demên dîrokî de bi vê astê nehate xistin û şikandin. Bêguman di bin hemû cureyên desthilatdariyê de, jiyaneke tarî li ser jinê hatiye ferzkirin. Lê di moderníteyê de bi navê 'azadî û pêşketinê' û bi çêkirina riza, ev yek hate kirin. Di demên berê de jin her tim di nava berxwedanê de bû. Lê di kapîtalîzmê de jin û civaka ku hatiye 'îqna' kirin bi 'riza'ya xwe tevlî hemû pêvajoyên moderníteyê dibe. Lewma bi pêşxistina felsefeya azadiya jinê û Jineolojî, armanc ew e ku jin jî û civak jî ji vê jehrîbûna moderníteya kapîtalîst rizgar be û li xwe vegere ku jê re tê gotin, XWEBÛN…

Bêguman xwebûna jinê xwebûna civakê ye. Jin çiqasî vegere dîrok, cewher û rêgezên hebûna xwe; rêya heqîqetê ji bo civakê jî vedike.



## Moderníteya Li Ser Erda me

Moderníteya Kapîtalîst li Ewrûpa haveyn girt û pêş ket. Eger gotin di cih de be, li Ewrûpa li ser 'orîjînalîte'ya xwe tê jiyîn. Lê heman moderníte li Rojhilata Navîn (ev nav jî berhemeke moderníte ye) ji destê duyem/sêyem/çarem û bi awayekî sosret tê jiyîn. Jixwe moderníte bi xwe jiyaneke sosret çêdike. Dema ku ev sosretî gihişt Rojhilata Navîn dibe, rewş dibe sosretiya sosretan..! An jî sîmûlasyona sîmûlasyonan..!

Mirov û civakên ku ji heqîqeta dûr ketibin an jî hatibin dûrxistin, bi aloziyên giran ên fikrî û jiyanî re rûbirû dimînin. Eger pê bihesin, şansê jiyanê berdewam dikin. Lê eger vê yekê bi riza û dilxwazî bikin, ev yek jî karesata karesatan e.

Rêber APO vê mijarê di Parêznameya bi navê 'Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk' de wiha şîrove dike: 'Civak ne tenê hûnandina heqîqetê ne. Di heman demê de hêzên şîroveyê ne. Şîrovenekirina heqîqeta xwe tê wateya koletiya herî giran, bişaftin û qirkirin ku ev jî qutbûna ji hebûnê û jidervemayîna rasteqînê ye. Civak û kesayeta bê heqîqet; ketiye rewşeke bêwatebûnê, di nava heqîqeta yên din de heliyaye, nasnameya xwe ji dest daye û ya rast bûye hebûneke bêwate.'

Hebûn bi diyalektîka xwezayî watedar e. Di vê diyalektîkê de serdest û bindest (kirde-berkar) tine ye. Heyber an jî hebûn li gorî taybetmendî, erk û fonksîyon û rola xwe ya jiyanî dibe kirde jî û dibe berkar jî. Serdestî û bindestiya mutleq tine ye. Lê Moderníteya Sermayedar têgihiştineke bi vî awayî ava dike. Li gor vê têgihiştinê hinek serdest in û hinek jî bindest in. Vê yekê jî bi navê zanistê şîrove dike. Îro miroveke/î wasat ê Ewrûpî jî û yê Rojhilata Navînî jî, bi vê têgihiştinê tevdigere.

Lê karesata herî mezin ew e ku gelek kesayetên bi navê rewşenbîriyê tevdigerin jî xwediyê vê têgihiştinê ne. Li Ewrûpa Oryantalîst in, li Rojhilata Navîn jî teqlîda Oryantalîstan in.

Rêbertî vê kesayetê di Parêznameya 'Şaristanî' de wisa şîrove dike: 'Tenê kirasê kevneçandê û toreyê li xwe dikin û riha wê berdidin. Giyan û bedenên wan bi bermayiyên herî paşketî yên moderníteyê re dagirtî ye.'

Li Rojhilata Navîn ji bilî kesayetên heqîqetger; bi piranî rewşenbîr û akademîsyen di hêla epîstemolojîk, civaknasî, ramyarî, felsefe û helwest de aloz, dogmatîk û teqlîdî ne. Bi nav û naverokên heqîqetê din, vegotina heqîqeta xwe; bişaftin, veşartin û kuştina heqîqeta xwe ye. Di vê wateyê de oryantalîzm û teqlîda oryantalîzmê; nehiştin û kuştina heqîqetê bi xwe ye. Çawa ku Ewrûpa di aliyê pîşesaziyê de hemû bermayiyên xwe yên weke zibaleya qeba û zibaleya navokî dişîne Rojhilata Navîn; di aliyê zanistî de jî rewşeke heman bi vî awayî heye. Yanî kopye û dogmayên zanistî yên Ewrûpa weke çavkanî û pirtûk di akademî, zanîngeh û dibistanên Rojhilata Navîn de tên xwendin. Li şûna ku heqîqetê vebêjin; berovajî dikin, şêlû dikin û vedişêrin.

Heman rewş di qada medya giştî, medya civakî û qadên din ên zanînê de jî heye. Bi taybet medya civakî çawa li Ewrûpa karesat e, li Rojhilata Navîn karesata karesatê ye.

### Encam

Têkoşîna di navbera civak û desthilatdariyê de têkoşîna heqîqetê ye. Wate, desthilatdarî her tim dixwaze heqîqetê veşêre ji ber ku enceq bi vî awayî dikare, hegemonya xwe berdewam bike. Civak jî bê heqîqet nikare bijî; ji ber ku cewherê heqîqetê hebûn, jiyan û civak bi xwe ye.

Desthilatdarî ji bo ku rastî û heqîqetê veşêre destpêkê rê û rêbazên wê dixe bin kontrola xwe. Di demên kevnare de mîtolojî û dîn, paşê felsefe û niha jî zanist, bi destê desthilatdaran herî zêde bûne amûrên ji dûrxistina heqîqetê. Lê di bingeh de ev rêbazên civakî ne û yên xwegihandina heqîqetê ne.

Lewre ji bo civakê, çareserkirina pirsgirêka rêbaz û xwegihandina heqîqeta jiyanê, mijareke jiyanî û hebûniye ye.

Eger li erdekî pirsgirêkên felsefî, epîstemolojîk û hişmendî kûr bin û rêyên çareseriyê neyên dîtin; ji biçûk heta mezin hemû mijarên jiyanî wê di nava aloziyê de bin. Li Rojhilata Navîn jî pirsgirêkên hişmendî yên bi hezaran salan ku ketine ser hev, di nava gevizînekê de ne. Lewre berî her tiştî pêwîst e em di vî warî de xwe kûr bikin.

Eger wek hizr û raman em çarçove, dogma û sînorên Moderniteya Kapîtalîst derbas nekin; em ê nikaribin bibin xwe, bigihêjin xwebûnê û azadiyê. Di mêjî û giyan de nehiştina hemû berhem û bermayiyên Moderniteya Sermayedar; pêşîlêvekirina azadiya rastîn û Moderniteya Demokratîk e.


Di vî milî de Paradîgma û Parêznameyên Rêber APO, ji bo mijara naskirina heqîqetê û çareseriya jiyanî, derfet û şansekî bêhempa raberî me dike. Xwendin, têgihiştin, şîrovekirin û pratîkirina wan, ne tenê erkek e, di heman demê de pêwîstiyeke jiyanî ye…



**Lewre ji bo civakê, çareserkirina pirsgirêka rêbaz û xwegihandina heqîqeta jiyanê, mijareke jiyanî û hebûniye ye.**

**Têkoşîna di navbera civak û desthilatdariyê de têkoşîna heqîqetê ye.**




TÊGÎN
Û
TÊGEH

# RÊVEBERÎ

ŞERVAN XEBAT

Yek ji têgînên herî krîtîk û li ser wê gelek nîqaş hatine meşandin jî rêveberî ye. Pênaseyên têgîna rêveberiyê bi esasî di navbera du xetên esasî de tên û diçin. Yek ji van pênaseyên Şaristaniya Demokratîk in, ya din jî pênaseyên Şaristaniya Dewletdar in. Ango, bi esasî pênaseyên "rêveberî" û "desthilatdariyê" ne. Desthilatdarî û rêveberî du têgînên ji hev cuda ne.

Desthilatdarî, rêveberiyeke civakê îfade nake. Ji bo mirov neyêniyên çavkaniya wan têgîna desthilatdariyê ye, û miyopiyên di vî warî de ji holê rake, rast danasîna têgîna rêveberiyê girîng e. Ji ber ku berevajîkirin û tevlîheviya li ser rêveberî û desthilatdariyê bi giştî analîzên li ser avahî û zêhnan, nêzîkatiyên dîrokî neyênî bandor dike. Pirsgirêka civakî jî ji ber ku desthilatdariya dewletparêz û hiyerarşîk dest avêtiye diyardeya rêveberiyê pêş ketiye. Heta ku ev êrîş û destavêtin pêk neyê, diyardeya rêveberiyê neyê berevajîkirin û çepandin wê zext û mêtingerî jî nikaribin xwe bi sazî bikin.

Rêber Apo têgîna "rêveberiyê" wisa pênase dike: "Rêveberî jî diyardeyeke weke çandê ye di civakê de domdar e. Eger mirov bi awayekî giştîtir bibêje, di asta gerdûnî de û nexasim di gerdûna biyolojîk de bi kulmozbûna rehikan û pêşketina mejî re dişibin hev. Rêveberî birêkûpêkiya di gerdûnê de, rewşa rizgarbûna ji kaosê îfade dike. Di civakê de rewşa pêşketî ya xwezaya xwedî mejiyê nerm ê manedanê, bi xwe re pêşketina erka rêveberiyê tîne. Mirov dikare ji mejiyê civakî re rêveberî bibêje. Di vê rewşê de girîng e ku mirov têgînên xwerêvebirin û rêveberiyên biyanî ji hev derxe .Xwerêvebirin erka di xwezaya xwe ya civakî de bi rêkûpêk û kontrol dike, bi vî awayî domdariya xwe pêk tîne, xwedîkirin û bergiriyê misoger dike. Rêveberiya biyanî xwe weke desthilatdarî 'xwezayî' dike û civaka pêwendîdar ji rê derdixe ango serê wê jê dike, bi vî awayî ji xwe re wê civakê dike mêtingeh û dike ku karibe wê bi rê ve bibe. Ji lewra mirov dikare bibêje, ji bo civakekê xwerêvebirin bi qasî manûnemanê girîng e. Civakeke ji xwerêvebirinê mehrûm bibe wê bibe mêtingeh û weke encama vê yekê ya xwezayî wê bi asîmîlasyon û qirkirînê di nava pêvajoyê de bivênevê tine bibe.



Rêveberiyên ji civakê re xerîb in, û wê nas nakin, nûnertiya şêweyê desthilatdariyê yê herî zordar û mêtinkar dikin. Ji lewra ji bo civakekê wezîfeya herî heyatî, exlaqî, zanistî û estetîk ew e, xwe bigihîne hêza xwerêvebirinê. Civakek ku di vê wezîfeyê de bi ser nekeve nikare ji aliyê exlaqî, zanistî û estetîk ve pêş bikeve û dê pêşketina sazîbûna wê ji aliyê ekonomîk û siyasî ve biqede. Ya girîng ew e, erka rêveberiyê rê nede ku ber bi desthilatdariyê ve biçe, li aliyê din jî heta dawiyê li dijî bêrêveberiyê li ber xwe bide. Divê mirov rêveberiyê neke desthilatdarî û ji vê jî girîngtir, divê mirov îmtiyazên rêveberiyê yên di destê desthilatdariyê de ji destê wê bigire. Desthilatdarî çiqasî antî-civakî be, rêveberî jî ewqasî erkeke civakî ye. Bêyî erka civakî pêşketina exlaqî, estetîk û zanistî çênabe. Bi vî rengî heger di çarçoveyeke teng de pêşketina çandî çênebe, di çarçoveyeke berfireh de pêşketina ekonomîk û siyasî jî çênabe. Di rewşeke welê de ya pêk bê, civak wê bi mêtinkarî, asîmîlasyon û qirkirinê biqede.

Di civakê de rêveberiya desthilatdariyê çiqasî antî-demokratîk be, xwerêvebirin jî ewqasî têkildarî rêveberiya demokratîk e. Rêveberiyên xwerû yên desthilatdariyê çiqasî dijberiya demokrasî û dûrkirina civakê ji rêveberiyê îfade dikin, xwerêveberî jî çiqasî civakê tevlî rêveberiyê bikin ewqasî demokratîkbûnê îfade dikin. Di vê rewşê de mirov dikare demokrasiyê weke tevlîbûna civakê ya xwerêvebirinê bide naskirin. Xwerêveberî timî têkiliya xwe bi civakê re heye û mirov nikare wan bêtevlîbûnê bifikire, ji ber ku di xwezaya wan de demokrasî heye. Demokrasî têgînek e ku para bêhtir mirov ji bo civakên makro yên weke gel û netewe lê difikirin, lê xwerêvebirin erkekê îfade dike ku ji civaka herî piçûk klanê heta bi civaka herî berfireh neteweyê belavbûnê û domdariyê îfade dike."1

Yek ji têgînên sereke ya civakê ye. Rêber Apo, di warê çandî de civaka Kurd wekî 'civaka ku ji aliyê çandî ve hatiye qirkirin' pênase dike. Ji 5 paraznameyên Manîfestoya Civaka Demokratîk paraznameya 5'emîn wekî " Parastina Kurdên Di Nava Pencê Qirkirina Çandî De" bi nav dike.
Çand ji ber ku hemû tiştên girêdayî însan û civaka însan digire nava xwe bi gelek pênaseyên cuda jî tê îfadekirin: "Her tiştên bi destê însan tên afirandin îfade dike." "Nasname ye." "Terzê hebûna gelekî yan jî neteweyekê ye."
Têgîna "Çandê"; di zimanên Latînî de wekî "kultur", di zimanê Kurdî de wekî "çand" û di zimanê Tirkî de jî wekî "ekin" tê bikaranîn. Ev bi giştî tên maneya "bikaranîn, xemilandin û mêzekirina li xakê". Yanî peywendiya mirov û xakê îfade dikin.

Dîn, felsefe, mîtolojî, zanist û qadên cûrbicûr ên hunerî di çarçoveyeke teng de çanda civakekê pêk tînin. Bi awayekî, rewşa ruhî û zêhnî ya civakekê nîşan didin.Di çarçoveyeke teng de çand, zêhniyeta kevneşopî ya civakekê, qalibên wê yên hizirandinê, ziman û heqîqeta wê ya dilinî îfade dike; di çarçoveyeke fireh de li vê zêdekirina daneheva wê ya maddî îfade dike.

Rêber Apo têgîna çandê bi vî rengî pênase dike: "Wexta em behsa civakê dikin, em di çarçoveyeke teng de çandê weke cîhana maneyê ya civakê, qanûna wê ya exlaq, zêhniyet, huner û zanista wê pênase dikin. Dema ku saziyên polîtîk, ekonomîk û civakî jî bi vê çarçoveya teng re tên yekkirin, di çarçoveyeke berfireh de danasîna giştî ya çandê tê kirin. Ango li ser vî bingehî weke naverok û sazî maneya xwe hebe, mirov dikare weke hebûn behsa civakê bi xwe bike.

Eger bi tenê behsa civaka sazî yan jî manedayî were kirin, ev ê bibe nêzîkatiyeke xapînok. Civakeke taybet têra xwe gihiştibe asta sazîbûn û manedanê, dikare weke hebûn bibe xwedî nasname û bê binavkirin.

Bi tenê behsa civaka manedan an jî sazîbûnê were kirin û di nava civakên bi vî rengî de fikirîna li jiyaneke mirovane, çawa di tevahiya civakên dîrokê de hatiye gotin, wê weke şaşî, jirêderketin, bêexlaqî û kirêtî were qebûlkirin û mehkûmkirin.

Piştî ku civakek ji aliyê sazîbûnê ve were belavkirin, mirov êdî nikare behsa maneya wê û çanda wê ya teng bike. Di rewşeke wisa de sazî weke taseke avê ya tijî ye. Piştî ku tas şikiya, eşkere ye ku mirov nikare behsa avê bike. Eger mirov behs bike jî ew av êdî ne ji bo xwediyê tasê, ji bo erdên din an jî xwediyên qabên din herikî ye, û ji bo wan bûye hêmaneke jiyanê. Encama jidestdana zêhniyet, estetîk û maneya civakî bêhtir xeternak e. Di rewşeke wisa de mirov dikare behsa rewşa zindiyên serê wan hatine firandin û bi tenê di cihê xwe de diperpitin bike. Civakeke cîhana xwe ya estetîk û zêhniyetê jidestdayî dişibe berateyekê ku ji rizînê re, bi awayekî hovane ji parçebûn û xwarinê re hatiye terikandin. Ango ji bo ku mirov civakekê weke çand bide naskirin, şert e ku mirov ji sedî sed wê di nava yekparebûna manedan û sazîbûnê de binirxîne. Di vê mijarê de mînaka herî berbiçav rastiya civaka Kurd e ku gelekî dramatîk pêk tê. Ji ber ku hem ji aliyê sazîbûnê, hem jî ji aliyê jidestdana zêhniyet û manedanê ve gelekî hûrhûrî parçe bûye, mirov dikare civaka Kurd weke 'civaka ji aliyê çandî ve hatiye qirkirin' bide naskirin."2

1-Abdullah Ocalan, Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk-Pirtûka Pêncemîn: Parastina Kurdên Di Nava Pencê Qirkirina Çandî De, Weşanxaneya Şilêr, r.30-32.

2-Abdullah Ocalan, MANÎFESTOYA ŞARISTANIYA DEMOKRATÎK-Pirtûka Pêncemîn: PARASTINA KURDÊN DI NAVA PENCÊ QIRKIRINA ÇANDÎ DE, Weşanxana Şilêr, r.25.




**Di civakê de rêveberiya desthilatdariyê çiqasî antî-demokratîk be, xwerêvebirin jî ewqasî têkildarî rêveberiya demokratîk e. Rêveberiyên xwerû yên desthilatdariyê çiqasî dijberiya demokrasî û dûrkirina civakê ji rêveberiyê îfade dikin, xwerêveberî jî çiqasî civakê tevlî rêveberiyê bikin ewqasî demokratîkbûnê îfade dikin**

# Pîvanên Jiyana Civakî

EVÎNDAR MUSTEFA





Jiyana civakî tevahiyeke dînamîk e ku tê de ferd û kom bi hev re dijîn û bi hev re tevdigerin. Ji bo temînkirina nîzama civakî û avakirina jiyaneke domdar, aliyên civakî yên cuda tên birêxistinkirin. Ev pîvan pêkhateyên civakê yên demokratîk, civakî, çandî û aborî diafirînin, temsîliyeta wekhev a kesan pêk tînin. Sîstema Konfederalîzma Demokratîk li ser van pîvanên ku jiyana civakî birêxistin dikin, xwe dispêre xebitandina bi bandor. Ev pergal modela rêveberiya nenavendî ya li ser esasê beşdariya rasterast a kesan pêşkêş dike û civakê bi rêya meclîsan birêxistin dike.

**Konfederalîzma Demokratîk: Nêzîktêdayînek Sîstemê**

Konfederalîzma Demokratîk modeleke siyasî ye ku otorîteya dewletê sînordar dike û destûrê dide pêkhateyên civakî ku xwe bi rêve bibin. Di vê pergalê de demokrasiya rasterast bi hiştina pêvajoyên biryargirtinê ji meclîsên civakê re pêk tê. Qadên cuda yên jiyana civakî li ser esasê meclîsên diyarkirî, weke parçeyek ji pêkhateya konfederal a demokratîk tên birêxistinkirin. Van meclîsan di pêkanîna sîstema konfederalîzma demokratîk de roleke girîng dilîzin. Her aliyek bi rêya meclîsa xwe biryaran di derbarê wê herêmê de dide û pêk tîne.

Meclîsên ji nûnerên ku ji aliyê hemû pêkhateyên rêxistinî, saziyên akademîk û yekîneyên di qadên têkildar de hatine hilbijartin pêk tên. Ev nûner bi vegotina hewcedarî û pirsgirêkên civakî çareseriyan çêdikin. Her wiha her meclîsek hevserokên xwe hildibijêre û li gorî pêwîstiyan komîsyonan ava dike.
Pergala hevserokatiyê mekanîzmayeke girîng e ku azadiya jinê û wekheviya li ser esasê cihêrengiyê misoger dike. Bi vî awayî wekheviya di navbera zayendan de tê dîtin û temsîliyeta demokratîk tê xurtkirin.

**Rêxistin û Karûbarên Dimenên Civakî**

Her çend aliyên cihêreng ên jiyana civakî ji hev serbixwe xuya bikin jî, bi rastî di nav têkiliyek hembiyotîk de ne. Her aliyek bi pîvanên din re têkildar e û beşdarî parastina nîzama civakî bi tevahî dibe. Li şûna ku bi hev re hevrikiyê bikin, ev pîvan hevûdu temam dikin û bi vî rengî ji bo bextewariya giştî ya civakê dixebitin.

Ev pêwendiya simbiyotîk a pîvanan, bi têgihîştina jiyana komînal a ku yek ji rêgezên bingehîn ên konfederalîzma demokratîk e re li hev dike. Jiyana komunal nêzîkatiyek e ku kes û koman teşwîq dike ku li dora nirxên hevpar werin ba hev û bi hev re bijîn û bixebitin. Di vê çerçoveyê de her meclîsa pîvanê dema ku di karê xwe yê hundirîn de xweser be, bi yekparebûna civakî biryaran dide.

Karekî din ê girîng ê meclîsan ew e ku bi hevkariya meclîsên din beşdarî amadekirina pêşnûmeyên qanûnan bibin. Meclisa komun, bajarok, bajar, kanton û meclisa demokratîk a gel beriya ku qanûn der barê her alî de derbixin, bi komîsyona meclîsa pîvanên têkildar re bi hev re dixebitin. Ev pêvajo misoger dike ku pêşnûme bi lihevkirinekê pêşkêşî meclîsê bên kirin û biryar bi awayekî demokratîk bên girtin.

**Yekitiya Jiyana Civakî ya Yekgirtî**

Konfederalîzma Demokratîk destnîşan dike ku jiyana civakî tevahiyeke ku nayê parçekirin e. Her pîvanek civakî bi pîvanên din re li hev dike, avahiyek ku xizmeta tevahî civakê dike diafirîne. Ev yekitî ne tenê di navbera meclîsên di qadên cuda de tên organîzekirin de, di nava kesan de jî pêk tê. Ev nêzîkatiya tevayî ku di bingeha pergala demokratîk de cih digire, yek ji hêmanên herî girîng e ku civakê li hev digire.
Jin û ciwan di nav beşên jiyana civakî de stûnên vê pergalê ne. Jin di hemû qadên jiyana civakî de xwedî temsîliyeta wekhev in, ciwan weke pêşengên guhertinên civakî cih digirin. Ev her du kom di parastin û pêşxistina karaktera demokratîk a pergalê de xwedî cihekî krîtîk in.
Sîstema Konfederalîzma Demokratîk modeleke rêxistinbûyînê ya ku hemû qadên jiyana civakî digire nava xwe pêşkêş dike. Armanc ew e ku beşên cuda yên civakê temsîl bike û yekitiya civakî bi meclîsên pîvanan biparêze. Ev sîstem bi misogerkirina beşdarbûna her endamekî civakê di pêvajoyên biryardanê de, avahiyeke adiltir û wekhevtir ava dike. Di heman demê de weke modeleke ku civakê bi hev re digire, bi danîna têkiliyeke hembiyotîk di navbera aliyên jiyana civakî de derdikeve pêş.

**Di encamê de**

Di pêşgotinê de me nêrînek li ser ku konfederalîzma demokratîk jiyana civakî çawa birêxistin dike pêşkêş kir. Di beşên jêrîn de em ê li ser vê sîstemê analîzeke kûr bikin, jin, ciwan, ekolojî, aborî û aliyên din ên civakî bi berfirehî rawestin.

**1-Têkoşîna Jinê ya Azadiyê: Nûnertiya tam bi sîstema Hevserokatiyê**

Pergala hevserokatiyê ku yek ji hêmanên girîng ên Konfederalîzma Demokratîk e, di misogerkirina azadiya jinên civakî de rolek girîng dilîze.
Jin bi awayekî aktîf beşdarî hemû qadên jiyana civakî dibin, di qada civakî û siyasî de bi mêran re xwedî temsîliyeta wekhev in. Ev pergal ji bo veguhertina pêkhateyên baviksalarî û misogerkirina azadiya jinê bendeke girîng e. Mafê rêxistinbûna xweser a jinê weke mifteya guherîna civakî tê dîtin û têkoşîn bi hevgirtina bi hemû pêkhateyên civakî yên herêmî û gerdûnî re tê meşandin.

**2-Tevgera Ciwanan: Rola pêşeng di Avakirina sîstema Civakî de**

Ciwan pêşengê guherîna civakî û tevgerên şoreşgerî tê dîtin. Di Konfederalîzma Demokratîk de ciwan bi rêxistinbûn û dînamîzma xwe di ji nû ve avakirina pêkhateya civakî de rola sereke dilîzin. Enerjî û ramanên nûjen ên ciwanan ji bo zindî kirina karaktera demokratîk a pergalê xwedî girîngiyeke jiyanî ye. Her wiha di veguhertina siberojê ya civakê de bi tevlêbûna ciwanan de avahiyek girîng pêk tînin.

**3-Meclîsa Ekolojiyê: Bi Xwezayê re Di Ahengê de Jiyan**

Meclîsa Ekolojiyê aliyê ekolojîk a Konfederalîzma Demokratîk temsîl dike û domdariya jîngehê weke berpirsyariyeke civakî dihesibîne. Ev meclîsa ku li dijî îndustriyalîzm û tinekirina hawirdora kapîtalîst helwest digire, ji bo pêşxistina pratîkên jiyanê yên bi xwezayê re dixebite. Modelên hilberîna ekolojîk û polîtîkayên domdariya herêmî ji bo parastina çavkaniyên xwezayî û zêdekirina hişmendiya ekolojîk a gelê herêmê armanc dikin.

**4-Ronakbîrî û Hunerî ya Çandî: Çanda Civakî Li Dijî Kapîtalîzmê**

Meclisa Çand û Ronahîyê li dijî nêzîkatiyên kapîtalîzmê yên ku huner û çandê vediguherîne eşyayan radiweste. Ev meclîs ji bo parastina nirxên çandî yên herêmî, azadkirina hunerê û misogerkirina ronakbîriya civakî xebatên xwe dimeşîne. Di Konfederalîzma Demokratîk de çand weke amûra berxwedanê tê bikaranîn û weke qadeke ku pêkhateyên civakî û kes bi awayekî azad nasnameya xwe tê de îfade dikin tê parastin.

**5-Meclîsa Tenduristiyê: Xizmetên Tenduristî yên Xwezayî û Gihîştî**

Meclîsa Tenduristiyê destnîşan dike ku, berevajî pergalên tenduristiyê yên kapîtalîst, divê tenduristî weke mafê bingehîn ê mirovan bê dîtin. Ev meclîs giraniyê dide ser pêşxistina xizmetên tenduristiyê yên li ser bingeha rêbazên xwezayî û hevgirtina civakî. Tenduristiya civakê bi qasî tenduristiya ferdî girîng tê dîtin û hewl tê dayîn ku gihandina xizmetên tenduristiyê bêpere û bi awayekî hêsan bê dayîn. Ji ber vê yekê li dijî bazirganiya pergala tenduristiyê helwest tê girtin.

**6-Meclisa Aborî: Aboriya Komîn û Kooperatîfan**

Civata Aborî armanc dike ku sîstemên aborî yên nenavendî û herêmî xurt bike. Li dijî pergalên kapîtalîst ên yekdestdar bi modelên aboriya kooperatîf û komînal têdikoşe. Dema ku çavkaniyên civakê li gorî hewcedariyên gel tên birêxistinkirin, kontrola navendî ya li ser aboriyê ji holê radibe. Ev nêzîkatî avahiyeke aborî ya demokratîk û adil pêş dixe.

**7-Meclîsa Dîplomasiyê: Dîplomasiya ji bo Aştiya Gelan**

Encûmena Dîplomasî ji bo pêşxistina têkiliyên aştiyane di navbera civakên herêmî û gelan de dixebite. Ev meclîs li ser esasên neteweya demokratîk li Kurdistan û Rojhilata Navîn têkiliyên dîplomatîk pêş dixe û li şûna şer û pevçûnan diyalog û hevkariyê diparêze. Di nava civakan de avakirina çanda biratî û hevgirtinê armanc dike.

**8-Pîvana xweparastinê: Parastin li ser bingeha hêza xwe ya civakê**

Xweparastin weke pêşxistina mekanîzmayên xweparastinê yên civakê tê pênasekirin. Di Konfederalîzma Demokratîk de parastin bi hişmendiya kolektîf a civakê pêk tê, ne di bin kontrola şexsan an jî hêzeke navendî de ye.

**Sîstema Konfederalîzma Demokratîk li ser van pîvanên ku jiyana civakî birêxistin dikin, xwe dispêre xebitandina bi bandor.**

Ev pîvana ku civakê li hemberî gefên derve diparêze, parastina nirxên demokratîk jî misoger dike. Parastin ji bo xwerêveberiya civakê weke pêwîstiyek tê dîtin.


**9-Meclisa Karkeran: Hevgirtina Civakî û Dada Aborî**

Meclisa Karkeran dema ku destekê dide rêxistinên demokratîk ên kedkaran, ji bo edaleta civakî polîtîkayan pêş dixe. Damezrandina kooperatîfan di dabînkirina edaleta aborî de, bi taybetî li gundan, wekî amûrek giring tê bikar anîn. Ev meclîs li dijî îstîsmara kedê weke avahiyeke ku hevgirtin û wekheviya aborî diparêze kar dike.

**10-Meclisa Civakên Gel û Baweriyan: Azadiya Bawerî û Neteweya Demokratîk**

Meclîsa Civakên Gel û Baweriyan rêxistinbûn û nûnertiya azad a komên bawerî û civakên etnîkî yên cuda misoger dike. Li gorî rêgeza neteweya demokratîk, di jiyana civakî de avahiyek li ser pirrengî û pirrengiyê ava dike. Dema ku ev meclîs ji bo parastina azadiya baweriyê têdikoşe, di heman demê de ji bo hemû beşên civakê xwedî mafên wekhev in.

Van analîzên kurt di bin her sernavê de ramanên bingehîn û fonksiyonê bi kurtî vedibêjin. Ev mijar nîşan didin ku çend aliyên jiyana civakî di bin sîwana Konfederalîzma Demokratîk de çawa tên birêxistinkirin û bandora her aliyekî li ser jiyana civakî radixe ber çavan.









# AVAHİYÊN CİVAKÎ YÊN KU SÎSTEMA DEWLETÊ QEBÛL NAKİN



DELİL ZİLAN

Moderníteya kapîtalîst, weke hêzeke ku bi kûrahiya pêkhateyên aborî, civakî û çandî yên civaka îroyîn diafirîne xuya dike. Lê belê, hejmara pêkhateyên civakî yên cihêreng ên ku li derveyî vê sîstemê bijîn an jî li dijî vê pergalê rawestin, gelek e. Di vî warî de em ê zêdetir li ser van pêkhateyên civakî û şêwazên jiyanê yên van pêkhateyên li derveyî moderníteya kapîtalîst bisekinin.

**Komîn û Kooperatîf**

Em dikarin bi giştî pêkhateyên civakî yên ne-pergalî bi vî awayî îfade bikin. Ew pêkhateyên civakî yên li ser esasên xwedîderketina hevpar û jiyana kolektîf in. Van koman li şûna xwedîtiya takekesî, xwedîtiya hevpar û parvekirinê teşwîq dikin. Li aliyê din kooperatîf ji bo peydakirina pêdiviyên aborî û civakî yên endamên xwe bi hevkariyê modela rêveberiya demokratîk dipejirînin. Li dijî moderníteya kapîtalîst li şûna ferdperestiya lîberal a moderníteya kapîtalîst giraniya xwe didin kolektîfîzmê.

> **Endamên komînan her tim pirsgirêkên xwe nîqaş dikin û bi awayekî demokratîk biryaran didin.**

**Strukturên Aborî û Civakî**

Civakên ku bi aboriyên li ser bingeha xwedaniya hevpar û parvekirina çavkaniyê ve fonksiyonek şêwaza jiyana komunal dipejirînin. Ew karanîna drav kêm dikin û bi gelemperî hewcedariyên xwe bi pergala barter an danûstendina rasterast peyda dikin. Pergalên aborî yên van civakan li ser prensîbên domdarî û parvekirina adil hatine avakirin.

**Xwedîderketina Hevbeş û Parvekirina Çavkaniyan**

Gelek civak erd, çavkaniyên avê û çavkaniyên xwezayî yên din di bin xwedîtiya hevpar de digirin. Van çavkaniyan ji bo peydakirina hewcedariyên hemî endamên civakê têne bikar anîn. Mînakî, civaka Christiania ya li Danîmarkayê wekî eko-gundek tê zanîn ku bi prensîba xwedîtiya hevpar tê rêvebirin. Erd aîdî hemû endamên civakê ye û xwedîtiya takekesî nîne. Parvekirina çavkaniyan bi awayekî adil li gorî pêdiviyên endamên civakê tê kirin.

## Jiyan û Jiyana Rojane

Şêwazên jiyana rojane yên van pêkhateyên civakî yên ku pergala dewletê qebûl nakin, li ser rêbazên domdar ên ku bi xwezayê re lihevhatî ne. Ev civak bi xwe xwarinên xwe hildiberînin, hewcedariyên xwe yên enerjiyê ji çavkaniyên nûjendar peyda dikin û bi vezîvirandinê bermahiyên xwe kêm dikin.

## Eko-Gund û rêzgirtina ji xwezayê re

Eko-gund modelên herî demokratîk ên van pêkhateyên civakî ne ku dixwazin bi xwezayê re bijîn. Van gundan bi giştî li ser esasên rêzgirtina ji xwezayê re xwarinê çêdikin. Armanc ew e ku bi têgihîştina rêzgirtina ji xwezayê re pergalên çandinî û niştecihbûnê yên domdar biafirîne. Weqfa Findhorn li Skotlandê mînakek cîhanî ya navdar a permaculture û jiyana domdar e. Li Findhorn, endamên civakê xwarina xwe mezin dikin, hewcedariyên xwe yên enerjiyê ji enerjiya tavê û bayê peyda dikin, û bermayên xwe bi kompostkirinê vedigerînin.

## Jiyana Koçerî

Hin pêkhateyên civakî şêwaza jiyana koçeriyê ya kevneşopî dipejirînin. Van strukturên civakî di demên cûda yên salê de, li gorî guherînên demsalî û pirbûna çavkaniyan ve girêdayî ye. Avahiyên civakî yên koçer bi dûrketina ji cîhana nûjen û bi kar anîna hunerên destan û teknîkên çandiniyê yên kevneşopî dijîn.

Şivanên koçer ên li Mongolya mînaka vê awayê jiyanê ne. Ev pêkhateya civakî ku li welatên xwe yên kevneşopî dijîn, debara xwe bi xwedîkirina sewalan û jiyana xwe ya bi hawîrdora xwe ya xwezayî re peyda dikin.

Di heman demê de, şêwaza jiyana koçeran li Kurdistanê jiyanek li ser bingeha zanîn û şarezayên kevneşopî ye, bi xwezayê re lihevhatî ye. Ajaldarî û hunera destan çavkaniya sereke ya debara koçeran e. Têkiliyên malbatî yên xurt û hevgirtina civakî bingeha avahiya civakî ya rahêneran pêk tîne.

Lêbelê, zehmetiyên ku di cîhana nûjen de rû didin, ji koçeran re dijwar dike ku jiyana xwe ya kevneşopî biparêzin. Li gel van zehmetiyan jî Koçer ji bo parastina mîrata xwe ya çandî û ji nifşên paşerojê re ragihînin têdikoşin. Şêweya jiyana Koçeran mînakeke berbiçav e ku çawa jiyaneke ku ji kûrahiya dîroka mirovahiyê vedigere, di cîhana nûjen de dikare bijî.

## Herêmên Xweser

Zapatîsta (Meksîka) hin pêkhateyên civakî, civakên xweser ên xweser ava kirine. Ev civak li ser esasê rêveberiya demokratîk û edaleta civakî di asta herêmî de ji sîstemên aborî yên kapîtalîst serbixwe jiyan dikin. Zapatîsta li herêma Chiapasê ji bo ku civakên herêmî xwe bi rêve bibin, hikûmetên xweser ava kirin. Ev hikûmet çavkaniyên herêmî li gorî pêdiviyên civakê bi awayekî adil belav dikin û biryar bi civînên demokratîk tên girtin.

## Perwerde û Tenduristî

Van pêkhateyên civakî bi gelemperî pergalên xwe yên perwerdehî û tenduristiyê ava dikin. Di perwerdehiyê de, bernameyên li ser bingeha xweza û nirxên civakê yên ku ramana afirîner û rexnegir teşwîq dikin têne bicîh kirin. Karûbarên tenduristiyê, ji hêla din ve, ji endamên civakê re xizmetê dikin ku bi karanîna dermanê kevneşopî û dermanê nûjen bikar tînin.

## Pergalên Perwerdehiyê

Di van pêkhateyên civakî de perwerde xwedî girîngiyeke bingehîn e. Bernameyên perwerdehiya xwezayê rê dide endamên civakê ku bi hawîrdora xwe ya xwezayî re bi hev re bijîn. Auroville (Hindîstan) bi nêzîkatiyên xwe yên orîjînal û afirîner ên perwerdehiyê tê zanîn. Li Auroville, zarok bi danûstendina bi hawîrdora xwe ya xwezayî re fêr dibin û nirxên exlaqî û polîtîk ên civakê digirin.
Ev serkeftinên pêkhateyên wan ên civakî ne.
Van pêkhateyên civakî bi nîşandana jiyana mayînde, hişmendiya hawirdorê, edaleta civakî û nirxên demokratîk jiyanek li derveyî pergalê afirand. Dîsa ev pêkhateyên civakî yên ku girîngiya hişmendiya ekolojîk, jiyana bi xwezayê re û hevgirtina civakî radigihînin, ji bo “civaka nûjen” çavkaniya îlhamê ne.

## wek encam


Avahiyên civakî yên ku li derveyî sîstemên kapîtalîst û dewletparêz dijîn, bi awayekî cidî bingehên netew-dewletan dihejînin û di heman demê de bi şêwazên jiyana xwe ya demokratîk dersên girîng didin civakê bi giştî. Di heman demê de bi hişmendiya ekolojîk û xwezayê re civakê teşwîq dike ku li hember nirxên exlaqî û polîtîk hesas be. Fêmkirina serpêhatî û serkeftinên van pêkhateyên civakî dihêle ku em fêm bikin ku pergala kapîtalîst a heyî çiqasî xerab û berevajî xwezaya mirovî ye.

Ev pêkhateyên civakî ku bi taybetî sîstemên dewletê qebûl nakin, ne tenê dijîn, di heman demê de ji pirsgirêkên civakî û hawîrdorê re çareseriyên rastir û demokratîktir jî pêşkêş dikin. Ev çareserî pirsgirêkên civakî yên ku modernîteya kapîtalîst afirandiye ronî dike.





# KOMÎN ÇÎ YE?



# Dİ WATEYA PÊYVNASÎ DE KOMÎN!



EYLÜL RİZGAR

Komîn, ji koka pêyva “KOM”ê tê. “KOM”, pêyvekî zimanê Aryenî ye. Ji aliyekî ve tê wateya “civandin” ji aliyekî din ve jî “giştîbûnê” îfade dike. Li gorî zanistê bîrkarîyê jî tê maneya “zêdebûn”.

Di ferhengên kurdî de hemwateya komîn wekê “hevgirtin”, “rêkxistin”, “hevbeşî”, “hevparî”, “şirîkatî” û “koperatîv” tê tarif kirin;

Ev koka pêyva “KOM” di gelek zimanên bi tîpên latînî bikartînin de jî wekê kurdî de hatiyê bikaranîn derbas dibe. Di zimanê ingilizî de “commune”, di zimanê fransî de “communauté”, di zimanê îtalî de “comune”, di zimanê spanî de “comuna” jî ji koka pêyva KOM tê.

Ji heman kokê gelek pêyvên din jî hatine zêdekirin. Yek ji wan a bingehîn jî pêyva “comminication” ango “ragihandin” (bi erebî itîsalat/tewasil) e.

Ger wekê nav bixwazin tarif bikin Komîn tê wateya “Mirovên ku bi hev re dijîn û her tiştî parve dikin.” Di hinek zimanan de “Komîn” tê wateya “şaredarî” (beledîye) jî.

Bi awayekî giştî Komîn, tê wateya “hatina cem hev a mirovan”. Wekê hemû tekîlî, çand, pîvanên ji bo hatina cem hev a mirovan jî dikare were şîrove kirin. Lewma Rêber Apo komîn wekê şertê hebûnî ya civakan dide naskirin. Hemû tevgerên civakî yên ji klan heta roja me îro pêşdikevin jî di esas de tevgerên komînî ne.

Ger em bixwazin penase komîn hinekî din berfirehtir bikin dikarin bêjin; Komîn, yekeyeke pergala civakî ya wekhevîxwaz e ku tê de beşdarîyekî dilxwazî heye û hemû temen û zayend cihê xwe tê de digrin. Ew pergala herî guncav e ji bo pêkhatina mirovî û civakî ku endamên komê bi jêhatîbûna xwe beşdarî jiyanê dibin û bêyî ku li hember tiştekî li bendê bin, hewcedariyên xwe pêk tînin.

Li gorî van pênaseyan komîn tê wateya polîtîkayê civakê jî. Ger em pênaseya polîtîka wekê “rêveberina karên rojanê” bikin, hingî ev penaseya me zêdetir cihê xwe digre. Bi gotinekî din komîn, navenda esasî ya meşandina karên rojanê ya civak û mirovan e. Lewma Rêber Apo dema behsa sîstema konfederalîye dike dibêje yek jê lingê bingehîn a pergala me KOMÎN e (her sê lingên din jî Meclîs, Akademî û Koperatîv e).

Komîn gelek caran weke yekîneyeke aborî tê dîtin û li ser vê bingehê tê pênasekirin. Danasîna komînê wekî yekîneyeke aborî teng e û têrê nake. Bêhtir siyasî û rêxistinî ye. Mebest ji beşdariya hevpar ne tenê xebatên hilberînê ye, tevlîbûna siyasî û îdarî ye jî. Pêşeroja civak an jî komê di encama ramanên hevpar ên hemû endamên civakê de tê diyarkirin. Ji ber vê yekê hem di warê siyasî û rêxistinî de hem jî di warê aborî de demokrasiyeke rastêrast pêk tê.

Di berga pêncemîn a Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk de Rêber Apo girêdana kesayet û komînê jî bi vê şeklî pênase dike; “Şertê yekem ê neteweya demokratîk ew e ku ferd azad be û vê azadiyê bi komîn an jî civaka ku pê re girêdayî ye, li ser bingeha siyaseta demokratîk pêk bîne.” “Kom an komîna demokratîk û azad, dibistana bingehîn e ku ferdê neteweya demokratîk lê çêdibe. Yê nebe komîn, yê bi komînî nejî, ferdîtiya wî jî pêk nayê. Gelek cureyên komînan hene û di her qada jiyanê de dibin. Li gorî cudahiyan, ferd ji komînekê zêdetir dikare di nava koman de cih bigire. Ya girîng ew e, ferd li gorî qabîliyetên xwe, li gorî ked û cudahiyên xwe zanibe di nava koman de cih bigire. Ferd berpirsiyariya xwe ya beramberî komîn an jî koma girêdayî wê ye, weke pîvana sereke ya exlaqîbûnê dihesibîne. Exlaq girêdan û hurmeta ji bo jiyana komin îfade dike. Komîn yan kom jî heta dawiyê xwedî li ferdên xwe derdikeve, bi vê jî wan diparêze û jiyana wan misoger dike.”

Komin

**Pergala komina**

**Ew teşeyê sîstema bingehîn a demokrasiya rasterast e. Yekîneya herî piçûk di Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ye. Li vê qadê û bi vê teşeyê civaka exlaqî û siyasî bi gewde dibe. Li vê qadê jiyana civakî, aborî û çandî pêk tê, û pirsgirêkên di vî warî de li vir çareser dibin.**

**Komîn, mecliseke serbixwe ye û di çarçoveya qada îdarî û rêxistinî de, ew cihê sazkirina biryar, rêveberî û hêza çareserkirina dozên civakî ye.**

**Awayê Pêkhatina Komînê:**

**1- Ji hejmareke malbatên ku di nava sînorê îdarî û erdnîgarî yên komînê de ne pêk tê.**

**2- Her welatiyek li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, endamê komînê ye.**

**3- Hevserokatî û komîte ji hêla endamên komînê ve tên hilbijartin. Eger hevserokatiya komînê yan jî yek ji komîteyan wekî tê xwestin bi erka xwe ranebe, baweriya pê dikare were vekişandin û bêyî ku li benda hilbijartinên giştî bimînin, hilbijartin dikarin pêk werin.**

**4- Komîn di karê xwe de, xwe dispêre demokrasiya rasterast.**

**Ger em pênaseya polîtîka wekê “rêveberina karên rojanê” bikin, hingî ev penaseya me zêdetir cihê xwe digre. Bi gotinekî din komîn, navenda esasî ya meşandina karên rojanê ya civak û mirovan e.**

# Wekê Modela Jîyanê Komîn



# Bingeha Jiyana Civakî Komîn





NESRÎN FARQÎN

Ji bo rast analîzkirina roja îro, mirovahiyê hertim pêwîstiya xwe bi naskirina paşeroja xwe dîtiye. Li ser vê pêwîstiyê rêbazên mîtolojîk, olî, felsefî û zanistî bûne hewldanên ravekirina dîrokê. Dîrok, bîr a civakî ye. Dîroka civakî piranî bi rêbaza devkî hatiye veguhestin. Ev, rêbaza mîtolojîk e ku bi giranî di çîrok, destane û klamên dengbêjî de hatiye ser ziman. Nexasim ev rêbaz di dîroka Kurdan de pir ber bi çav e ku ew bixwe yek ji gelê herêmê yê herî qedîm in. Ji bo naskirina şêwazê jiyana komîn jî mînakek bijarde ne ku wan li beramberê hemû guhertinên sîstemîk ên şaristaniyê li ber xwe dane û aliyên xwe yên otantîk parastine. Mirov dikare di çand a jiyana wan a îroyî de jî şêwazê jiyana berya deh hezaran sal bibîne. Şêwe ya konfedaral a eşîrî, mînaka vê ya herî ber bi çav e.

Têgeha Kom, weke kok di zimanê Aryenîk û Kurdî de di wateya civat ango grub de tê bikaranîn. Komînalbûn jiyana hevkar û civakî ravedike. Komîn, hem ruh hem jî formê rêxistinbûna vê jiyana hevkar e.

“Serhatiya jiyana dûr û dirêj a temenê cînsê mirov ji sedî 98 bi şêwazê klan a ku şaneya bingehîn a civakê ye pêk hatiye. Klan ji komên 25-30 kesî pêk dihatin; zimanê îşaretan bi kar dianîn; debara xwe bi nêçîrvanî û berhevkirina gihayan dikirin. Ji lewra mirov bi hêsanî dikare bibêje, jiyan ji bo wan gelekî zor û zehmet bû. Peydakirina qût û zadekî tekûz zehmet bû, heywanekî kovî dikaribû wan bixwe. Avhewa carnan pir sar dibû. Çar demên girîng ên qeşayî pêk hatibûn. Lewma divê mirov ji wan re nebêje pêşiyên me bûn û derbas nebe. Eger hewldanên wan ên mezin nebûna em ê nebûna. Divê mirov di vir de li yekparetiyê bigere. Bi tevahî mirovatiya me ya îro encama şerê wan ên man û nemanê ye. Dîrok bi tenê bi beşê hatiye nivîsîn nabe dîrok. Dîroka rastî, eger rewşa xwezaya me ya civakî ya milyonan sal berê li ber çav negire, nikare watedar bibe. Rewşa pêşî ya mirovatiyê bike yek, belkî jî xisletên sereke yên civaka klan in.”

*(Reber Abdullah Ocalan MCD Pirtûka( 3.)*

Serdema Neolotîk a piştî jiyana nêçîrvanî, berhevkirina gîha û koçber a zêdetirê milyonek sal, mirovahiyê dest bi çandiniyê, kedîkirina lawiran û avakirina gundên xwecihî kiriye, di qonaxên cihêreng de derbas bûye û berbelavê pêvajoyek dirêj a weke 6 hezar salan bûye. Ev dema neolotîk di navbera dîrokên B.Z. 11.000-6000’an de pêk hatiye.

Ev demeke ku ne tenê pêşketinên girîng ên teknolojîk di heman demê de di şêwazê jiyana civakî de, di wate dayînê de û di pergala jiyanî de jî guhertinên bi kok bi xwe re aniye. Bingehê şaristaniya îro di wê demê de tê rûniştandin. Hetanî pêvajoya Şoreşa Endustiriyê di tevahiya dema derbasbûyî de bingehê pergala civakî ya serwer di vê demê de tê avêtin. Ji ber ku ev serdem veguhertina herî girîng a dîroka şaristaniyê ye, ji aliyê gelek lêkolînvanan ve weke "Şoreşa Neolotîk" tê bi navkirin. Serdema Neolotîk, "Dema Kevirê Cîlakirî" êdî weke civakên gund ên hilberîner ên destpêk jî tê pênasekirin

Serdema Neolotîk, weke du serdeman ji hev tê dabeşkirin. Yek ji vê dema bê kûpik e, yek jî dema bi kûpik e. (Kûpik, ango kûzik û dîzik, beroşên ji heriya kîl têne çêkirin.) Ev dem, ne tenê bi çêkirina amûr û firaqan re peşketina teknolojiyek nû ve girêdayî ye. Di Serdema Neolotîk a bê kûpik de jiyana xwecihî û bi pêdiviyên wê ve girêdayî mîmariyeke nû û jiyaneke gundewarî pêşdikeve; ji bo xwe xwedîkirinê nebatên tov û lawirên di pêvajoya kedîkirinê de her ku diçe zêdetir tên tevlîkirin lê belê nêçîrvanî û berhevkirina gîha weke bingehê jiyanê hebûna xwe didomînin.

Li beramberê vê li gel Serdema Neolotîk a bi kûpik re modela aborî ya xwe dispêre cotkarî û hilberîna xwe xwedîkirinê bi hemû pîvanên xwe re avadibe û diteyîse tevahiya qadên jiyana civakî. Ji ber vê sedemê dabeşkirina du alî ya Serdema Neolotîk ji diyarkirina ew navên li van serdeman hatine kirin girîngtir e.

Diyardeyek girîng a bi Serdema Neolotîk re derketiye pêş jî pêvajoya guhertinê ya bi lez e. Di demên berya vê de, di jiyana mirov a milyon salî derbas kiribû de pêvajoya guhertinê pir hêdî pêk hatiye.

Ev dem, weke demeke pir dînamîk tê dîtin ku bi rêbaza ceribandinê re lêgerînên nû çêdibin û tevahiya hêmanên ku çandê pêktînin bi domdarî diguherin. Lê belê ev guhertina bi lez, tenê di civakên hilberîner ên pêşî de ango li herêma kakil a Neolotîk lê pêk hatiye çêdibe. Jixwe tê zanîn ku li derveyê vê herêma kakil, zêdetir hebûna jiyaneke sekinandî heye.

Weke tê dîtin mirov dikare di vê demê de du herêmên kakil ên ji hev cuda pênase bike: Herêma yekemîn, Mezopotamayaya jorîn derdora Amed û Ruha ye ku weke Neolotîka Rojhilata nêz tê bi navkirin û herêma duyemîn jî di Anatolyaya navîn de derdora Konyayê ye.

Di dema Neolotîkê de baweriyên heyî bi daneyên derketine holê re bêtir zelal dibin. Bi taybetî di lêkolînên arkeolojîk ên li Mezopotamyaya jorîn de li gelek navendên xwecihî peykerên jin ên ji heriya kîl hatine çêkirin bi dest ketin. Ev, xwedavendên sembola bereket û zayînê yên Serdema Neolotîkê bûn. Peykerê xwedavenda dayîk a li Çatalhoyukê hatiye dîtin qelew e û bi heybet xuya dike, li ser textekî ku li her du aliyên wî serê şêran heye rûniştiye û di nava gavên wê de serê zarok heye. Li gorî hinek lêkolînvanan têgeha xweda, di Serdema Neolotîk a berya hilberîna xwe xwedîkirinê de derketiyê holê. Ev jî mutasyona çandî ya herî girîng e. Feraseta olî ya nû, ji aliyekî ve mirov dikare bêje ku bi kar anîna axê û bi hilberîna xwe xwedîkirinê re pêşketiye. Êdî mirov ax ê ne tenê weke çavkaniyeke xwe xwedîkirinê, di heman demê de weke hêzeke veşartî ya ku hemû jiyanê beralî dike û bandor dike didît û pê bawer dikir.



Ji ber di Serdema Neolotîkê de bi şewazê takas dan û stendin çêbûye madeya xav hatiye bikaranîn. Nîşaneya vê ya herî baş obsîdyen in ku jêderên wê yên mezin li Çewlik û Tetwanê ne. Nîşaneyek dîtir jî qalikên deryayê ne ku bi koka xwe ji Deryasor û Deryasipî ne.

**Rêber Apo** ji bo şêwazê jiyana komîn gelek nirxandinan dike, bi taybetî li ser rola jin a diyarker disekine û dibêje; "Di pergala dayîkê ya komin a destpêkê de hîmê çanda aboriyê tê danîn. Qût û zadê ji berhevkirina pincarê û berhemên nêçîrê têne bidestxistin yekser tên bi kar anîn û ji çerm û rehikên wan sûd tê wergirtin. Bi giranî jin-dayîk otorîteya plansaziyê ya klanê ye. Bi awayekî mirov dikare bibêje hegemona dayîk a pêşî ye. Nakokî û têkiliya dayîka civaka klanê di nava şert û mercên xwezayê de ji kesên bibin sedema rîskê xwe diparêze, ji kesên derfetê kêrhatin û xwedîkirinê didin sûd werdigre. Di van şert û mercan de nasnameya klanê ji bo kesan man û neman e."

Hêmanên sereke yên ku civakê dikin civak exlaq û polîtîka ye. Exlaq, civakê li derdora nirxên hevpar kom dike, di têkiliya wateyê de pîvan diafirîne, bi estetîzekirina çalakiya fikirandin û pêkanînê re têgehên weke baş, rast û bedew dike bingehê çanda jiyanê. Civak ji bo hebûna xwe bidomîne bi zanîn û çanda xwe ya hevgirtinê exlaqê jiyana komînal avadike. Komîn ku dibe cihê wekhevî, hevkarî û polîtîkbûnê, organîzasyona xwerû ya jiyana civakî ye. Polîtîka jî weke diyardeyeke civakî xwedî taybetmendiyên xweser ên ku wate û hêza cewherî pêşdixe, têgihîştin û nasname avadike, ji bo civakê çalakî û afirîneriyê pêşdixîne.

Em jiyanek bifikirin ku hemû hebûn di nava ahengeke efsûnî de bi hev re dijîn, bi hev re di nava têkiliyeke zindî de ne, her hevdû temam dikin û bi hebûna hev şadibin û bi hêz dibin. Hebûnên qala wan tê kirin hebûnên bê nakok nîn in; jixwe ya ku dihêle ev têkilî û tevgera piralî çêbibe di bingeh de hebûna van nakokiya ne. Her hebûna a ku xwe li jiyanê digre pêwîstiya xwe bi pergaleke rêxistinî dibîne. Ev rêxistinbûn di hebûna nebat, lawir û mirov de ber bi çav e. Di warê biyolojîk de jî her zindî xwedî pergaleke rêxistinkirî ye.

Her wiha her zindî ji bo hebûna xwe ya fizîkî bidomîne, pêwîstiya xwe dibîne ku li ser zemînekî bi awayekî komî bi hemcureyê xwe re pergalekî hevgirtî bihûne. Ev pergal di hebûna mirov de bi şêwazê civakbûnê pêşdikeve. Civaka ku mirov di nav de hebûna xwe nas dike, rêxistinbûna xwezayê ya herî pîşketî ye.

Weke her mijarê, ya herî girîng jî mijara jiyan çawa ava bû, mirov çawa çêbû herdem di lêgerîna rastiya hebûnê de bûne pirsên sereke Di civaka xwezayî de ji bo mirov nirxê herî pîroz, klan a wê/wî ye ku ew bixwe endamê wê ye. Her endamê komînê hemû jiyana xwe li gorî parastin, xwedîkirin û pêşdebirina klanê bi rêxistin dike. Klan ango komîn şêwazê jiyana destpêk a bi hevre, wekhev, yekpare û azad e ku hemû kar û xebat ji bo bercewendiyên civakê tên bi rêvebirin. Li gel vê her endameke klanê xwedî mafên hevpar e û çawa ku kes ê endam ji bo civaka xwe ked dide, civak jî ji bo parastin û xwedîkirina her endamê xwe di nav hewldanê de ye. Jixwe klan ji kesên endam pêk tê û endam jî bi kombûna hev re klana xwe pêk tînin. Her wiha di hemû endamên klanê de hêmana bingehîn berpirsiyariya xwezayî ye. Her endam ji bo pêşwazîkirina pêdiviyên jiyanê di nîqaşên avakirina plansaziyê de xwedî nêrîn in û di heman demê de di pêkanînê de jî çalak in. Di vê organîzasyonê de nêzîkatî li ser esasê karê tê xwestin gihandina encamê ye û her kes bi îradeya xwe û hemû hêza xwe tevlî xebatê dibe. Kesayet, di qada jiyana komînal a civakî de pozîsyona tevlîbûna xwe diyar dike, di rastiya jiyana komînê de serwext dibe û bi vê re hem xwe, hem jî qabîliyetên xwe nas dike. Ev şêwazê jiyanê ji bo avakirina kesayet, heta dawî dibe zemîneke azad.

Ji ber ku baweriya demê anîmîzm e, hemû hebûn zindî tên dîtin û li hemberê giyana xwezayê nêzîkatiyek rêzdar tê raberkirin. Di mirov de feraseta serdest-bindest, obje-subje nîn e û xweza bixwe weke diyariyek mûjîzewî tê dîtin. Nexasim dema avhewa ji bo jiyana xwecihî dest dide, ew demên ku li derdora çem û rûbaran şînkayî çêdibe, bi naskirina demsalan re, cihêrengiya di nebat û ajalan de her wiha şopandina ahenga di nav xwezayê de ji bo mirovê ku wê weke cureyek dîtir ê nû çandê pêşbixîne bûye çavkaniyek îlhamê û fêrgehek bê hempa.

Helbet taybetmendiya ku mirov weke hebûnek di nava xwezayê de ji zindiyên dîtir cuda dikir ne tenê ev fêrbûyîn bûn. Mirov kengî weke klan kom bû, nîqaş kir, fikir pêşxist, armanc da pêşiya xwe û bi armanc tevgeriya di guhertinê de gav avêt. Ango kengî civakî bû, bi aqlê civakî tevgeriya bû mirov. Dibe ku li gorî mercên demê armanc, weke hebûn jiyana xwe domandin bû. Lê belê jixwe hemû hebûn weke ajoya bingehîn bi vê refleksê tevdigerîn û gelek cure bi komî dijiyan. Ev şêwe jiyan di cureyê mirov de jî hebû ye û hê jî didome. Xweseriya di cureyê mirov de ev e ku li gel aliyê xwezayî, xwediyê taybetmendiyeke afrîner e jî. Afrîneriya mirov a herî hêja jî ji bilî avakirina derfetên jiyana fîzîkî û teknîkî, di pêşxistina exlaq ango îradeya azad de ye.

Di jiyana klan a ku qala wê tê kirin de mirov di nava danûstendineke xwezayî de ne. Hemû derfetên heyî hevpar in û li gorî pêwîstiyan di parvekirinê de sînor nîn in. Ji ber nêzîkatiya milkperest nîn e, her tişt ji bo debar û domandina jiyana klanê ye. Ferseta jiyanê bi şêweyê; “ferdek me fedayê tevahiya klanê ye, tevahiya klanê fedayê ferdek me ye” hatiye hûnandin. Kes nabe milkê kesekê/î û her kes aîdê klanê ye. Zarok, zarokên hemû klanê ne û her ferd bi berpirsiyartî xwedî li zarokan derdikeve û wan perwerde dike. Jixwe zewac nîn e û di navbera jin û mêr de têkiliyeke xwezayî û azad heye. Ji ber ku her ferd bi berpirsiyariyeke dilxwaz tevlî jiyanê dibe bi coş e û di nav tevgera berhem avakirinê de ye. Di vê civaka xwezayî de mirov bi jin-dayîkê ve girêdayî ye, bi hişmendiya hevsengiya analîtîk û hestiyar difikire, hîs dike û tevdigere. Ferd, bi qasî ku tevlî jiyana hevpar dibe giraniya xwe avadike û bi nirx dibe. Ango ferd bi qasî civakî dibe hebûna xwe diyar dike. Her ferdê bi vê ferasetê tevdigere ji aliyê civakê ve tê hezkirin û kêfxweş dibe. Civak jî her ku di çawaniya jiyana xwe de pêşketin avadike dikeve nava lêgerînên çêtir, rastir û bedewtir.

Her roj, her kêlî di nava hewildana afirandinê de derbas dibe. Ji ber ku her tişt nû nû bi aqilê wan û di destên wan de diafire, ew bi dilpakiya zarokan û bi lêgerîna filozofan tevdigerin û kêfxweşiyê dijîn. Xweza jî bi dewlemendiya xwe têr derfet dide ku ew jiyanê bi coşa cejnê bijîn.

Bêguman jiyana klanê herdem gul û gulîstan nebûye û car caran nêzîkatiyên neyînî jî derketine pêş. Lê belê civak hertim li hemberê van nêzîkatiyan hişyar bûye û ji bo pêşî lê girtinê derfetê zêdegaviyan nedayê. Ji bo vê jî di civaka xwezayî de herdem berhemên zêde weke diyarî hatine parvekirin

Di şêwazê jiyana komînal de têkiliyên jiyana civakî bi şêweyê herî zindî, bi wate û azad pêşdikevin. Mirov dikare şêwazê jiyana klan weke komînên azad binirxîne. Ji ber ku di ev şêweyê jiyanê de hişmediyekî li ser esasê têkiliyên azad hatiye avakirin. Mirov, bi mirovan re, bi jin re, bi xwezayê re di nava dan û stendineke xwezayî û azad de ye. Jiyan yekpare tê dîtin û di asta pîroziyê de qedrê xwezayê tê girtin. Bi awayek dîtir jî mirov dikare bêje ku hişmendiya civaka klan ji ya îroyî demokratîktir, ekolojîktir û azadtir e.

Di encamê de em fêm dikin ku bingehê jiyana civakî bi formê klanê sazbûye. Klan dibe formê destpêk, şaneya kok û cewherê hebûna civakî. Bêyî hişmendiya komînê ya exlaqî û polîtîk ti kombûn nikare yekîtiya xwe biparêze û pêş de bibe. Hêmanên xwerû yên bingehîn di jiyana komînê de her ku pratîze dibin hebûna wê mayînde dibe, ber bi formên qebîle, etnîsîte, eşîr û hwd. ve mezin dibe û heta roja me tê. Weke hebûn, mirov û civak, bingehê jiyan û hemû destkeftiyên me di jiyana klan-qebîle-komîn de hatiye danîn. Niha em li ser vê bingehê dijîn û lêgerîna xwe ya wateya jiyanê didomînin. Lê em bi qasî bi vê bingehê ve girêdayî bimînin em ê karibin wateyên nêzî rastiyê peyda bikin. Çawa ku ew komên mirovan ên destpêk di lêgerîna jiyanek çawa de bi aqlê civakî çand avakirin, em jî bi derfetên heyî re, bi zindîkirina ruhê klanê re û bi eşq û kelecana wê demê re dikarin jiyaneke azad bihûnin.

Ew ruhê xwerû, yekpare yê ku bi jiyan, civak û xwezayê re girêdayî ye ji tunebûnê hebûn afirand; ji bo xwe biparêze xanî lêkir, cil û berg dirût, firaqan çêkir, tov çand, heywanan kedî kir, amûrên teknîkî pêşxist, ol û bawerî peyda kir, zimanekî edebî kemiland, stran got, wêne û peyker çêkir, ji bo şîfayê dermanan dît, têkiliyên civakî, hevrêtî û hevaltî avakir, bi kurt û kurmancî çanda jiyana civakî afirand.

Ev berhemên jiyanî bi tevahî di encama xebatên lêgerîn, lêkolîn, ceribandin û pêkanîna mirovên destpêk ên bi milyonan sal berê de derketine holê. Ew mirovên ku pêşên me ne bi keda fikir, ruh û beden xebitîne. Her çiqas zanistên sosyal ên sedsala 20. ev kalnên destpêk bi hişmendiya pozîtîvst weke hov pênase bikin jî rastiya klan a ku derketiye holê vê nêrînê pûç dike û nîşan dide ku di lêkolîn, pênasekirin û pêkanînê de her wiha di nêzîkatiya li hemberê jin, mirov, civak û xwezayê de ji zanistên pazîtîvîst exlaqîtir in û zêdetir nêzî zanistê ne.

Ev jiyana bi şêwazê klan niha jî di jiyana hinek qebîleyên li çol û daristanên Efrîqa, Avustralya û Emerîkayê dijîn de hebûna xwe didomîne. Ev qebîle bi zanebûn teknolojiya serdema me red dikin û tercîh dikin ku tevlî jiyana şaristaniyê nebin. Mirov dikare di şêwazê jiyana van qebîleyan de asta azadî û wekheviyê, nêzîkatiya felsefik, kûrbûyîna fikir û wateyê ya klanên destpêk bibîne. Ev qebîleyên ku bi navê Aborjîn û çermsor tên naskirin, şêwazê jiyana civaka xwezayî hê jî didomînin. Niha jî hinek gotinên wan di asta aforîzma de balê dikêşin. Mînak, hin gotinên pêşiyan ê Çermsoran wiha qala perpirsyarî ya li hemberê civak û xwezayê dikin: “Kesê ku xeletiyê dibîne û ji bo sererastkirinê gav neavêje, bi qasî kesê xeletiyê dike tewanbar e. / Dema ku çemê dawî zuha bû, dema dar a dawî tune bû, dema masiyê dawî mir; wê mirovê sipî fêm bike ku pere ne tiştekî xwarinê ye.” her wîha gotineke pêşiyên Aborjîn jî dibêje; “Em hemû mêvanên vê derê û vê demê ne. Em tenê derbas dibin. Armanca me ya li vir; çavderî, fêrbûyîn, pêşketin û hezkirin e. Em ê piştre vegerin malê.”

Dema em li rewşa serdema 21. dinêrin bêtir fêm dikin bê çima ev qebîle di tarzê jiyana xwe de bi israr in û li ber xwe didin. Asta ku şaristanî gihîştiyê jiyanê aniye rewşa xwekujiyê. Bêdadiya di navbera mirovan de,qetliyamên li ser jinan, karesatên ekolojîk hemû di encamê dûrketina ji şêwazê jiyana civaka xwezayî de pêk hatine. Ji bo ev qeyrana şaristaniyê bi dawî bibe divê mirovahî li cewherê xwe vegere. Naxwe ew ê bi xwe re dawî li cîhana ku lê dijî jî bîne.

Di lêgerîna heqîqetê de referansa me divê hertim civaka destpêk a xwezayî be. Ji ber ku cewherê me di wir de veşartiye, em dikarin gelek bersivên pirsên xwe ji wê derê bigrin. Ango me li ku derê wenda kiribe, divê em li wê derê bigerin. Helbet niha jî lêgerîn didomin û wê her bidomin. Lê belê gelek girîng e ku em bi diomdarî pirsên weke em kî ne, ji ku derê hatine, em çewa dijîn, divê em çawa bijîn û divê em çi bikin ji xwe bipirsin.

Bi qasî peydakirina bersivên rast em dikarin yiyaneke yekpare li dar bixin û bihûnin. Bi vî rengî em dikarin cardin jiyanê bi exlaq û polîtîkayê bimeyînin, bi zanist û hunerê bixemilînin û bi azadî û serfiraziyê bikemilînin.

**Weke hebûn, mirov û civak, bingehê jiyan û hemû destkeftiyên me di jiyana klan-qebîle-komîn de hatiye danîn. Niha em li ser vê bingehê dijîn û lêgerîna xwe ya wateya jiyanê didomînin. Lê em bi qasî bi vê bingehê ve girêdayî bimînin em ê karibin wateyên nêzî rastiyê peyda bikin**

TEVGERÊN KOMÎNÎ

# Di şaristaniya navendî de rêxistinên komînî



ŞOREŞ MÊLETÎ





# TEVGERÊN KOMÎNÎ

Di pêvajoyên destpêkê yên şaristaniya dewlet-desthilatî de li milekî şaristanî yanî desthilatî-dewlet, li milê dîn jî şaristaniya demokratîk, bi awayê qebîle, eşîr, û pergalên curbicur ên malbatan, bi şiklê çand û exlaqa civakî û hwd. Hebûna xwe domandiye. Lê belê her ku bajar-dewlet zêde bûne, bi demê re şaristaniya navendî û împaratorî û dewletên hegemon ava bûne, şaristaniya demokratîk jî wekî xeteke duyemîn bi şiklê pergalên qebîle, eşîr û malbatan, derketina pêxemberan, terqîtên curbicur, mezhebên cuda cuda, rêxistinên civakî, meclis, tevgerên komînal, hevkariya jinan, cemaatên komînal her yekê li gorî dem û serdema xwe bi terza xwe li dijî şaristaniya navendî têkoşînên xwe domandine.

Li dijî şaristaniya navendî, hê bêhtir sekneke fîlozofî, zanyarî a li dijî hişmendiya şaristaniya navendî jî her hebûye. Ev xeta fîlozofî-Entellektûl bi giranî di çêbûna hişmendiya azadiyê (di aliyê zanistî û hem jî di aliyê exlaqî de) ya mirovahiyê de bi roleke girîng rabûye. Bigire ji Zerdeşt, Sokrat, Buda, Manî, Xalacê Mansûr, Suxrewerdî, Brûno, Niestzsche, Einstein, Elî Şerîatî, Gordon Childe, Noam Chomiski jî temsîla vê xetê kirine.



Bi taybetî li Rojhilata Navîn rayê şaristaniya demokratîk bi şiklê tevgerên Komînal, bi berxwedana xwe ya ku bi sedan sal berdewam kiriye cewhera mirovahiyê, çand, ziman û exlaqa civakê, jiyana bi hev re ya civakê parastine.

**LI ROJHILATA NAVÎN TEVGERÊN KOMÎNÎ**

Mazdek, Xuremdîn, Ebû Mislim Xorasanî, Babek

Li Rojhilata Navîn hemû berxwedanên dikevin çarçoveya kevneşopiya tevgerên demokratîk-komînî hema bêje bi heman çarenûsê ve rû bi rû mane. Di derbarê wan de çi agahî û belge hebe, hatine îmhakirin. Tiştê maye jî, ji aliyê hêzên dewlet û desthilatdariyê ve hatiye desteserkirin û hatiye çeloxwarîkirin. Heman tişt hatiye li serê Mazdekî û Mazdekiyan jî. Bi qasî tê zanîn Mazdek ji Hemedanê ye û ji dayikbûna wî nayê zanîn lê (P.Z) di 499'an de hatiye qetlkirin.

Mazdek fikr û felsefeya xwe li ser esasê nêrînên Zerdeşt û Manîzmê, û dîsa ol û nêrînên exlaqî û felsefî ku wê serdemê li Rojhilata Navîn serwer in çêkiriye. Li ser vê esasê jî berxwedaneke komînî li dar xistiye.



Lê Mazdek hêza xwe ya esasî ji civaka Rojhilata Navîn û ji çanda wê girtiye. Hewl daye ku fikr û nêrînên xwe bi rêbaza dualî ya Zerdeştî ya bi şiklê ku dibêje, ronahî û tarîbûn, başî û xirabî timî di nava şerekî de ne û ev şer li her derê didome. Li gorî nêrînên Mazdek jî wekî di Zerdeştî de kuştina mirovan û xwarina goşt qedexe ye. Li gorî wî dema ku mirov karibe ji mal û milkê şexsî, ji ezeziyê û takekesperestiyê bi parêze, olê neke amûreke desthiladarî û mal û milkê xwe zêde kirinê, xwe ji şidet û çavbirçîbûnê dûr bigire û li dijî van şer bike, dikare bibe civakek ku li ser wekhevî, hezkirin û xwîşk û biratiyê ava bûye.

Mazdek bi giştî li dijî şaristaniya navendî ye lê bi taybet jî bûye pêşengê berxwedana komînî-demokratîk a li dijî dewleta Sasaniyên hêza hegemon a wê serdemê. Wî bi feraseta xwe ya felsefî hewl daye ku li şûna pergala civakî ku ji aliyê rahîbên Zerdeştî ku bûne paşverû û Sasaniyan ve hatiye xirakirin, pergaleke civakî ya li ser esasê wekhevî, hevpar û azadiyê ava bike. Bi kurtûcewherî rêgezên wî wisa rêz kirin gengaz e: 1-Pêwîst e mal û milk were parvekirin û bi hev re were bikaranîn. 2-Divê di nava civakê de jin û mêr wekhev bin. 3-Ti kes nikare li ser mirov-civakê desthilatdarî û tahakuma xwe ava bike.

Piştî ku Mazdek hatiye kuştin hevsera wî, Xurem ev têkoşîn daye domandin. Hewldanên wê yê têkoşînê, ji bo avabûna kevneşopiya komînalî ya Xuremî bûye bingeh. Bi kurtasî Xuremîzm kokê xwe ji felsefeya Zerdeşt digire û azadîxwaz, wekhevîparêz û komînî ye. Mînak, Elewîtiya Anatoliyê û bi taybet jî Elewîtiya Kurdan çavkaniya xwe ji vê nêzîkbûnê digire.

Taqîbatên li dijî Mazdekiyan bi kuştina wî dawî lê nehatine. Ji ber vê yekê jî tevgera Xuremî li her derê ku çûyê navên cuda li xwe kirine, hin caran jî neçar maye bi temamî veşartî tevbigere û bandora xwe ya di nava civakê de bi aliyê çandî nîşan bide.

**Ebû Mislim Xorasanî**

Yek ji tevgerên dîrokî yên gelerî-komînal ji aliyê Ebû Mislim Xorasaniyê Kurd ve hatiye destpêkirin. Ebû Mislim Xorasanî, bi qasî tê zanîn di 718'an de li Belh ku îro di navbera Efxanîstan û Xorasanê de ye ji dayik bûye. Ji serhildana mezin ku bûye sedem ku xanedaniya Emewî hilweşe û li şûna wê, xanedaniya Ebasî çêbibe re pêşengî kiriye. Di avabûna dewleta Ebasî de jî bi roleke girîng rabûye.

Taybetmendiya xwe Ebû Mislim Xorasanî ya herî girîng ew bûye ku rêxistinkarekî mezin bû, dikarîbû civakan pir bi zû û bi lez bigihîne hev. Ji ber vê taybetmendiyê xwe, dikarîbû di demeke pir zû de nakokiyên talî û yên bingehîn nîşanî gelan bide. Ev bi hostatiyeke mezin bi ser xistiye; karîbûye beşên mezin ên civakan ku ji Emewiyan ne rehet in îqna bike ku nakokiyên xwe li aliyekî daynin û bibin yek.

Ji dema ku dawî li desthilatdariya Emewiyan hatiye û serdema Ebasiyan dest pê kiriye, heya ku di sala 754'an de hatiye qetlkirin Xorasan bi rêve biriye. Di vê rêvêberiya xwe de şiklekî balkêş ê edelet û wekheviyê meşandiye; zêdetir ji qebîle û eşîrên Ereb, xwe sipartiye beşa civakên ku nû bûne Misilman û bi taybet jî xwe sipartiye qebîle û eşîrên Kurd. Yekîneyên xwe ji gelên din ên herêmê û bi taybetî jî ji Kurd, Acem û Tirkên ku ne Ereb in pêk aniye, di nava refên xwe de zêde zêde cih daye Zerdeştî û mirovên ji baweriyên cuda. Bi wan re têkiliyeke li ser esasî wekhevîxwazî û edaletê çêkiriye.

Împaratoriya Ebasî rêveberiya Ebû Mislim Xorasanî ku wekhevîxwaz û alternatîf bûye, şopandiye. Dîtiye ku her diçe ew bi hêz dibe. Ebasiyan ev ji bo xwe wekî gef fêm kirine. Ji ber vê yekê di sala 754'an de Ebû Mislim Xorasanî dawetî Bexdayê kirine û li wê derê di encama komployeke bê bext de ew qetl kirine.

Ebû Mislim Xorasanî jî feraseta xwe ya rêveberiyê ya wekhevîxwaz û adil ji komînalîzma Mazdek girtiye. Xuremî û Batiniyên ji Ebû Mislim bi şunde dest bi têkoşînê kirine, ew ji xwe re wekî çavkaniya fikrî û polîtîk dîtine.



## Berxwedanên Komînî Yên Bi Pêşengiya Babek

Ji tevgerên komînal ên Xuremî ku çavkaniya xwe ji Mazdek digirin, ya herî li pêş di serdema Babek de bi pêş ketiye. Di sala 808'an de li Azerbêcanê pêşengê tevgera Xuremî, Cawîdan Bîn Sehl bû. Piştî mirina wî, Babek, dibe pêşengê tevgera Xuremî. Di sala 816'an de ji bo ku hêza tevgera xwe zêde bike amadekariyeke mezin dike û bi şiklekî herî zelal bernameya xwe eşkere dike; li gorî vê armanca wî ew bûye ku jiyaneke wekhevîxwaz, hevpar û komînal ava bike. Di maneyekê de ji bo ku vê jiyanê ava bike, herêmên rizgarkirî bi afirîne têkoşîn daye destpêkirin.

Babek ji xwe re herêma Bezz a Azerbêycanê navend digire û ji vê derê şer û têkoşînê bi rêve dibe. Hema bêjê herêmeke rizgarkirî ava dike. Heya bi 835'an ev têkoşîn didome. Siltanên Ebasiyan di dawî de fermandarekî Tirk dişînin li ser wî. Şer sê salan didome. Di encamê de kelheya Babek lê dimîne tê dorpêçkirin. Bi şiklekî ji dorpêçê derdikeve.

Babek, xwe dispêre mîrê Ermen Sehl Îbn-Sumbat. Lê bi xiyaneta mîr re rû bi rû dimîne. Dema Babek, dixwaze derbasî erdê Bîzans bibe û hêza xwe bi ser hev ve bîne, wî mijûl dike û bi komployekê tevî hevalên wî teslîmê Ebasiyan dike.

Babek, di serdema xwe de bi pergala civakî ku ava kiribû, jiyana wekhev û hevpar hakim kiribû û bibû hêviya gelên bindest ên herêmê, serhildanên ku 20 sal dewam kirine bi pêş xistiye. Lê belê hin nebesî û şaşitî (têkiliyên bi desthilatiyê re) bûne sedem ku ev têkoşîn mayende nebe.

Babek, herî dawî li meydana Sammarayê ji aliyê Mutasimê Ebasî ve bi êşkenceyeke giran tê qetlkirin ji.

## TEVGERA KARMETIYAN

Karmetî, ji ber tarza xwe ya di kar û xebatê de divê ji bo xebata me ya komîn û meclîsan bi baldariyeke mezin werin lêkolînkirin; di serdema xwe de tevgera herî mezin a li Rojhilata Navîn bûye. Di salên 870'an de dest pê kiriye, heya bi 1070'an, du sed sal li hemû Rojhilata Navîn belav bûye.

Ji aliyê Hamdan Eş'as El-Karmat ve hatiye avakirin. ji ber wê yekê vê tevgerê wekî nav, ji avakerê xwe navê xwe girtiye. Hamdan El-Karmat bi xwe ji herêma Kufe ye.

Tevgera Karmatî, di serdema ku Ebasiyan temsîla şaristaniya navendî xistine destê xwe de derketiye holê. Heta bi serdema desthilatdariya Selçûqiyan li ser erdnîgarî û çanda Rojhilata Navîn bi bandor bûye. Hê di derketina xwe de li derveyê dewlet-îqtîdarê, wekî tevgereke komînî-demokratîk xwe bi rêxistin kiriye. Di serdemên xwe yên destpêkê de tenê di nava gundî û koleyan de tê ecibandin û xwe li vê zemînê bi rêxistin dike. Lê her ku tevger serkeftî bûye, her ku çûye li hemû Rojhilata Navîn, hemû beşên civakî yên ji derveyê dewlet-îqtîdarê di binyeya xwe de komî ser hev kiriye.

Jina ku di nava pergala dewletî de ti maneya hebûna wê tinebu û tenê dihate maneya xizmetê, di nava tevgera Karmatî de dubare rêzdarî û qîmeta xwe bi dest xistibû. Karmetiyan girîngiyeke taybet dane perwerdeya zarokan. Ji ber vê yekê, Daîyên ku di Karmatiyan de mamoste-pêşeng bûn perwerdeya zarokan girtine li ser xwe. Bi qasî em ji belgeyên dîrokî fêr dibin gelek Dayiyan zarokên ji çand û beşên cuda yên civakan komî cem xwe kirine û bi şiklekî pir baş ew perwerde kirine. Ev zarok di heman demê de paşê tevlî karûxebata aborî jî bûne.



Dîsa Karmatiyan di nava civakê de bi navê Mecalis el-Texziye, hin rûniştin-civînên ku gel tê de li ser mijarên cur bi cur nîqaş dikir, li dar dixistin; hewl didan ku li vê derê ji bo pirsgirêkên civakê bibin bersiv.

Karmatiyan ti ferq û cudahî nedixistin di navbera gel û bawerî û olan de. Di nava civakê de bi şiklê pêkhatetên mirov karibe jê re komîte bêje xwe bi rêxistin kirine. Her komîte yan jî yekeya di nava civakê de , ji sê kesên jê re Daî dihate gotin pêk dihat. Li gorî her qewm û olê zimanekî propagandayê bi kar dianîn. Her Daî jê berpirsiyar bû ku Yahûdî, Mecûsî, Sabî, Manîheîst yan jî çi kes dibe bila bibe, xwe bigihîne wan û wan qezenc bike. Li gorî kevneşopiyên civaka ku di nav de kar bike, hewce dikir tevbigeriya. Bi kurt û cewherî diviyabû her Daiyê ku biçûya nav etnîsîte, yan jî baweriyekê, sosyolojiya wê civakê baş bizaniya.

## Di Karmatiyan De Feraseta Aboriya Civakî

Karmatiyan di nava civakê de li gorî feraseta felse û mercên civakî ku xwe dispartinê, feraseteke aboriyê bi pêş dixistin. Tevgera Karmatî, piştî ku qenea dibe ku xwe gihandiye asteke rêxistinbûnê, li herêmên ku serwer e, ji gelan dixwaze ku alîkariyeke bi navê 'fitre' (1 dîrhem) bidin tevgerê. Ev alîkariya ku di wan serdeman de dihate komkirin zêdetir, ji bo pêşwazîkirina pêdiviyên tevgerê û kadrobûnê bû. Lê dema ku di asteke diyar de mercên civakî çêbûne û tevgerê xwe gihandiye asteke diyar a rêkûpêk, wekî şertekê didin pêş ku her kesek alîkariyeke bi qasî 1 dînarî (hîcret) bide. Ev jî li cihên ku tevgerê serweriya xwe çêdikir, ji bo sazîbûnê dihate xerckirin. Dar el-Hîcreya destpêkê karîbûye bi vî şiklî were avakirin. Piştî ku Dar el-Hîcre ava kirine jî, dest pêkê ji civakê xwestine ku ji pênc paran pareke mal û milk û cil û bergên xwe pêşkeşê vê hevpariya civakî (Dar el-Hîcre) bikin. Ev biryar, qonaxeke navberê ya derbasbûna pergala mal û milkê hevpar (şirîk) bû. Piştî demekê jî pergala ulfetê hatiye avakirin.

Di vê pergala aborî ya ulfetê de hemû mal û milk, li cihekî dihate komkirin û bi şiklekî hevpar û wekhev dihate bikaranîn. Bi vî şiklî di nava civakê de dawî li milkê taybet dihat. Hamdan ji her kesî re digot "wê pêwîstiya we bi mal û milkê li cem we nebe, ji ber ku hemû cîhan bibe ya we". Jixwe feraseta herî bingehîn ku taybetmendiya rêxistineke komînalbûnê dida tevgera Karmatiyan, ew bû ku dawî li mal û milkê taybet anîbûn û feraseta mal û milkê civakî çêkiribûn. Li cem her kesî ji bilî şûr, tîr û kevanê, ti tiştê taybet tinebû. Her kesî bi hev re kar dikir, berhemên dihatin bidestxistin, bi şiklekî hevpar û hevbeş dihate belavkirin. Hemû întiyac-hilberîn, çandin û çinîna erdan bi şiklê zibare (palûte) dihate kirin.

Tevgera Karmatî ne tenê ji bo civaka di serdema xwe xebitiye, ji bo civaka dema pêş jî plan-proje daniye; di vê derbarê de pêşengekî Yemenî yê Karmatiyan (Hesen Bîn Mansûr) perspektîfên li ser pêşerojê wisa aniye ziman: "Gava ku dema wê hat û Mehdî xwe nîşan da, wê şêr û xezal ji heman çemê, li cem hev avê vexwun, wê şivan pezê xwe teslîmî guran bike. Wê başî bikeve li şûna xirabiyê, înhîraf û jirêderketin wê xelas bibin, mezlûm bigihîje heqê xwe û wê mirov wekî roja ji dayik bûye, wekhev û azad bijî."

Bêguman tevgerên komînî ku mora xwe li dîrokê dane, ne bi van re sînordar in. Tevgerek Komînî ku di sedsala 15. Li dijî împaratoriya Osmanî li Anatoliyê bi pêş ketiye heye. Pêşengê vê tevgergera gelan a komînî Şêx Bedreddîn e. Şêx Bedreddîn bi yek hevokê nêrîna xwe ya felsefîk û jiyanê, wisa tîne ziman: "Ji bilî hinarokên yarê li her derê, di her tiştî de bi hev re..." Ev tevger jî, wekî piraniya tevgerên gel ên komînî yên wan serdeman, bi piranî di nava gundiyan de xwe bi rêxistin dike. Bi taybetî di herêma Ege û Akdenîz ku îro di nav sînorên Tirkiyeyê de ye ji her mezhebê ji her olê, gundiyan bi rêxistin dike.

Bi taybetî gundiyên Yahûdî xwediyê hebûneke diyar bûne. Ji ber feraseta komînî ya aligirên tevgera Şêx Beddredîn, ji alîgirên wî re bi Tirkî 'Ortakçılar' hatiye gotin. Îro, li herêma Akdeniz, girêdayî bajarê Muğlayê bi navê Ortaklar navçeyek heye. Di wan serdeman de yek ji navendên berxwedana Beddredîn e.

Vê tevgerê jî, jiyana komînal û hevpar esas girtiye; li gorî vê jiyan bi rêxistin kiriye. Heta dema ku pergala împaratoriyê ketiye xetereyê, artêşên Osmanî êrîşê wan kiriye hemû gundî bûne leşker û xwe parastine. Lê belê li pêşberê Osmanî ku wê demê hêzeke hegemonîk a mezin bûye, li pêşberê dekûdolabên wan bi ser neketine. Di şer de her du fermandarên Şêx hatine qetlkirin. Herî dawî Şêx dîl digirin û li bajarê Serez ê Balkanan îdam dikin. Wekî her berxwedana komînal dersên giranbiha ji vê jî gihaştina roja me ya îro.

## LI EWRÛPAYÊ TEVGERÊN KOMÎNÎ

Utopîstekî Komînalîst: Robert Owen
Sedsala 15. û 16. li Ewrûpayê wekî serdemên ronesansê tên zanîn. Di vê navberê de pirrengiyeke zanistî ya pir dewlemend bi pêş ketiye, zanyar û fîlozofên ji aliyê Marx ve wekî sosyalîstên ûtopîst tên bi navkirin ên wekî Campenella, Thomas more, derkerketine. Dîsa piştre jî utopîstên wekî Fourier, Rober Owen, Prodhon fikrên xwe teorîze kirine. Heta ji wan hin kesan hewl dane vê bikin pratîk, yanê hewl dane li gorî fikra xwe jiyaneke komînal ava bikin. Ji van ê herî bi nav û deng Robert Owen e. Xweseriya wî ew e ku hewl daye fikra xwe jiyanî bike. Ew bi xwe xwediyê fabrîka û sermaye bûye. Mal û milkê xwe di oxira fikra xwe de li karkerên xwe ku li fabrîkaya wî kar dikin, belav dike. Dixwaze bi şiklekî bi kontrol modeleke komînal a di fikra xwe de pratîze bike.

## Berxwedana Komînî ya Gundiyên Alman

Di vê serdemê de li bakurê Ewrûpayê û bi taybetî jî texrîben li Almanyaya îro, gundiyên bi Almanî diaxivîn, li dijî kîlîseya katolîk û derebegên xwediyê erd serî rakirine. Taybetmendiyeke bakurê Ewrûpayê ew bû ku hem civak ji jiyana hevpar a komînal a civaka xwezayî dûr neketibû, her wiha ne bi temamî pergala feodal rûniştibû û ne jî qural û qeîdeyên pir hişk ên kîlîseya katolîk rûniştibûn. Yanî giradaneke pir hişk a gundiyan bi şaristaniya navendî ya Ewrûpayê re tinebû. Di van mercan de gundiyên di mercên koletiyê û serfbûnê de dijiyan, bi daxwaza ku bibin xwediyê erd û azadiya xwe bidest bixin, serî rakiribûn. Lê belê pêşengiyeke wan a diyar, hêzeke wan a parastinê ya bi rêkûpêk tinebû. Dîsa ji pêşengiyeke hevgirtî bê par bûn. Li rojavayê başûr ê Almanya, li hin kantonên Swîsre û Awûstûryayê, sala 1524'an nêzîkî 300 000 gundî rabibû ser piyan, û bi armanca jiyana komînal berxwedanek dest pê kiribû. Şiyara sereke ya serhildanê "bila her tişt hevpar be" bû. Di encam de di navbera gundiyan û hêzên Almanyayê de şer dest pê kiribû.

Yek ji fermandarên gundiyan jî papazê bi navê Thomas Müntzer bû. Gundiyên komînalîst ji ber gelek zeyifiyan (wekî şerê parastinê) di sala 1525'an de bi bin ketin. Di encam de 100 000 gundî hate qetlkirin. Müntzer jî hate îdamkirin.

**Jina ku di nava pergala dewletî de ti maneya hebûna wê tinebu û tenê dihate maneya xizmetê, di nava tevgera Karmatî de dubare rêzdarî û qîmeta xwe bi dest xistibû. Karmetiyan girîngiyeke taybet dane perwerdeya zarokan.**

## Komîna Parîsê û Bandora Wê Li Ser Marksîzmê

Di sadsala 19. de Fransa ji ber ku dixwest bibe hêza hegemonîk a cîhanê, şer li dijî Rûsyayê îlan kiribû lê bi binketibû. Dema ku hêzên dewletî teslîm bibûn, hêzên teslîm nebibûn jî, bi armanca azadî û wekhevîyê, piştî bi sedan sal ji serhildana gundiyên Alman, di 1871'ê de qraltî tasfiye kirin û bi navê Komuna Parîsê komînek ava kirin. Lê karîbûn şeş mehan li beramberê şaristaniya navendî ya Ewrûpayê bisekinin. Li ser destkeft û serpêhatiyên vê komînê Marx û Engels xwe gihandin wê encamê ku wê karibin kêmasiyên Komîna Parîsê bi pergala dîktatoriya proletaryayê, yanî bi dewleta proletaryayê derbas bikin. Ev fikra xwe wekî dîktatorya proleteryayê teorîze jî kirine.

Şoreşa Cotmeh 1917'an

Li ser vê teoriya Marksîst di 1917'an de li Rûsyayê, şoreşa Bolşewîk pêk hat. Bolşewîkên Rûs, bi pêşengiya şoreşgerê mezin V. I. Lenîn bi teoriya Marksîst ku digot "em ê bi dewlet û dîktatoriya proletarya mirovahiyê bigihînin sosyalîzm, wekhevî û azadiyê" bingehên Yekîtiyên Sowyetan danî. Sowyet bi zimanê Rûsî tê maneyê meclis, komîna komînan. Di serî de xebatên aborî, piraniya jiyanê di bin navê Kolhozan (komîn) û hate bi rêxistinkirin. Di qonaxên cuda de polîtîkayên cuda yên aboriyê yên wekî NEP (Polîtîkayên Nû yên Ekononomiyê) hate bikaranîn. Ev şiklekî kapîtalîzmê bû ku bi destê dewleta Sowyetê dihate pêkanîn. Dîsa ji aliyê hişmendiyê ve civakê bi temamî şoreş yan jî guherînek çênekiribû. Pergala Sowyetê hewl da ku bi hişmendiya civakî ya berê, bi desthiladarî-dewleta proletaryayê jiyaneke komînal, wekhev û azad biafirîne. Ya hê rastir herî kêm niyeta pêşengên şoreşger ev bû. Ji ber ku mijara me zêdetir li ser naveroka xebatên komînî ye, em ê li ser sedemên din nesekinin. Mînak, bi taybetî ber bi dawiyê ve hemû xebata aborî girêdayî Partiya Komînîst a Sowyetê bû. Lê belê Partî bi xwe piraniya wê ne xwediyê jiyanek komînal bû, şiklekî kapîtalîzma dewletê dijiya. Her wiha Yekîtiya Sowyetên ku ji bo avakirina komînalîzmê bi rê ketibû, ji ber ku li şûna iyaneke komînal û azad, desthilatdarî-dewlet ava kiribû û bi hêzên şaristaniya navendî re ketibû pêşbirkê, di encam de piştî 70 salan di 1989'an de ew bi xwe jî bû hêzeke hegemonîk a şaristaniya navendî. Ya ku di kesayetiya Rûsya Sowyet de têk çûyîbû, ne cewhera jiyana komînî bû; berewajî, şiklekî kapîtalîzmê ku bi destê dewleta brukratîk a proleteryayê mezin bibû.



**Jina ku di nava pergala dewletî de ti maneya hebûna wê tinebu û tenê dihate maneya xizmetê, di nava tevgera Karmatî de dubare rêzdarî û qîmeta xwe bi dest xistibû. Karmetiyan girîngiyeke taybet dane perwerdeya zarokan.**





# Çeka Dij Komînê: Ez Eziti

# Gelo ferdperestî (ezezîtî) dikare di nava civaka komînal de hebe?
# Ferd, Civak, Neteweya Demokratîk



BERXWEDAN BOTAN

Dema ku em li ser mijara (em li ku ne ji kolektîvîzmê (civakbûyîn)) diaxivin? An jî (kolektîvîzmê (civakbûyîn) di nav me de li ku ye)? (Têkiliya ferd bi civakê re çawa ye?) Em xwe rû bi rû dibînin li beramberî kêşeyên ku di dirêjahiya demê de hene. Ronakbîr û fîlozofan çareyên baş ji bo van kêşeyan nedîtin. Gelek teorî derketin ku hewl didan li çareyan bigere ji van dubendiyên ku ji vê mijara bipirsgirêk û bêserûber derdikevin.

Ger em bixwazin bizanin ka di dîroka dirêj û navîn a dîroka mirovatiyê de çi hatiye serê me û em bi gelek arîşeyên re rû bi rû ne, yên ku me bi xwe afirandine û di jiyana me ya rojane de hene. Hin alozî çêbûne û roj bi roj mezintir dibin. Ya herî metirsîdar rawestandina naskirina hebûna xwe ya di nava civakê de ye, yan jî nezanîna me di danasîna xwe de ya di nava civakê de, mîna ku em ji hev qut bin (ango di navbera civak û ferd de). Em bi danasînên sivik re rû bi rû ne yên têkiliya di navbera ferd û civakê de ne. Her wiha asta kûrahiya di navbera mirov û civaka wî de heye, ji rastiya xwe dûr ketiye.

Di dirêjahiya dîrokê de, gelek teoriyên ku nirxekî bilind didin civakbûyînê derketine holê, piştre teoriyên ku nirxekî bilind didin ferd derketine holê û di encam de dûrketinekê di nava ferd û civakê de çêdike.

Teorî ber bi bicîkirina vê dûrketinê di jiyanê rastîn de ve çû û êdî nakokî jî veguherîn û bûn ceng û pevçûnên xwînî. Di vir de divê em rawestin û ji xwe bipirsin ka çi bûye? Çima em di nakokiyan de gihîştine vê asta dînbûnê? Çi li ser me ferz bûye? Pirsgirêk ji ku dest pê kir? Gelek pirs hewcedarî lêveger, lêkolîn û kûrahiyeke venasînî ne.

Eger ji nêz ve em li rewşa xwe ya îro dinêrin, em dibînin ku leza nakokiyan roj bi roj zêde dibe. Encama van nakokiyan qeyranan in, ev qeyran jî ziyanê ne tenê li mirov an beşek ji mirovan, lê li tevahî gerdûnê dikin. Dibe ku bandora wan piştî sedên salan xuya bikin, lê di vê qonaxê de leza xwe xurttir kirine. Gava ku em pêşketinên çêdibin wan analîz nekin û rast pênase nekin, dê ber bi karesatê ve biçin. Her kes vê yekê dibêje û mezinahiya karesata paşerojê dizane, lê ew di koka meselê de kûr nabin. Tu dibêjî qey çareserî li cihekî li ser gerstêreke din e. Ev yek me ji cewhewerê meselê dûr dixe. Çima? Ji ber ku em li pey danasînên ku bi rêya dezgehên ragihandinê re li ser her kesî ferz kirin ku her tiştî ji rastiya wê dûr dixin û rastiyên cihêreng, ji hev cuda û nakok nîşan bidin û kumpas bi wan winda dibe.

Em rojane nûçeyên talankirin, wêrankirin û îşkencekirinê dibihîzin, weke ku mirovên aniha pê kêf dikin û zû ji bîr dike. Ji ber ku ew bi awayên din li benda nûçeyên din dimîne û dîsa ji bîr dike û bi demê re hafizeya wî ya komî lawaz dibe. Êdî ew ji exlaq û polîtîka civakî dûr dikeve û di fezayekî bi valahiyê tijî ye de avjeniyê dike. Di gerînokeke vala ya jiyanê de li aramiyê digere, ya ku bi eslê xwe jê hatibû dizîn dema xwe danasîn dikir (ez bala xwe didim xwe tenê), êdî pirbûna (EZbûnê) li cîhekî bi xwe re pêşbazî û nakokiyê tîne ya jiyaneke neewle ye. Pergalên modernîst kesayetên dijberî hev di her tiştî de diafirîne û ev e ezezîtiya ku bi awayekî berfireh em pêrgî wê tên. Ew encama lîberalîzmê ye, ya ku got: Tu çi dikî tu serbest î. Di tu kesî de nefikire.Ew girêdayî desteserkirin û talanê (ne bi wateya xwe ya herî xirab) û belavkirina koletiya bidilxwazî di nav civakê de ye; ango koletiya kesayetiyê, koletiya madde û lîberalîzma ku ketiye jiyana civakbûyînê, herçiqas di nîqaşên xwe de peyva azadiyê bi kar tanî jî, lê cudahî zêde bûn û ezezîtî li dijî azadiyê zêde bû, weke ku xwehezkirin û ezezîtî ew azadiya rastîn a jiyanê ye û ew e ya ku ber bi demokrasiyê ve diçe û heta bikaranîna peyva demokrasiyê jî di nav kesên xweperest de pir dibe. Ji ber ku demokrasî ew e ya ku jê sûd bigire, ne demokrasiya rast û civakbûyîn e. Rêber Abdullah Ocalan vê xalê bi vî rengî rave dike:"Lîberalîzm bi xwe texrîbata bêgem a ferd li hemberî civakê îfade dike û serweriya yekdestdariyan li ser civakê, vê yekê piştrast dike. Ji ber avahiya xwe ya ne demokratîk û her cure ferdperestiyê, ji malbatê heta bi dewletê xwedî meyla dîktatoriyê ye. Ferdiyeta demokratîk cuda ye. Weke biryar û dengê hevpar ê civakê ferd li pêş digire. Ferd kengî vî deng û biryardariyê esas bigire li cem civakê nirx û hurmeta wî-wê hebe. Ji lewra ferdiyetperestiya lîberal a bi awayekî yekdestdariyên bê sînor û bê hejmar e, antî-demokratîk e.

Ti lafazanî û aloziya têgînan nikare vê xisleta lîberal an jî neolîberal biguherîne. Lîberalîzm weke gotin maneya wê azadbûn e, lê wê piştrast kiriye ku di pratîkê de ev jî ji pêşketina bêsînor a yekdestdariyan wêdetir nebiriye. Azadiya bi qasî ku xuya bike tê pêşkêşkirin, di pratîkê de bi awayekî di rejîmên firewnan de jî nehatiye dîtin qeyd û bendên îdeolojîk û maddî lê xistine.

Di civakekê de azadiya rastî kengî bi hêman û şaxên civakî were destekkirin hingê dikare manedar bibe. Eger azadiyên ferdî ji aliyê civakê ve neyên destekkirin, hingî yekdestdarî û însafa xwe, ew jî rewşeke bi ruhê azadiyê re li hev nake îfade dike. Jixwe pirsgirêkeke wekheviyê ya lîberalîzmê nîne."

Çawa ku em metirsiya ferdê bi demê re xwe ji civaka xwe dûr xistiye dibînin û niha bi perspektîfeke bêhêvîtiyê li civaka xwe dinêre. Êdî yên ku ferd aniye vê rewşê; ew rêjîmên bi wateya xwe ya desthilatdar cîhanê bi rê ve dibin, ferd jî ji demokrasiyê dûr dixe û demokrasiya civakê bi her awayî çelexwar dike, têgeha hemwelatiyê ya ku ji aliyê dewletan ve tê pêşxistin jî daveke ji bo ferdê azad bikevê, êdî berxwedana civakbûyînê di kesan de bişkînin û wan bi pêwindê hemwelatîbûnê girê bidin. Ev têkilî dikir ji bo dewletê veguherî damarê xwînê. Çimkû girêdana ferd bi pergala desthilatdarî ve di rêya çandina têgeha welat, welatîbûn û hemwelatîbûnê re tê çandin bi mebesta parastina berjewendiyên dewletê ye. Eger tu ziyanê bigihêjînê dewletê, nexwe tu ziyanê li hemwelatî û welat bixwe jî dikî. Di vir de dewlet vediguherî parêzvanê her tiştî di nêrîna civakê de ye. Pêwsît e nasname ji bo dewletê be û dewlet ew e ya ku nasnameyê dide. Hebûna nasnameyê jî tê wateya hebûna ferd di nava dewletê de ye. Bi vî rengî ferd bi dewletê ve û dewlet jî bi ferd ve tê girêdan.Li gorî têgehên pergalan; berfireh derketina pirsgirêka aîdiyetê tê wateya di mercên pergalên desthilatdar de çi dibe bila bibe.

Di vir de divê em zelal bikin ku ferdê di çarçoveya moderniteya kapîtalîst de dijî nikare di nava jiyaneke rast û dirust de bijî, ji ber ku ji rastiya xwezayî dûr dikeve. Êdî nabe ku em li jiyana wan binêrin ku ew jiyana li wateya jiyanê digere, ji ber dûrbûna wan ji rastiyê (heqîqetê) û dûrbûna mirov ji rastiyê bi domana demê re dibe sedema qutbûna wî ji civakêbûyînê ye.

Berevajî vê, dûrketina ji civakê jî dûrketina ji rastiyê ye û wek ku Rêbertî vê mijarê wiha rave dike: "Girîng e ku mirov bi awayekî sûbjektîf li têkiliya ferd û civakê nenêre. Ferdên di nav dîrokê de şikil girtine, beşdarî tevahiya qadên civakî dibin yên ku zimanekî xwe yê diyar û rêûresmên xwe hene û me ew qadên behskirî jimartibûn. Ne weke ku ew dixwazin û li gorî dilê xwe beşdar dibin, li gorî rêûresm û saziyên civakê berê û bi nazenînî amade kirine beşdar dibin. Ji civakîbûna ferd re hewldaneke mezin a hînbûnê divê. Ango kengî ferd çanda rabirdûyê ya civakê ji can û dil qebûl kir, wê demê dikare bibe endam û mensûbê wê. Ji bo mirov bibe civakî, timî hewcedarî bi hewldanekê heye. Her çalakiya civakî di heman demê de çalakiyeke civakbûnê ye. Ji lewra ferd, ne ku weke dixwazin, li gorî civak dixwaze ava dibin û nikarin xwe ji vê yekê xilas bikin. Ji ber ku civakên li mêtingerî û zordariyê vekirî bêguman civakên hîyarerşîk û çînî ne, daxwaza azadî û berxwedanê ya ferd jî wê her hebe. Ferd wê civakbûna bi koletiyê tê avakirin ti carî bi rizadilî qebûl neke. Dîsa wê qebûl neke ku bi civakên mêtinger, biyanî û cuda re bibe yek û wê li dijî asîmîlasyonê jî li ber xwe bide. Lê dîsa jî wê hewl bidin ferd di nava çerxên saziyên perwerdê û zordariyê yên civakê de bihelînin û heta tine bikin. Çerxên civakî wê mîna aş, bihêrin û li gorî xwe ji ar û hevîr amûran çêkin. Çi nakokiyên navbera saziyan, çi jî mirovê li ber xwe dide wê her tim di nav civakê de li gorî mêzînan li hev bikin û cihekî bigirin. Ne hêza civakê ya mutleq a helandinê heye, ne jî ferd şensê xwe heye bi tevahî ji civakê qut bibe."

Bi vê wateyê; em pêwendiya di nava ferd û civakê de ji dîroka kevin û heta roja îro pênase dikin ku ew pevgirêdayî û di nav hev de ye. Her wiha jiyana civakê bi awayê klan û bi naveroka xwe ya komînal ji me re zelal dike çawa mirovayetî di nava dijberî û nakokiyên derdiketin, pêş ketiye. Lê tevî wê; hin hilmên xwe yên azad parastine û ji xwe re li dergehekê digere û li dijî paşguhkirina xwe têkoşînê dike. Êdî komîn ew giyanê civakê ye, yê ku wê hevgirtî diparêze. Ji ber ku ev nexweşiyên êrişî giyanê civakê dikin; digel derketina lîberalîzmê re bêhtir bûne, mîna ezezîtiyê ya ku her tiştî wêran dike. Çimku cihê ezezîtî lê heye ew cihê ferdperestî, desthilatdarî û hemû ziyanên ku cûdakirin, dijminatî û nakokî bi xwe re çêdikin li wir heye. Ezezîtî di bedena civakê de dikole û nahêle di nava wê de hevgirtin çêbibe, ji ber ku ferdê xweperest hov e, weke ku Rêber Abdullah Ocalan pênase dike: "Di van rexneyan de mirov dikare bi hêsayî bibîne ku ferdperestî civakê mîna mişkekî dikeritîne. Zehmet nîne ku em tespît bikin; lîberalîzma kapîtalîzmê ji azadiya ferd wêdetir hunerê keritandina civakê ye ku çavkaniya xwe jî ji rêûresma çanda bazirganiyê digire."

**cihê ezezîtî lê heye ew cihê ferdperestî, desthilatdarî û hemû ziyanên ku cûdakirin, dijminatî û nakokî bi xwe re çêdikin li wir heye**



Di danasîna civak û civakbûyînê de gele şaştî û şaştêgihiştin heye, nemaza ku modernîteya kapîtalîzm danasînên rasteqîn dê nedinê. Ji vê yekê, divê em zanibin ku her em ji danasînên marjînal yên derbarê civakbûyîn û komînê de dûr bikevin, em ê zanibin ji bo ku em vegerin nav xwezayê û bi xweza û mirovahiyê re tevbigerin,divê pêşî em nexweşiya Modernîteya kapîtalîst belav dibe, bi dawî bikin, ya ku dihêle mirov ji rastiya xwe ya civakî dûr bikevin, her tiştê ku di dibistan û zanîngehên wê de fêr bûne binirxîne û hînên wê jî yên pir mezin bûne vegerin piçûk weke xwe.Divê em zanibin ku hemû dahênanên zanistî yan felsefî çi şênber û çi razber bin, ew berhemên mirovahiyê ne, yên ku van berheman desteser dikin, bi kar tîne û wan vediguherîne hêzekê li civakbûyînê dixe. Ev yek jî bû sedema agirpêketina cîhana em lê dijîn, xwebixwe ber bi tunekirinê ve diçe. Lewre nabe bi çavekî piçûk li pirsgirêka ferdê ji rastiya xwe ya civakî û komînal dûr ketiye, lê bê nêrîn, ji ber ku bi dûrketina ji rastiya xwe ya civakî, ew dûrî xwe, xweza, gerdûna di hundirê xwe de û azadiyê dikeve. Ezezîtî azadiyê dikuje û tune dike û bi vî awayî civakbûyînê dikuje û giyanê wê yê komînal hildiweşîne.

Ji bo vê jî divê em di meselê de kûr bibin û ji bo vegerê li ser rêya rast di jiyana civakî de çareseriyên herî guncaw bibînin û Rêber Abdullah Ocalan jî wiha rave dike:"lîberalîzma modernîteya kapîtalîst ferd û ferdiyet li ser hîmê dijberê civakê wer nepixandî ava kiriye û kiriye cinawir, di erd û ezmên de hilnayê. Bi rewşa heyî, ferdiyet ne bi tenê pê dewam nabe, pê jiyan jî nabe. Jiyana ferdî ya li cem ti cinsê zindiyan nayê dîtin û li her cure jirêderketinê vekiriye, ne hêza civakê ne jî hêza dinya me maye wê hilgire. Ev ferdîtî wisa ji rê derketiye, di bîstûçar saetên rojê de ji kuştina mirovan, kirina seks, spor û sinaetê, bidestxistina karê û meşandina êşkencê bêzar nabe. Eşkere ye ku dawiya vê ferdîtiyê, nexweşiyên weke kansêr û AIDS'ê ne, jixwe ew jî pirr bi lez zêde dibin. Rojên ji wan re mehşer tê gotin û pêxemberan pirr berê xeber ji wan dane vê dema ferdîtiyê îfade dikin.

Naxwe weke rêzgirtina me ji bo jiyanê, wezîfeya me ya yekemîn ew e, divê em zanista civakî ya bi jiyana civakî tê naskirin ava bikin, ya duyemîn jî divê em jiyana ferdî û sîstema li pişt wê rawestînin û şert e ku divê mirov van herduyan bike yek û gavê biavêje."

Zanistên civakî ku civakê danasîn dikin û nêzî pergala kapîtalîst û lîberal nabin, ya ku civakê hildiweşîne û kesayeta nearam ya di serdema teknolojiyê de dide xuya kirin. Ew kes di xeleka bêwateyî, xwelênegirtin û bêkesayet de digere. Êdî danasîna civaknasî girêdayî rewşa krîzê ya nêrîneke xweperest ji piraniya mijaran ve ye, ji ber ku ew jî di teşxîskirina mijaran de bi nexweşiya ezeziyê ketiye. Ev jî vedigere felsefeya pozîtîvîzmê di giştî zanistê de, û civaknasî dayik e. Civaknasî makezanist e, êdî çiqas civaknasî ji teşxîskirina takekesî ya mijaran dûr bikevin û her ku nêzî giyanê ferd û xwezayê bibin, em ewqasî nêzîktir dibin ku danasînên baştir ji civak û ferd re bidin.

**divê em zanibin ku her em ji danasînên marjînal yên derbarê civakbûyîn û komînê de dûr bikevin, em ê zanibin ji bo ku em vegerin nav xwezayê û bi xweza û mirovahiyê re tevbigerin, divê pêşî em nexweşiya Modernîteya kapîtalîst belav dibe, bi dawî bikin**



Tişta ku em di vê serdemê de dijîn ji ya berê ku komîn û klan hebûn cudatir e û her çendî cudahî û nakokî kevn bin jî, lê pir kêm bûn. Lê pêwîst e em bizanin ku civakbûyîn ne weke ku ev serdem ji me re tîne ziman, nemaze ji hêla kapîtalîzmê ve ya ku civakbûyînê ber bi tunebûnê ve dibe. Êdî her tiştî bêwate dike, jiyanê bêwate dike û jiyana di giyanê civakbûyînê de bêwate dike. Kapîtalîzma lîberal amûrên xwe bi hosteyî bi kar tîne û di encam de keskatiya erdê kiriye çola vala û sedema vê yekê jî avêtiye ser pişta xwezayê, weke ku ti sûcê wê tê de nîne. Eger em bixwazin di cîhaneke bê pêvçûn û nakokiyên ku kapîtalîzmê çêkirine, bijîn; pêwîst e heta ku em bikarin dûrî lîberalîzmê bikevin, êdî dûrî ferdê xweperest bikevin û di encam de vegerin rastiya civakê. Civaka ku ferd xwedî nirx û wate bû. Di heman demê de civak ji bo ferd jî xwedî nirx û kûrahiyeke giyanî bû. Hezkirina civakê hezkiria xwezayê ye, hezkirina gerdûnê û entegrasyon bi giyanê civakê re ye, ev yek komîn e ya ku rêya jiyanê şanî civakê dike bi entegrasyonekê di navbera ferd û civakê de ye.Zehmetiyên ku civakbûyînê zêde dibin, wek me li jor jî behs kir; dema ferd xwe li ser civakê ferz dike û ji civakê dûrketin e. Weke ku dûrketina ji civakê rê li ber azadiyê vedike! Ev jî bingeha civakê wêran dike.

Ji ber vê yekê, divê em ber bi danasînên zelaltir ve biçin ku ferdek xwe îzole dike û ji civaka xwe re xerîb dibe. Da ku em berê xwe bidin çareseriyên guncaw, divê em rabirdûyê bikolin û li heqîqetê bigerin a ku di dîroka xwe ya dirêj de hebûna mirovahiyê parastiye, taybetmendiya mirov a civakîbûyînê parastiye, rastiya xwevejînkirina ferd di yekitiya raman, axaftin û xebatê de. Her wiha hemû bawerî û felsefeyên ku ev tekamulî di mirov de ango ferdê ku digihîje rastiya xwe nîşan daye, di nava hevgirtina rewşenbîrî, felsefî û pratîkî ya civakê de ye. Çareserî di vê serdemê de Rêber Abdullah Ocalan di parêznameyên xwe de diyar kiriye. Ew jî meyla avakirina ferd di nava komînê de ye û komîn bingehê civakê ye.

Ferdê civakparêz cihê xwe li ser xakekê ku komîn lê hatiye avakirin dibîne û Rêber Apo bi nav kiriye Neteweya Demokratîk: “Neteweya demokratîk modeleke alternatîf e ku pê ferd û welatiyê azad pêk tê. Neteweya demokratîk li dijî netiştkirina civakê, civaka alternatîf e; li dijî civaka desthilatdarî û dewletê yan jî li dijî bêcivakbûnê civaka demokratîk e. Li dijî qedandina civakê ya her şêweyê kolekirin û newekheviyê pêk tê û pê didin qebûlkirinê, civaka gihiştiye hebûna azadî û wekheviyê ye. Dema ku mirov ji aliyê jiyana civakî ve neteweya demokratîk binirxîne, bi hêsanî mirov digihîje van pênaseyan. Ji bo jiyaneke têkûz û durist yek ji şertê sereke ew e, divê civakbûna neteweya demokratîk pêk bê. Civaka ku dewleta netewe ew qedandiye, ji nû ve wê bi ser wê ve tîne. Civaka bi tenduristî, ferdê bi tenduristî digihîne. Ferdê digihîje tenduristiya xwe ya zêhnî û derûnî li hemberî nexweşiyên fizîkî jî berxwedana wî bi hêz dibe û nexweşî kêm dibin. Têgihiştina li perwerdeyê ya neteweya demokratîk bi sedema ku armanca xwe civakbûn û ferd-welatiyê azad e, diyalektîka pêşketinê ya ferd bi civakê re û civakê bi ferdre ji nû ve tê danîn. Rola zanistan a mirovan civakî, azad û wekhev dike ji nû ve derdikeve holê. Neteweya demokratîk netewebûyîna civaka der barê hebûna xwe de rast serwextbûyî ye.”

Weke encam ji van xalên ku me behs kirin ev e ku ferdê ji civakê qutbûyî tune ye. Heke hebe jî, ew li ser bîrdanka civakbûyîna xwe ya hilweşiyayî, an jî ya ku ji hêla rejîman ve hatiye hilweşandin. Ti civak tune bêyî ku ferdê azad hebe. Ferdê azad rastiya civakbûyînê ye û ev ferd rengê xwe bi awayekî zelal di pergala Neteweya Demokratîk de nîşan dide. Pergala Neteweya Demokratîk xwe dispêre giyanê ferd ê ku li jiyana hevbeş digere. Di pergala Neteweya Demokratîk de ferd li rastiya xwe ya civakbûyînê û bi rastiya xwe ya civakbûyînê entegra dibe û dizane çawa bi kesên din re di ahengeke teorîk, pratîk, zanîn, hunerî û felsefî de bijî û Rêber Apo dizane çawa ferdê şaristaniya demokratîk nêzîkatiya jiyanê dike:

“Ferdê şaristaniya demokratîk bi qasî ku li dijî sê suwarên mehşerî yên modernîteya kapîtalîst (kapîtalîzm, îndustriyalîzm û dewleta netewe) timî têkoşîneke bi hev re ya fikir-zikir-çalakiyê bimeşîne, divê timî bi sê melekên rizgariyê yên modernîteya demokratîk (civaka ekonomîk, civaka ekolojîk û civaka demokratîk) têkoşîneke jiyanê ya bi hev re ya fikir-zikir-çalakiyê di kesayeta xwe de bike, naxwe nikare xwe pêk bîne, nikare xwe weke pêşengê heqîqetê çêke. Bi qasî komika akademiyayê, di yekîneyên komin ên civakî de jiyan û têkoşînê bi hev re nemeşîne, nikare bibe pêşengê (murşîdê) bicihanîna cîhana dad, azadî û demokrasiyê. (Wexta ku weke amûrên şaristaniya serwer û modernîteyê bêne bi kar anîn) Rexnekirina Pirtûkên Pîroz û hozanên xwedawend giranbuha ye. Jixwe yên ji ber mayî, mîrateya me ya jiyanê ne, nasnameya me ya civakî ne. Milîtana/ê heqîqetê ya/ê serdema demokratîk ew kes e, vê nasnameyê li şexsiyeta xwe diniqirîne, dikole, mîrateya jiyanê bi awayekî azad dijî û dide jiyîn ango pêk tîne û dide kirin.”



# Di Hevpeymana Civakî de Rêxistina Komînê



SÎNAN CUDÎ

Hevpeymana Civakî belgeya bingehîn e ku tê de mafên bingehîn, rêgezên rêveberiyê û sîstema gelên ku li Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê dijîn hatine diyarkirin. Peymana ku di civîna asayî ya 91'emîn a Meclîsa Gel a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku di 12'ê Mijdara 2023'an de hat lidarxistin de hat qebûlkirin, ji çar sernavên sereke û 134 madeyan pêk tê.

Di beşa sêyem a Peymana Civakî de sîstema civakî tê şîrovekirin û tê de pênase û xebatên komun û meclîsan jî cih digre. Di xala 74'an a vê beşê de modela rêxistinî û taybetiyên vê pergala civakî wiha tê gotin;

*"Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku sîstema jiyana civakî ya azad û demokratîk a gelan û civakan e; Bi rêxistinbûna konfederal a demokratîk a komun, meclîs, akademî, kooperatîf, yekeyên aboriya civakî û rêxistinên civakî yên demokratîk ku pergala civakî ya demokratîk temam dikin, hatiye avakirin."*

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku xwe weke pêkhateyeke Konfederalîzma Demokratîk bi nav dike, di vê peymanê de têgeha "komûn"ê weke bingeha rêxistinbûna civakî bi kar tîne. Weke ku di gotarên berê yên belgeyê de jî hatiye rêzkirin, Rêveberiya Xweser sîstemeke rêveberiya nenavendî ye ku îrade û destpêşxeriya gelê herêmê weke prensîba bingehîn destnîşan dike. Di vê wateyê de dema ku dikeve nav pênaseya vê Pergala Civakî ya ku xwecihî tê de esas e, yekem car di xala 75. de Komunê pênase dike.

**Di vê xalê de komûn bi vê şeklî tê pênasekirin;**

*"Di rêveberiya xweseriya demokratîk de yekîneya herî biçûk e. Ew rêxistinên esas û bingehîn ên demokrasiya rasterast in. Ew qada jiyanê ye ku civaka exlaqî û polîtîk lê tê avakirin û teşekirin. Hêza ku çand û jiyana civakî lê tê hilberandin e û çareseriya herêmî ya pirsgirêkên civakî ye. Ew saziyên bingehîn ên biryargirtin û rêvebirinê ne. Di hemû pêvajoyên biryargirtinê de weke meclîs kar dike. Hemû qadên jiyanê bi awaye komunan tê birêxistinkirin."*

**Îcar divê em vê pênaseyê çawa şîrove bikin?**

Li gorî têgihiştina Rêveberiya Xweser ji demokrasiyê, kes û civak li gorî taybetiya erdnîgariya xwe biryarên ku wan eleqedar dike bi xwe digrin. Bi gotineke din, li şûna hikûmeteke ku desthilatdariya navendî tê de diyar dibe, modelek e ku prensîba xwerêveberiya gel tê de jiyanî dibe ye. Rêber Apo, di binavkirina modela rêveberiyê ya "civakên nedewletî" de cudahiya xwe ji pênaseyên klasîk ên demokrasiyê tîne ziman. Bi gotineke din, ew dibêje ku ew modela rêvebirina civakên ku di prensîbê de desthilatdarî û navendîparêziyê armanc nakin.

Ev yekîneya îdarî ya ku bi feraseta demokrasiya rasterast, radîkal û beşdar tevdigere, xwedî têgihiştina polîtîkayê ye ku hemû biryarên têkildarî jiyana civakî dide û biryarên ku dide jî pêk tîne. Ev şêwaza xebatê bê şik, şêwazeke xebatê ya meclisê dixwaze ku ji têgihiştina berê ya serok û rêveberiyên herêmî yên saziyên navendî wêdetir e. Yanî her komunek di warê kar û xebata xwe de wek meclîsekê dixebite. Welatiyên li qadên komunan dijîn jî endamên vê meclîsê ne.

Di heman demê de komun weke qada jiyanê ya ku “civaka exlaqî û polîtîk” lê ava dibe û pêşdikeve tê pênasekirin. Di vê wateyê de ji bilî yekîneyeke rêveberiyê, cihê ku jiyana nû lê tê hilberandin û tê avakirin e jî. Li dijî zîhniyetên zayendperest, neteweperest, olperest û zanistperest ên ku modernîteya kapîtalîst ji bo şekildana civakan bi kar tîne ye. Dixwaze projeya jiyana azad a li ser perspektîfa ekolojîk a ku bi hawîrdor û xwezayê re tevdigere û azadiya jinê ku demokrasî weke nirxeke bingehîn tê qebûlkirin, bidomîne. Di vê wateyê de tê gotin ku komun dibistanên ku zihniyeta sîstema konfederalîzma demokratîk lê tê fêrkirin û bi perwerde û nîqaşan tê meşandin e.

Di xala 31. a Peymana Civakî de bal tê kişandin ser rola komunê ya di têkiliya ferd-civak de. “Welatiyê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk kesayetek azad e, xwedî nirxên siyasî yên exlaqî û xwedî nasnameyeke piralî ye. Her kes dibe endamê komunekê. Maf û erkên welatîbûnê bi qanûnekê tên tertîb kirin.”
Wek ku ji gotarê tê fêmkirin, her kes endamê komunekê ye û ev endametî wekî maf û erkên hemwelatîbûnê tê tertîb kirin. Di komunên ku rêxistinên bingehîn ên demokrasiya rasterast in, yekitiya herî guncaw a têkiliya ferd-civak esas tê girtin. Di nava vê pêkhateyê de hemû biryar bi awayekî komî têne girtin û bicihanîn.

Her wiha di xalên 44 û 45’an ên peymana civakî de jî hatiye destnîşankirin ku komun û rêxistinên din ên civakî xwedî mafê xwe rêxistinkirin û îfadeya azad in. Ev yek rê vedike ku her kes û civak bibe beşek ji sîstemeke ku mafê parastin û pêşxistina nasname û nirxên xwe nas dike. Bi gotineke din, komun ne tenê modela rêveberiyê, di heman demê de modela rêxistinê ye jî. Û ev azadiya rêxistinbûnê ji her kesî re tê dayîn. Tê diyarkirin ku li gorî berjewendî û taybetiya civakê di gelek qadên wekî pîşeyî, hunerî, çandî, aborî, werzîşî û hwd de komun dikarin bên avakirin.





Em werin li ser mijara komun çawa ava dibin û dixebitin!

Xala 76'an a peymanê çawaniya avabûna komunan û sîstema hilbijartinê wiha dide diyarkirin;

1- Komun; Komunek ji malbatên ku li erdnîgariyek diyarkirî dijîn pêk tê.

2- Her welatiyekî endamê komunê ye.

3- Her komîn hevserok û komîteyên xwe hildibijêre. Ger erkên xwe pêk neynin, bêyî ku li benda hilbijartinên giştî bin, hilbijartinek nû dikare were kirin.

4- Li ser bingeha demokrasiya rasterast hatiye avakirin.

Pêwîstiya her welatiyekî ku endamê komunê ye û divê komun bi prensîba demokrasiya rasterast were birêvebirin, axaftinek e ku kesan teşwîq dike ku di jiyana civakî de rolek aktîf bigirin. Tê destnîşan kirin ku ev ferzkirin li şûna ferdê çanda kapîtalîst a ku ji geşedanên di hemû qadên jiyanê de bê haydar e û bi ferdperestiyê zerarê dide pêkhateya civakî û exlaqê, di avakirina ferdekî azad de erkeke exlaqî ye.

Di têkoşîna li dijî zayendperestiya civakî de girîngiya pergala hevserokatiyê tê zanîn. Şoreşa Rojava ya ku jê re şoreşa jinê tê binavkirin, bi xurtî ev prensîb hembêz kiriye û rêveberiya xweser a ku ava kiriye, ji rêxistinbûyîn û rêveberiya bingehîn destpê dike, di her qonaxê de vê rêgezê (mibdeyê) bi cih tîne. Di vê wateyê de komun li gorî pergala hevserokatiyê ya ku ji jin û mêr ên xwedî heman desthilatdarî û bandorê ne pêk tê.

Di rêveberiya komunan de pergala hevserokatiyê tê sepandin û ji aliyê endamên komînan ve têne hilbijartin. Hevserok an jî endamên komîteyên ku nikarin peywira xwe pêk bînin, bêyî ku li benda hilbijartinên giştî bin ji nû ve bên hilbijartin. Ev pêvajo piştgirî dide nêzîkatiya rêveberiyê ya li ser bingeha demokrasiya rasterast a li komunan. Bi gotineke din, wekî şêwazên asayî yên desthilatdarî û rêvebirinê ti pêwîstî û neçarîya demê tune. Ger rêveberîyeke bersivê nede pêdiviyên civakê, rayeyaya xwe ji bo berjewendiyên xwe yên takekesî bi kar bîne û weke hêzek li dijî gel bikar bîne, ew civak dikare di civîna xwe ya yekem de vê yekê bîne rojevê û ew kes ji wezîfeyê were dûrxistin.

Helbet wek rêbaz dikare kiryarên ne têrker ên rêveberîyê jî rexne bike û jê bixwaze ku di van mijaran de xwe rast bike. Bi gotineke din, di kêmasiyeke herî biçûk de, li şûna ku mirov ji kar dûr bixe, dikare şansê rastkirina xwe jî bide. Di vir de ya girîng ew e ku; ew civak bi rêveberiyê razî ye yan na? Di vî warî de peymana civakî derfetê dide hemû endamên komunê ku çavdêriya rêveberiyê bikin û dema pêwîst be wê ji kar bigrin û yekî nû hilbijêrin.

Peymana civakî ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, komînan ne tenê weke yekeyên rêveberiyê, di heman demê de weke kevirên bingehîn ên jiyana civakî û demokrasiyê pênase dike. Komun wekî qadên herî bingehîn ên pêkanîna demokrasiya rasterast, rê dide kes û civak ku çarenûsa xwe diyar bikin û nasnameya xwe ya çandî biparêzin û pêş bixin. Di vê çerçoveyê de komun ne tenê rengekî rêveberiyê ne, di heman demê de pêkhateyên ku di avakirina jiyana civakî de rolek girîng dilîzin jî.

**Di xala 31. a Peymana Civakî de bal tê kişandin ser rola komunê ya di têkiliya ferd-civak de. "Welatiyê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk kesayetek azad e, xwedî nirxên siyasî yên exlaqî û xwedî nasnameyeke piralî ye.**

# Çarçoveya Xebatên Komîn û Komîteyên Wê?

CEFER AMED





Wekî ku di hemû pêkhatinên hebûnan de bûye, civak jî ji dualîteye enerjî-made, ruh-beden (laş), mane-avanî çêdibe. Pêkhatin, hem ruh e û hem jî beden e. Di heman demê de hem avanî û hem jî mane ye. Di roja me ya îro de tê maneya bihevrebûna yên ku hişmendiya hevbeş a neteweya demokratîk parve dikin. Pêwîst e bibedenbûn jî li gorî ruhê neteweya demokratîk çêbibe. Di paradigmaya me de navê vê pergala rêxistinî, konfederalîzma demokratîk e.

Di pergala konfederal demokratîk de her kes dikare tevlî van mekanîzmayên ku fikra xwe tîne ziman, biryaran digire û rasterast tevlîbûna xwe nîşan dide, bibe. Ev, wekî ku Rêbertiya me dest nîşan dike, tê maneya ku “tenê yek kesê jî bê rêxistinî nemîne”.

Di vê pergala konfederal a demokratîk de avanîbûn an jî sazîbûna herî biçûk, komîn e. Di rêxistinbûna konfederal demokratîk de yekeya esasî ya demokrasiya rasterast, komîn e.

Modela herêmî-xwecihî ya rêxistinbûnê ye ku ji yekbûna civatên li komîn, tax, kolan û gundan dijîn pêk hatî ye. Ev rêxistinbûnên ku bi navê komîn tên zanîn, li ser esasê pêdiviyên ku li herêman hene xwe bi rêxistin dike. Pêdiviyên mijara gotinê, rehendên civakî digirin nava xwe. Divê her komîn li ser esasê rehendan karibe pêdiviyên xwe pêşwazî bike. Ji ber ku komîn xwediyê wê selahiyetê ne ku dikarin ji herî binî ve biryaran bigirin; lewra divê dema ku xwe bi rêxistin dikin hesabê rehendan bikin.

Bi rêxistinbûna komînê, ji vê armanc û felsefeyê bi rê dikeve. Dema ku komîn tê bi rêxistinkirin, takekesê/a ku li cihekî dijî, pêwîst e herî kêm di nava xebata yek komînê de cihê xwe bigire. Li gorî pêdivî û rewşên ku li wî cihî hene, takekes dikare ji yekê zêdetir di nava xebata komînan de cihê xwe bigire.
Komîn, di mijarên siyasî, civakî, aborî, çandî, parastina cewherî û hwd. ên bi jiyana civakî û pirsgirêkên civakî re eleqadar, li ser esasê hêza cewherî û têra xwe bi xwe kirinê xwe bi rêxistin dike. Ev bi rêxistinbûn bi şiklê tax, kolan, gund, yekeyên xebatê, akademî û kooperatîfan dibe.



**Di maneya rêveberiyê de berpirsiyariyên giştî yên komînê**

Armanca komînê ew e ku refaha ekonomîk û teknolojîk bixe xizmeta civakê, hişmendî û exlaqê ku demokrasi û azadiyê esas digire bi pêş bixe. Hatiye fêmkirin ku pêşketina ku tê de azadî û demokrasî tine û tenê bi refaha civakî re girêdaye zêde ne xwediyê maneye. Ji ber vê yekê pêwîst e komîn tenê bi çareseriya pirsgirêkên aborî û berhemdariya aborî ve neyê bidestgirtin. Divê komîn wekî cihê jiyana hevpar, demokrasiyê û xwe rêvebirinê were dîtin.

"Dersê ku ji vê derê were derxistin ê destpêkê ev e: komîn ne tenê yekeyeke aborîyê ye û divê wisa nebe jî.

Pêwîst e ji derveyê cihê xwarin û vexwarinê, maneyeke pir cuda li komînê were barkirin. Ji van maneyan a destpêkê ew e ku komîn saziyek e ku xwe dispêre yekîtiya dildar. Ya duyemîn, komîn dibistana civakê ya demokrasiya rasterast û xwe rêvebirinê ye. Ya sêyemîn, qada azadiyê ye ku takekes tê de maneya xwe dibîne û armancên xwe pêk tîne. Ya çaremîn, ocaxeke wisa ye ku tê de humanîzm, edalet û exlaqa mirov pêk tê û mezin dibe. Ya pêncemîn, qada jiyana azad û wekhev û hezkirinê ye ku tê de wekheviya jin û mêr pêk tê, jin ji metabûnê derdikeve. Bi kurtasî modeleke rexistinbûnê ya civakî ya ji derveyê dewletê ya wisa ye ku di civakê de çiqas taybetmendiyên erênî yên wekî bi hevrebûna bi azadî, wekhevî, hevkarî û lihevparvekirinê esas digirin hebin, di nava xwe de dihewîne û digihîne asteke afirîner."

Di nivîsên pêşî yên kovarê de ji xwe wate û girîngiya komînê baş hatiye zelal kirin. Heta girêdana komînan bi rehendan jî ji aliyê pergal û zêhnî ve hatiye şirovekirin. Lewma emê di vê nivîsê de hewlbidin şewaze karkirina komîn û komîteyên wê bi we xwîneran re par ve bikin.

## Rêveberîyê Çawa Kar Dike?

Di hevpeymana civakî û qanûnên girêdayî wê de ji bo rêveberî û avahîya komîne pênaseyên pirr berfireh heye. Her du hevserokên hilbijartî û berdevkên komîteyan dibin rêveberîyê komîne. Du hevserok karûxebata komînê koordîne dikin û berpirsiriya wan ew e ku edaleta civakî pêk bînin. Her du hevserok ji aliyê endamên komînê ve tên hilbijartin. Dîsa berpirsiyarên komîteyan jî di hilbijartinê komînê de erk digirin. Tevî hevserok berpirsiyariyên komîte jî di heman demê de di asta rêveberiyê de cihê xwe digirin.


Ev rêveberî mehê carekê civîna giştî ya komînê li dardixin. Her hefte carekê jî tevî her du hevserokan kesên di nava komîteyê de cihê xwe digirin tekmîla xwe digirin. Ji bo ku karibe civîna mehane ya komînê were lidarxistin, divê endamên komînê bi giştî amade bin. Ger cih û derfetê hemû endaman pêşvazî neke, wê çaxê ji her malekî komînê divê herî kêm du yan sê endam tevlî civînê bibin.

Hevserokên komînê, berdevkên komîteyan an 10 endamên komîne dikarin derbarê mijarên bên niqaşkirin de nêrîn û pêşnîyarên xwe pêşkeşî civînê dikin. Hevserok û rêveberî van mijarên niqaşê li gorî girîngiyê wan dike rêzê de û her mijarê bi ziravî niqaş dikin. Di civînê de xebatên meha derbasbûyî tên nirxandin. Ji bo ev nirxandin baş bê kirin destpêke civînê de bîryarê civînê meha derbasbûyî tê xwendin da ku bizanibin ka vê mehê de çi hatiye pêkanîn û çi nehatiye pêk anîn. Bi vê şeklî hemû endamên tevlî civînê dibin, derbarê xebatên komînê de agahdar dibin û dikarin baştir binirxînin.

Di civînê de piştî nirxandina giştî ya xebata mehekê û tekmîla komîteyên girêdayî bi komînê ve, li ser xebatên hatine meşandin nirxandin û nêrîn tên diyarkirin, piştî nîqaşên giştî biryar tên wergirtin û beşa plansaziyê dest pê dike. Piştî ku rapora plansaziyê tê derxistin, her du hevserok tevî rapora xwe beşdarî civîna meclîsê dibin. Ev, di bajaran de dibe meclîsên taxan û di beldeyan de jî meclîsê beldeyan in.

Ji ber ku li gorî hevpeymana civakî ya nû raye û berpirsiyarîya komînan hatiye zêdekirin gelek erk dikeve li ser milên wan. Lewma tê xwestin ku hemû pirsgirêkên civakê di komînan de bê çareserkirin. Ger hêza komînê ji bo çareserkirina pirsgirêkan têre neke, hingî di raporên xwe de sazî û dezgehên eleqedar ango meclîsên taxan û beldeyan re daxwaz û pêşnîyarên xwe datînin û ji wan alîkarîyê dixwazin.

Hevserokên komînan ji bo du salan tên hilbijartin. Hevserok tenê dikarin du qonax an deman xwe berendam nîşan bidin. Yanî hevserokên heta hetayî nayin erkdar kirin. Di heman demê de endamên komînhe xwediyê wî mafî ne ku dema hevserok karên xwe baş nemeşînin û giştî avahîya komîne ji wan ne razî bin dikarin di civînekî asayî yan awarte de bixin rojevê û wan ji erkê bigrin. Heman tişt ji bo berdevkên komîteyan jî derbasdar e. Ger pêşnîyarê bi vê şeklî neyê kirin jî divê rêveberîyê komînê 6 mehan carekî ji avahîya komînê bipirsin ka ji rêveberî razî ne yan na? Ger di vê civînê 6 mehan de endamên komînê erêkirinê bidin ew rêveberî erkên xwe berdewam dikin.




## Gelo Komînên Gund û Bajaran Ji Hev Cuda ne?

Di navbera komînên gund û bajaran de ferqûcudahiyên cidî tine ye. Ruxmî ku cewher yek e lê ji ber ku gund cihekî teng ê bicihbûnê ye, ji aliyê yekbûyiyên komîte û komîteyên demkî yên ji bo xweserê gund hatine çêkirin ve ferqûcudahî hene. Ji ber ku bi piranî hejmara malbatên li gund kêmtir e, hema bêje her kesê li gund dijî wekî ku endamê/a xwezayî yê komîteyan tê hesibandin. Eger malbatên li gund kêm bin, hin caran dikare ji yekbûna du yan jî zêdetir gundan jî xebatên komînan bên meşandin.



Li gorî qanûnên rayeya komîn û meclîsan, di nava komînê de divê 15 komîte hebin. Her yek ji van komîteyan jî li gorî rehendên netewa demokratîk û xebat û sîstemên bingehîn pêk tên. Bi gotinekî din, her komîteyê komînê bi rehendekî ve girêdayî karên xwe dimeşîne. Ji ber ku di komînên gundan de şenî kêm in, dibê ku hîn komîte baş neyê bi rêxistin kirin. Lê tê hedefkirin ku di hemû komînên gund û bajaran de van komîteyan hemû hebin. Endamê komîteyan aliyê hejmarê de kêm bin jî divê bên sazkirin û karên xwe bimeşînin. Bêguman bi alîkarîya rehendan.



**Komîteyên Komînê û Tekîlîyê Wan Bi Rehendan re**

Di hevpeyman û qanûnên rêveberîyê de rehend çi ye û erkên wan çi ne bi berfirehî hatiye pênasekirin. Rehend, “deste” an li gor gotina hinekan “wezaret” nîne. Rehend, derbarê qadekî jîyanê de çi rêxistin û sazî hebe digre nava xwe de û wekê meclîsekî xwe bi rêxistin dikin.

Bêguman deste jî tê de ye bes ne tenê ji desteyan pêk tên. Mînak; Meclîsa Rehenda Perwerde: ji Desteya Perwerde û Fêrkirinê, Yekîtîyê Mamostayan, Zanîngeh, Sazîya Zimanê Kurdî, Sazîya Minhacan, Meclîsê Xwendekaran, Meclîsê Malbatan û sazîyên di mijara perwerdehîyê de kar dikin. Ên sîstema kevin a perwerdeyê dizanin dikarin bişîbinin bi sîstema KPC jî. Lê ji wê jî berfirehtir e. Bîryar û polîtîkayên stratejik û plansazîyên dem dirêj û pêkanîn hemû ji aliyê vê meclîsê ve bê bi rêvebirin. Deste ranabe, sazîyên din jî xweserîya xwe winda nakin. Tenê hewl tê dayin ku hemû kes û sazîyên eleqedarê qadekî jiyanê ne bi hev re rûnin, niqaş bikin û kar bimeşînin.

Dema erkê van meclîsê rehendan tê destnîşankirin tê gotin; ji komînan heta herêma bakur û rojhilatê sûrî de xwe rêxistin dikin. Yanî komîteyên komînan di heman demê de dibin komîteyê rehendan. Rêxistinkirin û pêşxistina van komîteyan erkekî girîng a rehendan e.

Werin em bi hev re naverok û karên van komîteyan meyzînin;

*Şoreş û jîyana azad bi saya xwîn û keda şehîdan hatiya avakirin. Hema hema nivî civakê me ji malbatên şehîd û esîrên şer pêk tên.*





**1- Komîteya Perwerde**




Civak, bi rêya perwerdeyê tecrûbeyên xwe yên teorîk û yên pratîkî vediguhezîne endamên xwe, bi vî şiklî takekes, ciwan û zarokan perwerde dike, hewl dide pêşeroja xwe amade bike. Bi vî awayî di dema pêş de ji bo ku tevlî civakê bibe amadekarî tê kirin. Di encamê de civakîbûna zarok û ciwanan bi rêya perwerdeyê tê bicihanîn.

Komîteya perwerdeyê ya li komînê, vê tecrûbeya teorîk û pratîk ku her kesî bi perwerdeya bi zimanê dayika xwe dîtiye qezenc kiriye, dixe xizmeta gelê li komînê. Rêgeza ku “zanîn-agahî ji bo feydeya civakê” ye, jixwe re esas digire û xizmeta civakîbûn û feydeya civakî dike. Hemû ciwan û zarokên li komînê, di saziyên girêdayî bi komînê de bi zimanê xwe yê dayikê dîrok, çanda xwe fêr dibin û bi vî şiklî tevlî pêvajoya hebûna civaka xwe dibin.




Komîteya Perwerdeyê ji bo pêşxistin û belavkirina perwerdeyê di nava komînan de misoger dike. Xebatên bi armanca zêdekirina rêjeya xwendin û nivîsandinê di civakê de, bi taybetî jî perwerdeya bi zimanê dayikê, dike. Perwerdekirina bi hişmendiya neteweya demokratîk bi taybetî ji bo zarok û ciwanan di nava xebatên vê komîteyê de ye. Pêkanîna lêçûnên dibistanê yên zarokên feqîr û sêwî, çareserkirina pirsgirêkên di dibistanan de tên jiyîn û peydakirina derfetên wekhev ên jinan di perwerdeyê de, ji erkên vê komîteyê ne.



Ev komîte ji bo peydakirina pêdiviyên jiyanî yên mamosteyan, hevkariya di navbera xwendekar, malbat û dibistanê de xurt dike û ji bo çareserkirina pirsgirêkên perwerdeyê civînan li dar dixe. Her wiha berpirsyariya pêkanîna perwerdehiya mecbûrî ya neh salan ku di çarçoveya peymana civakî de ye jî bi cih tîne.

**2. Komîteya Çand û Ronakbirîyê**

Komîteya Çand û Ronakbirîyê armanc dike ku çandên gelan biparêze û pêş bixe. Li ser esasê paradîgmaya demokratîk, ekolojîk û azadîxwazîyê jinê xebatê fikrî û çandî dimeşîne. Li herêmên me gelek pêkhate, bawerî û ziman heye. Û em bi giştî jîyana herêma bakur û rojhilata sûrîyê wekî herêmekî pirrçandî û pirrzimanî pênase dikin. Parastin û pêşxistina van erkê esasî ya civakê ye. Nirxên demokratîk û komînal, nirxên bingehîn ên civakên me ne. Lewma karê bingehîn a vê komîteyê jî di vê çarçoveyê de tê pênasekirin.



Dervayî perwerdeyên di dibistanan de tê dayin, bi awayekî giştî perwerdekirina civakê ji vê komîte tê xwestin. Akademîyên civaka demokratîk û dewreyên perwerdeyên ku ji bo civakê pêwist e rêxistin dike û dimeşîne. Ji bo bilindkirina rêjeya xwendin û nivîsandinê dewreyên taybet vedike û dimeşîne. Ji bo manewîyatê civakê bilind bike û çîrok û çanda gelan belav bike bi xebatên edebî re mijûl dibe. Dîsa di çarçoveya komînê de xebatên hûnerî û çandî pêş dixe û komên mûzîk, wêne, govend, şano, edebîyat û sînemayê çêdike û di vê çarçoveyê de çalakîyan rêxistin dike. Van koman teşwîq dike da ku tev li xebat û şahî û festîvalên giştî bibe. Ev komîte di heman demê de ji bo parastina şûnvaran jî xwedî berpirsiyarî ye.





### 3. Komîteya Malbatên Şehîd û Girtîyan û Gazîyan

Şoreş û jîyana azad bi saya xwîn û keda şehîdan hatiya avakirin. Hema hema nivî civakê me ji malbatên şehîd û esîrên şer pêk tên. Dîsa bi deh hezaran gazîyên şer çêbûne ku em wan wekê şehîdên sax pênas dikin. Şehîd, gazî û esîrên şer nirxên bingehîn ên şoreşê ne. Ev komîte li ser esasê girêdana hêvî û xeyelên şehîdan malbatên şehîdan û bi giştî civakê perwerde bike, rêxistin bike û xwedî li wan derkeve. Di alîyê perwerde, fêrbûn û fêrkirin, debar û tendûristî de û ji bo pêwistiyên wan ên madî û manewî alîkar dibe û ji bo van pêşvazî bike xebatên xwe rêxistin dike.



Dîsa projeyên taybet ji bo zarokên şehîd û esîr û gazîyan pêş dixe. Ji bo ku van zarokan bi nirxên şehîdan rabin û bibin bingeha pêşerojê civakê di mijarên çandî, hûnerî û zanistî de bên perwerdekirin û derfet ji bo wan bê peyda kirin.



Xebatekî din a vê komîteyê jî pêşxistina xebatên aborî ye. Ji bo malbatên şehîd, esîr û gazîyan ji alîyê aborî ve têra xwe bikin proje û koperatîfên pêwist dike rêxistin dike û dimeşîne.

Bêguman gazîyên me ji gelek alîyan ve pêwistiyê alîkarîyê ne. Ev komîte divê ji hemû gazîyên di komînê de jîyan dikin berpirs be. Wan nas bike, pêwistîyê wan bibîne û heta ji dest hat alîkar be. Sazî û dezgehên eleqeder ve danûstandinê de be û ji bo tedawîyê gazîyan bi rêkûpêk bê meşandin tedbîrên pêwist digre.




**4. Komîteya Ekolojîyê**

Komîteya Ekolojiyê ji bo hişmendiya ekolojiyê di nava komînê de pêş bikeve, berîyê her tiştî xebatekî perwerdehîyê dimeşîne. Ji xwe civaka me zêdetir di gundan de dijîn û şewazê jîyanê wan xwezayî ye. Bi gotinekî din ji xwe feraseta ekolojîk heye. Lê bi pêşketina bajarvanî mixabin gundên me her diçe ji xwezayê xwe dûr dikeve. Dîsa di bajaran de jî nirxên ekolojîk her diçê lewaz dikeve. Ev pirsgirêkekî mezin a hemû cihanê ye jî.

Ev komîte ji bo jînwarên me xweşiktir û li gorî xwezayê xwe be xebat dimeşîne. Ji bo ax, hewa, av û bi giştî hawirdor paqij bimîne xebatên pêwist û projeyên nûjên pêş dixe. Kesên ku di vê alîyê de hestîyar rêxistin dike û tev li xebatên ekolojîk dike.

Ji bo pêşîyê ziwabûnê û çolbûnê bigre xebatên darçandin dimeşîne. Dîsa dar û daristanên heyî ji bo bê parastin tedbîran digre. Ji xwe darên şîn qutkirin jî divê bê qedexekirin da ku em bikaribin keskahîya herêmên me zêdetir bikin. Bu kurtasî bi çalakiyên wekî daristan û paqijkirina jîngehê parastina xwezayê misoger dike.Ew hem bi lêkolînên ekolojîk ên herêmî û hem jî yên giştî re tevdigere da ku hevsengiya ekolojîk biparêze.



## 5. Komîteya Kedkaran û Karên Civakî

Gelên me kedkar in. Bi kedê xwe jîyanekî bedil hûnandin û heta niha jî kedê didin da ku jîyanê xweşiktir bikin. Parastina kedê û kedkaran ji ber vê yekê, dibê xebatekî bingehîn a hemû civakê. Ev komîte jî ji bo vê xebatê baş bimeşîne û xizmeta beşên civakê yên herî bêderfet bike tê damezirandin. Karker û gundîyan, astengdar û pênaberan rêxistin dike da ku bibin derfetê jiyanekî baştir.




Bêguman başbûna jîyanê ne tenê di wateya madî û aborî tenê de ye. Berîyê her tiştî dibê xebatên perwerdehîyê bimeşînin da ku hemû beşên civakê li hemberî wan hestiyar be. Dîsa hemû komên bêderfet ên civakê xwe pêş bixin û têra xwe bikin xebatên rêxistinkirinê wan dimeşîne.




Ji bo rêxistinên xwe yên kolektîf û komînê pêş bixin wan perwerde dike. Ji bo bikaribin şertên bingehîn ên debarê peyda bikin bi sazî û dezgehên eleqeder ve projeyan amade dikin û pêş dixin. Muazif û karkerên di sazîyên taybet û giştî de kar dikin dişopîne û ji bo mafên wan ên bingehîn xebatên pêwist dimeşîne. Karkerên demsalî ango di ardan de kar dikin û bi taybet jî jinên ciwan ji bo bigihîn mafên xwe xwe rêxistin dike û alîkar dibe.



Her wiha armanc dike ku bi alîkariya kesên feqîr û bêkar rewşa jiyana wan baştir bike. Ew dixebitin ku hewcedariyên bingehîn ên wekî peydakirina xanî û karekî peyda bikin. Dîsa piştgiriyê dide extiyar, sêwî û bêmal û bi saziyên pêwendîdar re hevkariyê dike da ku şert û mercên jiyana wan ên bingehîn baş bikin.









## 6. Komîteya Lihevanînê (Sulhê)

Komîteya lihevanînê, ji bo aşitîya civakî û edaletê pêk bîne dixebite. Çareserkirina pirsgirêkên civakî de rola pêşengtîyê dike. Wekê tê zanîn tavan an suc encam in. Di bingehê wan de pirsgirêkên zêhnî heye. Ger di cihekî de pirsgirêkekî civakî yan rewşekî tavan diqewîme, di wir de pirsgirêkekî fikrî û ferasetî heye. Lewma lijne lihevanînê berîyê her tiştî di vê qadê de kar dike û xebatên zanakirina civakê dimeşîne.
Ji xwe civakê me ne xerîbê vê rêbazê ye û ji dîrokê ta niha bi vê şewazê xwestiyê pirsgirêkên xwe çareser bike. Bê ku serî li mahkemeyan bide pirsgirêkên xwe hal dike. Pirsgirêkên navbera malbat û şexsan de lêkolîn dike, heqîqetê derdixê holê û alîyên pirsgirêkê re niqaşan dimeşîne da ku bê ku pirsgirêk mezintir bibe rêya çareserîyê digere. Dervayî rewşên neçar û qanûnî hewldide hemû pirsgirêkan di komînhe xwe de çareser bike.

Di serî de tundîyê li ser zarok û jinan, hemû cûre tûndiyê re têdikoşe û hemû pirsgirêkên nava malbatê de jî bi rola çareserîyê radibe. Ji xwe hemû komînan de sazîya Mala Jinê jî heye û ji van pirsgirêkan yekser ev sazî berpirsiyar e. Lê komîteya lihevanînê û mala jinê di van mijaran de bi hevûdu re kar dikin.
Dîsa ji bo rewşên suc ên wekê fuhuş, hişbir, dizî û hwd jî têdikoşe û tedbîrên pêwist digre. Di vê mijarê de qasî lijnê lihevanînê hemû rêveberî û şenîyên komînê jî berpirs in. Bi gotinekî din divê tu kes çavên xwe li van sucan negre û kesên van sucan dikin re alîkar nebe. Em bizanibin ku ger kesek çavên xwe li van sucan digre ekîd ew jî şirikê van sucan in.









## 7. KOMÎTEYA TENDÛRİSTÎYÊ

LÎ DIJÎ POLÎTÎKAYÊN DEWLETÊ, KU LI DIJÎ TENDÛRİSTİYÊ CİVAKÊ KAR DİKE Û MİROVAN NEXWEŞ DİKE; Dİ SER DE JÎ Jİ KESÊN NEXWEŞ PERE QEZENC DİKE Û VÊ QADA TENDÛRİSTİYÊ WEKÎ SEKTOREKÊ Bİ KAR TÎNİN Bİ ŞİKLEKÎ ÇALAK TÊKOŞÎN DİMEŞÎNE.

PLAN, PROJE Û POLÎTÎKAYÊN KU GİRÎNGÎ DİDİN TENDÛRİSTİYA TAKEKES, MALBAT Û CİVAKÊ Û Jİ BO HEMÛ PİRSGİRÊKÊN TENDÛRİSTİYÊ YÊN KOMÎNÊ ÇARESERÎ DİAFİRÎNİN, Bİ PÊŞ DİXE. Jİ BO PÊŞXİSTİNA ZANEBÛNA JİYANA Bİ TENDÛRİST KAR DİKE. DERBARÊ TENDÛRİSTÎYA FİZÎKÎ Û RUHÎ DE XEBATÊN PERWERDEHÎYÊ Û HÎŞYARÎYÊ DİMEŞÎNE. GİRÎNGİYEKÎ TAYBET DİDE TENDÛRİSTİYA ZAROK Û JİNAN.

EV KOMÎTE, XİZMETÊN GİŞTÎ YÊN TENDÛRİSTİYA GEL, TEDAWÎ Û DERMANÊN HEWCE Bİ ŞİKLEKÎ BÊ PERE PÊŞWAZÎ DİKE. Dİ MİJARÊN WEKÎ TENDÛRİSTİYA GİŞTÎ, TENDÛRİSTİYA ZAROKAN Û PAQİJÎ Û TENDÛRİSTİYA MADEYÊN XWARİNÊ DE KONTROLÊN YÊN TENDURUSTİYA GEL, POLÎTÎKA Û ÇARESERİYÊN TEDAWİYÊ Bİ PÊŞ DİXE.

HEWLDİDE Jİ BO ENDAMÊN KOMÎNE XİZMETA TENDURİSTİYÊ YA BÊPERE PÊŞ BİXE. Bİ TAYBETÎ Jİ BO KESÊN KU ŞERT Û MERCÊN WAN ÊN ABORÎ NEBAŞ İN, PİŞTGİRİYA TENDURİSTİYÊ DİDE. PİRSGİRÊKÊN TENDURİSTİYÊ YÊN NEXWEŞÊN GİRAN Û KRONÎK Jİ BO DERMANKİRİNA WAN Bİ HEVKARİYA SAZİYÊN TENDURİSTİYÊ YÊN TEKİLDAR RE ÇARESER DİKE. Dİ HEMAN DEMÊ DE Jİ BO KESÊN XWEDÎ HEWCEDARİYÊN TAYBETÎ Û DERFETÊN DERMANKİRİNÊ PÊŞKÊŞÎ DİKE.






## 8. Komîteya Aborîyê

Ev komîte ji bo pêşxistina aboriya komînal û zêdekirina serxwebûna aborî ya gel dixebite. Bi avakirina kooperatîfan hilberînê teşwîq dike û di navbera komînan de hevgirtina aborî pêk tîne. Perwerdeyên ku hişmendiya jiyana hevpar di navbera endamên komunan de pêş dixe û bi armanca zêdekirina hêza aborî ya her komunê pêk tîne. Jinan jî bi rêya komûnên xweser û bi projeyên xwe yên taybet ên aborî re azadiya aborî ya jinan zêde dikin.

Ji bo van hemûyan jî xebatên hişmendiyê dixe navendê karên xwe. Li dijî ferasetên kapîtalîst ku aborîya civakî tune kiriye têdikoşe û dixwaze civakekî hilberîner ava bike. Bi vê şeklî dixwaze pirsgirêkên aborîyê endamên komînê û gel çareser bike.

Li dijî çêbûna yekdestên aborî ku ji kombûna sermayeyê re rê vedikin, bi feraseta ax, av û enerjîya xwe bikin komîn û koperatîf tevdigere. Ji enerjî, ax û ava heyî ji bo hemû gel sûdê werbigire bi rêxistin dike û plan û projeyên bi van re eleqadar bi pêş dixe.

Berhem-hilberîna ku li gorî mercên xweser ên wê qadê çêdibin, bi şiklê komîn û kooperatîf bi rêxistin dike, mezin dike û beriya pêşîn girîngî dide hilberîna modern a organiik. Plan dike ku berhemên pîşesazî, çandinî û teknolojîk, kooperatîfên wan bi teknîkên modern ên eko-endustrî bigihîne û bi berhemdariyeke mezin bi pêş bixe; vê pratîze dike û dike armanc ku vê berbelav bike.





## 9. Komîteya Komên Gelan û Bawerîyê

Komîteya Baweriyan azadiya baweriyê di civakê de diparêze û li dijî cudakariya olî têdikoşe. Ji bo hemû komên gel bi nirx, exlaq û bawerîyê xwe bi awayekî azad bijî xebat dimeşîne. Li dijî feraset û zêhnîyetên olperêst, mezhebperêst û zayendperêst zanebûnê pêş dixe. Ji bo di civakê de di navbera bawerîyan de xweşbinî pêşbikeve xebatên hişmendiyê dimeşîne.

Li dijî kes, xebat û ferasetên ku ol û bawerîyan ji bo berjewendiyên xwe bikartînin û li dijî mibdeyên exlaqa azadîxwaz tevdigerin têdikoşe û tedbîrên pêwist pêş dixe.

Navendên olî wekê mizgeft, dêr, êzîdîxan û hwd diparêze û pêwistiyên wan ên wekî paqijî, teslih û hwd pêk tîne. Dîsa erkdarên olî ji bo erkên xwe baş pê rabin alîkar dibe, pêwistiyên wan ên madî û manewî pêşvazî dike.





**10. Komîteya Ciwanan**

Komîteya Ciwanan ji bo pêşxistina hişmendiya exlaqî û polîtîk a ciwanan xebatên curbecur li dar dixe. Ciwanan arasteyî xebatên perwerdeyî û çandî dike û wan dike ku beşdarî xebatên xweparastinê bibin. Her wiha ji bo ciwanan projeyan çêdike ku di warên wek werzîş û hunerê de xwe pêşde bibin. Ji bo jinên ciwan jî modelên rêxistinî yên taybet pêşkêşî dike.

Rêxistinbûna ciwanan, li ser biryar û plansaziyên stratejik ên bi vê rêxistinbûnê re eleqadar in kûr dibe. Di mijara pirsgirêkan de çareseriyan diafirîne. Li beramberê hemû nêzîkbûnên modernîteya kapîtalîst ku ciwanan deforme dikin, depolîtîze dikin, dikin xizmeta xwe, dixin nava fuhuş û madeyên hişbir û hwd bi xebatên xwe yên alternatîf têkoşînê dimeşîne.

Xebatên bi ciwanan re eleqadar ên wekî festîwalên xweser, xebatên çand, huner, wêje, spor û hwd bi rêxistin dike û dimeşîne. Di heman demê de di xebata parastinê de jî bi roleke pêşeng radibe û di nava ciwanan de feraseta parastina rewa pêş dixe.

Jinên ciwan, wekî xebateke xweser di nava vê komîteyê de xwe bi rêxistin dikin û xebata xwe dimeşînin.



## 11. Komîteya Parastinê

Komîteya Xweparastinê ji bo pêşxistina hişmendiya xweparastinê ya endamên komunê perwerdeyê organîze dike. Komînan li hember tehdîdên civakî yên wekî tiryak û fuhûşê diparêze û ji bo jîngeheke ewledar tedbîrên pêwîst digire. Ji bikaranîna teknolojî û propagandayê dijminên gelan heta parastina fizîkî ya pêkhateyan di hemû qadan de parastinê esas digre. Ji bo ruh û mêjîyê mirovan ji bomberana şerê taybet a dewletan bê parastin xebatên pêwist a hişmendî û zanebûnê pêş dixe.

Ji bo ewlekariya can û malên şêniyên komunê û ji bo ku ew di rewşeke ewle û aram de bijîn, tedbîrên pêwîst digire. Ji bo vê jî li ser bingehê hevkariya hêzên ewlekariya navxweyî kar dike.
Li dijî êrîşeke muhtemel yekîneyên parastina rewa yên komînan bi rêxistin dike û perwerde dike. Li ser esasê xeta parastina rewa, li beramberê hemû êrîşên hundir û derve gel û mal û milkê gel diparêze. Li ser bingeha xeta şerê gel ê şoreşgerî hemû endamên komînê tevlî pergala parastina çalak dike. Xebatên Hêzên Parastina Cewherî rêxistin dike û tev li plansazîyên sazîyên din ên xweparastinê dibe. Bi rewşa xwe ya nîv-xweser, tevî komîteya giştî ya parastinê bi şiklekî bi koordîne xebata xwe dimeşîne. Tevlîbûna li ser esasî dildarî û welatparêziya bi zanebûna kûr, bingeh digire.










## 12. Komîteya Hevjîyana Azad

Komîteya Jiyana Hevjîyana Azad ku wekheviya zayendî diparêze, civakê li dijî zîhniyeta zayendperest perwerde dike û balê dikişîne ser xebatên bilindkirina hişmendiya civakî. Ji bo perwerdekirina civakê li dijî zîhniyet û pêkanînên zayendperest, mêr serdest û pêşxistina hişmendiya azadiyê xebatên perwerdehiyê yên pêwîst dike.

Hevjiyana azad û têkiliyên malbatî yên demokratîk pêş dixe. Ji bo pêşîgirtina li şîdeta nava malê, zext û pêkanînên dijdemokratîk hemû tedbîran digire û têdikoşe. Armanc dike ku têgeha jiyana zewaca azad di nava civakê de belav bike. Ji bo pêşîgirtina li şîdet û her cure îstîsmara li ser jin û zarokan û pêşxistina jiyana azad, berpirsyar e ku tedbîrên pêwîst bigire. Ger hewce bike bi hevkariya rêxistinên jinan û saziyên darazê yên şareza pirsgirêkan çareser dike.

Li ser van mijaran hemûyan de malbatan û bi taybetî jî mêran re xebatên perwerde û ronakbîriyê li dar dixe. Ji bo pêşxistina hişmendî û têgihiştina pergala hevserokatiyê têdikoşe û hewlbide di her aliyê qada civakî de temsîlê wekhev a jin û mêran pêş bixe. Ji wergirtina hemû bîryar û plansaziyên stratejik ên bi rêxistinbûna jinan re eleqadar û ji pêşxistina projeyan, di hemû mijarên li ser parastinê de ev komîte berpirsiyar e. Tevî hevserokên komînan, bi xebateke bi koordine van xebatên xweser dimeşînin.








## 13. Komîteya Xizmetgûzarî û Şaredarîyan

Ev komîte çavdêriya xizmetguzariyên şaredariyê yên di nava sînorên komunê de dike. Xebatên pêwîst ji bo dabînkirin û birêxistinkirina av, elektrîk, paqijî, rê û xizmetguzariyên qada jiyanê ya hevpar dimeşîne. Ji bo van xizmetan bi saziyên pêwîst re hevkariyê dike.

Ji bo paqijkirina qada komunê, veqetandina çopê û komkirina wan li cihekî, wezîfeyên pêwîst dike. Ev wezîfe bi dorê di nava endamên komînên taxan de tên kirin. Her wiha hişyariya gel derbarê paqij kirina qada civakê û veqetandina çopê bilind dike û karên pêwîst rêxistin dike.

Di warê paqijî, xizmetguzariya avê û berhevkirina heqê xizmetguzariyê de erkên xwe bi cih tîne. Vê derbarê de proje û rêziknameyên şaredarîyên demokratîk dişopîne û karekî hevbeş dimeşînin. Di heman demê de li dijî kesên ku alavan bi buhayên giran difroşin gel, sextekariyê dikin, mal û xizmetên ku li gorî tenduristî û pîvanan nabin di nav sînorên komunê de têdikoşe. Berpirsiyar e ku li hember kesên ku van sûcan dikin, li pêşberî saziyên pêwendîdar, bi hevkariya saziyên pêwendîdar re tedbîrên qanûnî bê girtin.

Wekê din ev komîte berpirsê dabînkirin û rêxistinkirina pêdiviyên jiyanî ya endamên komînê berpirs e. Belavkirina mazot, xaz, nan û hwd de ev komîte xebatên pêwist dimeşîne.







**14. Komîteya Arşîv û Tomarê**

Komîteya Arşîv û Tomarê ku bûyerên wekî serjimariya nifûs û xaniyan a komunê, jidayikbûn û mirinan tomar dike, kesên ku hewcedarê alîkariyê û piştgiriyê ne jî destnîşan dike. Bi hevkariya saziyên pêwendîdar re rewşa civakî ya endamên komunê birêkûpêk dike.

Serjimariya nifûs û xaniyan, hemû amarên/statîstîkên têkildarî hilbijartinan û hemû xizmetên civakî yên taybetmendî jî tomar dike. Pirtûkên nifûsê yên li komînan birêxistin dike. Tomarên nifûsê yên wekî jidayikbûn, mirin û guhertina navnîşanê nûve dike. Qeydên niştecihên nû yên li komunê diparêze û ji saziyên pêwendîdar re radigihîne.

Derbarê rewşa aborî û jiyana civakî ya hemû endam û malbatan de agahiyên pêwîst arşîv dike. Li gorî daxwaza fermî ya saziyên pêwendîdar, piştgirî û alîkarîya pêwîst bi wan re par ve dike.



**15. Komîteya Darayî**

Ev komîteya ku bi karûbarên darayî ya komînê re mijûl dibe. Hesabên hatin û lêçûnên komînan diparêze û di vê mijarê de raporan pêşkêşî hevserokên komînan û civînên komîne dike. Dahatên komînê ji hilberîna koperatîfan, çalakiyên civakî yên endamên komînê, alîkarî û piştgirîyên darayî ya niştecih û sazîyan, piştgirîya darayî ya belde û bajaran û para ku ji mîzanîya giştî ya bakur û rojhilatê sûriyê tê veqetandin, pêk tê. 30 ji sedî ya wê para ku ji rêveberîyê xweser a bakur û rojhilatê sûrîyê tê wergirtin yekser ji bo xebatên komîna jinan tê dayin. Li gorî hêz û taybetmendiyê wê komînê, malbatên komînan divê her meh aîdatekî diyar bidin sandoqa darayî ya komîne.

Van dahatan ji bo bicihanîna erk û projeyên ku bi qanûnê hatine diyarkirin têne xerckirin. Dervayî pêwistiyên rojanê ya rutînî, derbarê hemû proje û leçûnan de divê erêkirinê komîne esas be girtin.

Komîteya maliyeyê her dem raporên darayî pêşkêşî civînên giştî yên komunê dike. Her wiha bîlançoya dahat û lêçûnên salane bi nivîskî li tabloya bultenê ya komunê tê daliqandin. Ango dahat û lêçûnêne salane divê bi hemû endamên komînê re bê par ve kirin bi rêyên curbecur.



# Têkilîyê Komînan Bi Rehendên Netewa Demokratîk re Divê Çawa Be?



SİNAN XEMGİN

Têkoşîna azadiyê ruxmî hemû bêderfetî û astengiyan kariye derketinekê bike. Vê rewşa xwe deyndarî bersivên xurt ku daye pêdiviyên civakî û qonaxên curbicur e. Eger di pêvajoya şoreşa Rojava de xebatên înşaayê bi ruhê heyî pêşwazî neke, çawa ku ev ê bibe sedema paşketinê, her wisa jî wê bibe sedem ku bi hileweşîne re rû bi rû bimîne. Wê demê ew ê înşaaya pergala konfederal demokratîk li gorî çi pêk bîne? Divê ji bo pirsên wekî ji pêvajoya înşaayê çi were fêmkirin, bersivê peyda bike û gava destpêkê ji wê derê bide destpêkirin.

Di cih de ye ku di lîteratura modernîteya demokratîk de 'înşaa' wisa were pênase kirin: qutbûna ji pergalê, 'xwebûn'. Ji aliyê hişmendî û bedenê ve qutbûna ji pergala dewletî û desthilatîperest, şertûmerca destpêkê ya avabûn û pêkhatinê ye. Eger ev qutbûn pêk neyê, rewşa bûna nav pergalî tê jiyîn; ev jî tê maneya hêz û quwet dayina pergala dewletî û wekî dijberê xwe lê hatinê. Ji ber vê yekê, ji bo ku karibe înşaa were pêkanîn, neçar e ku derketina ji derveyê pergala dewletî çêbibe. 'Qutbûna' ku behsa wê dibe, ji bo hemû civakê derbasdar e. Di vê mijarê de xwe xapandin û seraserabûneke wisa heye; di pêvajoya înşaaya pergala civakî de jî bo destpêkê wê bi hişmendî û elimandinên berê pergala nû were bi rêxistinkirin. Yek ji mijarên herî girîng ew e ku bêyî ketina nava van şaşiyan, înşaaya hişmendiyê di destpêka her tiştî de were bicihkirin.

Di pêvajoyên înşaayê de mijara bingehîn a duyemîn xwe xapandina ku hewce dike were dîtin; ji bo civakê vekirina qadeke polîtîk yan jî dûr ji dewletê li qadekê hebûna wê, wekî ku tê maneya civaka azad yan jî civak wê di van şertûmercan de ji ber xwe ve xwe birêxistin bike, fêmkirin e. Dema ku civak bêyî dewlet bin yan jî dûr ji dewletê li qadekê bijîn, dibe ku ew serbestiya xwe bistînin lê ev rewş nayê maneya azadbûna wan. Ji ber vê yekê ye ku serbestî û azadî ne heman têgeh in. Koleyên ku ji qeyd û bendên xwe rizgar bûne yan jî jê dûr ketine dibe ku serbest bin lê belê ev nayê maneya ku ew azad bûne. Lewra azadî karê zanebûn, ruh û îradeyê ye. Tena serê xwe ev jî têrê nake. Ya girîng; jiyanek ku li gorî vê zanebûn û ruhî be, xelek bi xelek were înşaakirin û were gihandine îradeyê.

Ji ber vê yekê pêwîst e qada şoreşa Rojava wisa were pênasekirin û fêmkirin; civaka konfederal demokratîk hewce dike serbestî û azadîya civak-şexs di zikhev de bi pêş bike, ji bo vê yekê qadeke wisa hatiye vekirin. Di pêvajoya şoreşa Rojava de wekî gava destpêkê civak ji qeyd û bendên xwe rizgar bûye û nîsbî-hinekê serbestiya xwe standiye lê ev nayê maneya ku civak azad bûye. Eger civak heta bi şane-xeleya xwe ya herî biçûk înşaayê bi ser bixe, wê azadî bi pêş bikeve. Ev jî dema ku di nava civakê de jiyana komînî were birêxistinkirin û civak xwe bigihîne asta hêzeke rêxistinî pêk tê. Ji ber vê yekê maneya azadiyê ew e, ku şexs-civaka serbestiya xwe standiye, li ser esasê zanebûna azadiyê, avaniyên xwe yên civakî û polîtîk bi pêş bixe, qadên jiyanê yên alternatîf werin avakirin û civak li ser esasê xweseriyê were rêkûpêkkirin.

Pêvajoya şoreşa Rojava ji bo ku civak azad bibe qadeke serbest çêkiriye, ji ber ku di maneya çors de dewlet hatiye dûrxistin û ji bo civakê cih hatiye vekirin. Divê niha bêyî ku ev zemîna serbestiyê ji hin hêzên din ve were berdan, civak bi ruhê azadiyê, li ser esasê xweseriya demokratîk di maneya civakî û polîtîk de were înşakirin. Eger bi zanebûna hişmendî û bedena konfederal demokratîk ev zemîna heyî neyê nirxandin, çawa ku wê azadî bi pêş nekeve di heman demê de wê meyl, fikr, feraset û îdeolojiyên cuda vê zemînê bixin xizmeta xwe û dij-şoreşê bi rêxistin bikin. Niha qada Şoreşa Rojava bi pêvajoyeke înşaaya dîrokî ku vê zemînê biqulupîne înaşaya azadiyê re rû bi rû ye.

**Konfederalîzma demokratîk pergala rêxistinkirî ya civaka demokratîk e**

Rêbertiyê bi gotina xwe ya bi şiklê "eger neteweya demokratîk ruhek be xweseriya demokratîk beden e. Xweseriya demokratîk rewşa neteweya demokratîk a xwe înşaa kirî û şênber bûye", aniye ziman ku xebatên neteweya demokratîk ji bo konfederalîzma demokratîk tên çi maneyê. Rêber Apo ji ber vê yekê hişmendî û avanîbûnê di zikhev de digire dest û behsa yekparetiya xebatên înşaayê dike. Her wisa pêvajoya ku her pergala zindî ferq û cudahiya di xwezaya wê de heye nîşan dide, ji bo neteweya demokratîk û konfederalîzma demokratîk jî derbasdar e. Pêwîst e were zanîn, bêyî ku rehendên (boyutên) neteweya demokratîk di saziyên-dezgehên pergalê de werin bi rêxistinkirin wê xweseriya demokratîk bibe laşekî bê ruh û giyan û ev ê jî bibe tiştekî bê mane.

Neteweya demokratîk xwe dispêre yekîtiya konfederal a rêxistinbûna xweser a ferq û cudahiyan. Hişmendiya neteweya demokratîk, laş-bedeneke ku ji komîn, meclis û pêkhateyên rêvêberiya xweser çêbûye. Bedenbûn xwe dispêre bi rojane birêxistinkirina boyutan. Komîn şiklê rêxistinê ye ku boyutên neteweya demokratîk xwe li vê qadê fonksiyonel dikin. Komîn, yekeyên wisa yên herî demokratîk in ku civak di nava wan de, xwe bi xwe karê xwe dike. Komîn û Yekeyên xweseriya demokratîk ku xwe dispêrin hêza cewherî û têra xwe bi xwe kirinê, modelên rêxistinbûnê ne ku neteweya demokratîk bi temamî şênber dikin. Komîn, ji ber vê yekê ku dendika civakê ne û şaneye esasî ya neteweya demokratîk in.

Pergala konfederal demokratîk ne partî yan jî tevgerek e, pergaleke civakî ye ku civak xwe bi xwe digihîne asteke bi rêxistinbûyî. Hemû beşên civakê ji yekeyên xwe yên herî biçûk dest pê dikin hemû nasname, etnîsîte, çand, çîn û tebeqe û ferq û cudahî bi şiklekî xweser li ser esasê feraseta demokrasiya herêmî xwe bi rêxistin dikin. Hemû civak û sazî di nava rêxistinbûneke xweser a demokratîk de hebûna xwe nîşan didin û li ser esasê têkiliya konfederal bi şiklekî yekpare pergalekê pêk tînin. Ji ber vê yekê konfederalîzma demokratîk mekanîzmayek e, ku avaniyên xweser li ser esasê taybetmendiyên hev temamkirin û hev bi xwedîkirinê çêdibe. Di pergala konfederalîzma demokratîk de konsensûs û hev temamkirin esas e.





**Boyutên neteweyeya demokratîk paradîgmayeke wisa ye ku rojane xwe bi rêxistin dikin**

Maneya siyasî ya neteweya demokratîk, xweseriya demokratik e; maneya berfireh jî komînbûn, meclisbûn û konfederalîzma demokratîk ku xwe dispêre boyutan e. Ji ber vê yekê xweseriya demokratîk û konfederalîzma demokratîk tiştên cuda ne, xweseriya demokratîk, li gel pergala dewletî hiqûqa xwe diyar dike. Yanî dewletê ji bo demokrasiyê tîne warekî heses-hestiyar. Konfederalîzma demokratîk jî, şiklekî xwe bi rêxistinbûna civakê ye ku ew bi feraseta demokrasiya radîkal, bi rêxistinbûneke esasî ya komînal û demokratîk xwe bi rêxistin dike. Bi kurtûcewherî konfederalîzma demokratîk modeleke wisa ku avaniya komîn, meclis û avaniyên xweser bi pêş dixe û boyutên neteweya demokratîk di nava van avaniyan de bi rêxistin dike. Ji ber vê yekê konfederalîzma demokratîk, boyutên netêweya demokrtîk wekî pêkhate, avanî û saziyan lê dike. Bi vî şiklî avaniyên netweya demokratîk temam dike û civakê dike kirde-subje, civakê dike hêz û îrade û polîtîze dike. Her wiha rêya tinekirina hişmendiya desthilatdariyê ew e ku li şûna ku dewlet di cepheyê dijber de were bicihkirin, ya esasî ew e ku girseyên dibin ji rêzê, pasîfze dibin bi demokrasiya radîkal werin çalakkirin û werin birêxistinkirin.

Rêya herî bingehîn ji bo xwe gihandina van esasan, li ser bingeha ku ji komîn û meclisan dest pê bike boyutên neteweya demokratîk heta bi avaniyên rêveberiya xweser bi rêxistin kirin e. Ev ê jî, herikîna jiyana wekhev, azad a civakê diyar bike. Ji ber vê yekê ye ku ruhê paradîgmayê boyut in, boyut manedar bûyîn e û wekî her maneyê, pergal jî hewl dide hebûna xwe di ser boyutan re nîşan bide. Ji bo vê, komîn û meclis bê boyut wekî miriyekî bê ruh û bê şikil in. Wê demê pêwîst e neteweya demokratîk wekî paradîgmayek ku bi rojane di ser deh boyutan re xwe bi rêxistin dike were pênasekirin. Bi gotineke hê aşkere boyutên neteweya demokratîk navê jiyana azad in ku boyutên neteweya demokratîk, di ser komîn û meclisan re xwe bi rêxistin dikin û ferq û cudahiya pergalê ber bi çav dikin û dikin beden. Ferq û cudahiya pergala demokratîk, girêdayî bi asta boyutan e ku rojane di nava avaniyên pergalê de xwe bi rêxistindikin. Ji ber ku boyut faktorên herî bingehîn ên pergalê ne û di pergalê de di asta diyarker a kişandin-dehfdanê de rol dileyizin.

Boyutên neteweya demokratîk, dikarin di nava pergala nehiyerarşîk-berwarî de hebûna xwe nîşan bidin û fonksiyonel bibin. Pêwîst e berwarîbûn û rêvebertî bi temamî were bikaranîn. Lewra boyutên neteweya demokratîk tenê dikare di nava pergala rêxistinbûna nehiyerarşîk-berwerî de pêk were, hebûna xwe nîşan bide û bimeşe. Ya ku vê mekanîzmayê ava dike, mekanizmaya konfederal demokratîk e yan jî şiklê têkiliyê yê konfederal demokratîk e. Di vê mijarê de tiştê ku bi girîngî were bidestgirtin, xwecihî kirina pergalê û bi rêxistin kirina demokrasiya xwecihî ye. Rêveberina xwecihî, înîsiyatîfa xwecihî û wekî kirde-subje tevlîbûna civakê, cewhera pergala konfederal demokratîk e. Ji ber vê yekê, xweserî tê maneya azadî û tevlîbûna herî bindestan. Xweseriya demokratîk, pergalek ku ji binî de pêk tê ya rêxistinî û rêvebirinê ye. Lewra înşaaya neteweya demokratîk ji jêrî ve dest pê dike û xwe bi rêxistin dike, konfederalîzma demokratîk pergalek ku ji herêmê dest pê dike û xwe bi rêxistin dike, ne burukrasiyek ku ji jorî ve û ji navendê ve dest pê dike û xwe bi rêxistin dike.

Xwe bi rêxistin kirina ji jêr ve, înîsiyatîfa xwecihî, komîn, meclis hewce ne. Lê ev jî dibê ku di maneya rastîn de têrê neke ku demokrasiya rasterast yan jî pergaleke demokratîk û azadiyê nikaribe were avakirin. Ji ber vê yekê di vê maneyê de girîng e ku ji ceribandina real sosyalîst ders werin derxistin. Pergala real sosyalîst jî di her qadê de xwediyê komînan bû. Di pergala Sowyetên de li hemû welatî komîn û meclis hatin avakirin. Lê ji ber ku modela rêxistinê, modela navendî ku pergala dewletî bi xwedî dikir, hemû hêz -li navendê kom bû. Û heman tişt bû sedem ku sosyalîzma real cewhera xwe ji dest bide. Her wiha modelên navendî yên di dîrokê de di hemû hêzên ku li ser navê bindestan tevdigerin de derketine holê, di dawiya dawî de sermaye û çînên navîn kirine hêz. Taybetmendiya bingehîn a pergalên navendî, timî burjuwazî, çîna navîn, axa û beg kirine hêz û quwet.

Di pêvajoya înşaaya Rojava de li gund, kolan û taxan komîn hatin avakirin. Eger ev komîn û meclisên çêbûne, li modeleke konfederal demokratîk neyên girêdan aşkere ye ku pergaleke dişibe modela dewletê navendî wê derkeve holê. Di destpêkê de dibe ku were gotin pêvajoya şer e û nebe pirsgirêk lê paşê pergaleke navendî ya burukratîk bi pêş dikeve û ber bi deformebûnê ve diçe.

Yanî tenê bi rêxistinkirina jêrî ve, rêxistinbûna demokratîk a gel bi pêş nakeve. Şertûmer ew e ku ji bo înşaayê bi terza komîn û meclisan rêxistinbûn were bi pêşxistin. Lê divê pergal bi modeleke konfederal demokratîk were bi rêxistinkirin. Di pêvajoya înşaaya konfederal demokratîk de, divê di ser mekanizmaya merkezî ku wekî rêbazekê hatiye avakirin re neteweya demokratîk neyê bi rêxistinkirin û ji vê dûr were sekinîn. Ev rêbaz ber bi navendîbûnê ve û di maneya burukratîk de jî, ber bi dewletbûnê ve dibe. Berewajî, konfederalîzma demokratîk tenê dikarê bi rêxistinbûna nehiyerarşîk-berwarî were pêkanîn û bi pêş bikeve.

Dema ku li dijî navendîbûnê feraseta xweseriya demokratîk tê pêşxistin, hewce dike pratîkên 'şowenîzma xwecihî' neyê bi pêşxistin. Murray Bookchin ku yek ji pêşegên fikriyata konfederal demokratîk e ji bo ku şowenîzm xwecihî asteng bike, rêgeza hevtemamkirin û hev bixwedî kirinê bi pêş dixe. Dibêje "eger ne ji vê rêgezê be dibe ku hemû yeke bibin mîrektî û prensnîşînî. Her wiha ji bo ku yekeyên xweseriya demokratîk ku li herêman hatine bipêşxistin, ber bi şowenîzma xwecihî ve û ber bi serdestiya xwecihî ve neşemitin, pêwîst e rêgeza hevtemam kirinê bi şiklekî xurt di nava pergalê de were bicihkirin. Ji ber ku li Rojava di ceribandina rêxistinbûna konfederal demokratîk de, di pergalê de rêgeza hevtemamkirin û hevbixwedîkirinê nehatiye xurtkirin, tê zanîn ku feraseta sazîperestî bi pêş dikeve. Tê zanîn ku feraseta sazîperestî ya ku hev bixwedî nake, hev du guhdar nake û heta hev vala derdixe, derdikeve holê. Divê were dîtin ku ev feraset pratîkek wisa bi pêş dixe ku yekparetiya konfederal demokratîk parçe dike û herîkîna pergalê asteng dike.

Konfederalîzma demokratîk, pergala komîn û meclisan e. Lewma pergala demokrasiya radîkal a rasterast e, ku xwe dispêre yekbûna avaniyên xweser ên li gorî boyutan xwe bi rêxistin kirine. Ya ku civakê dike hêz û îrade ev pergal e. Dema ku bi vê perspektîfê were nirxandin, konferderalîzma demokratîk ne tenê boyuta siyasî ye. Dema ku boyuta siyasî, meclis û pergala polîtîk a xweser were tarîfkirin û naveroka wê neyê dagirtin, yan rêveberiyeke burukratîk a zuwa yan jî wê rêveberiyeke teng a şiklî derkeve holê. Di xebatên înşaayê de di serî de komîn, eger hemû pêkhate-avanî bêyî boyut werin birêxistinkirin, çawa ku pêdiviyên civakî nayên pêşwazîkirin her wisa jî di jiyanê de kalîte û di maneya madî û manewî de dewlemendî dernekeve holê. Di vê mijarê de sînordarbûn û seraserabûneke pir cidî heye. Li Rojavayê rêxistinbûna komîn û meclisan tê meşandin lê ev bi tena serê xwe boyuta siyasî ye. Bi şiklê ku ji boyutên din qut bûyî, xebateke komîn û meclisan tê meşandin.

Komîteyên di komîn û meclis xwe birêxistin kirine, vedana boyutên neteweya demokratîk e. Ji ber vê yekê pêwîst e li ser esase pêdiviyên wê qadê bi hev re xwe bi rêxistin bikin û bi hev re bixebitin. Divê li van qadan nîqaş, biryar wergirtin û pratîzekirin bi pêş bikeve. Ji bo ku wê pêvajoya nîqaş û biryar wergirtinê di ser meclisan re bimeşe, pêwîst e boyut bi rêya komîteyên ku di nava komîn û meclisan de ne xwe şênber bikin. Rêxistin kirina boyutan bi vî şiklî, di serî de ji bo kanton û avaniyên xweser wê bibe sedem ku ew bi terzeke konfederal xwe bi rêxistin bikin; her wiha di encamê de ji bo ku di xebatan de organîzasyoneke bi hev re bi aheng û hev temam dike bi pêş bikeve, wê zemîneke xurt derkeve holê. Jixwe eger boyut rast û durust dest bi xebatê bikin, hemû civak dibe gelekî bi rêxistikirî. Rewşa ku Rêbertî jê re dibêje 'civaka bi rêxistin kirî' ev e. Lê boyutên ku halê hazir bi pêş ketine, li gorî paradigmaya neteweya demokratîk tevnagerin, xwe dixin li şûna komîn û meclisan û biryar distînin; pir zêde navendî ne.

Hewce dike di pêvajoya nû de boyutên neteweya demokratîk, di nava meclisên herêmî û komînan de hê zêdetir giraniya xwe bidinê, ji herêmê dest bi xebatê bikin û ji herêmê dest bi rêxistin kirina neteweya demoktatîk bikin. Lewra pergala neteweya demokratîk pergaleke wisa ye ku bi rojane, di ser boyutan re rêxistin bûnê ji herêmê dide destpêkirin. Mekanîzmayên ku ev boyut tê de xwe şênber dikin û ava dikin jî, komîn û meclis in. Komîteyên komîn û meclîsên ku vê gavê hene yên xwe dispêrin gel û boyutên ji vê qut dimeşin wekî du otorîteyên cuda disekinin. Meclisên gel ên hevpeymana nû di meclisa gelan de hatiye erêkirin, wekî konseyên bi rêvebirinê û meclisên boyutan ji nû ve hatine birêxistin kirin. Di xebatên pergalê ku heta bi niha bi pêş ketiye de azmûnên girîng çêbûne, ji bo pêşerojê bingeheke xurt hatiye çêkirin. Modela pergala ku nêzîkî 11 sal in hatiye pêşxistin, komîn û meclisên ku gel ji aliyê siyasî ve xwe bi rêxistin kiriye, .bi pêş xistine. Lê belê ji ber ku feraseta boyutan û tevlîbûna boyutan çênebûye, têra xwe bi xwe kirin, bi şiklekî xweser xwe bi rêxistinkirin û rêveberiya xwe bi xwe ya gel dernediket holê. Ji ber ku komîn û meclisên ji boyutan qutbûyî bi pêş diketin. Lê meclis ne tenê amûrên rêvebiriyê ne; ne tenê amûrên biryar wergirtinê ne jî. Komîn û meclis, amurên deh boyutan in, polîtîkaya hemû boyutan dimeşîne û îrade û rêveberiya hemû boyutan e. Lewra ew, îradeya bigehîn ku siyaseta esasî ya qadê, polîtîkayên ekonomîk, parastinê û perwerdeyê diyar dike û dimeşîne. Li ser vê bingehê; bi destpêkirina pêvajoya nû re pêwîst e meclis, desteyên rêvebirinê û meclisên boyutan li wê qadê bi hev re bixetin, pêdiviyên wê qadê yên wekî ekonomîk, tendurustî, perwerde, parastin û hwd. bi şiklekî somut dest nîşan bikin; ji bo ku mekanîzmayeke fonksiyonel bi pêş bikeve xizmetê bikin.

Ji ber ku di dema derbas bûyî de komîn û meclis, ji boyutên neteweya demokratîk qut bûn, pergaleke hiyerarşik û navendî bi pêş diket. Her wiha komîn û meclisên ku ji azmûnên berê pêk hatine yên çavkaniya xwe ji vê pergala navendî digirin, timî xwe li benda jorî digirtin. Çawa ku rewşên çavkaniya xwe ji pergalê digirin hene, di mijara tevlîbûna şexs û civakê dejî pirsgirêk hene. Rewşek ku bi aliyê erênî li ser hev bandor dike, ku li pey hev bi pêş diket hebû. Ji ber feraseteke rêveberiya herêmî ya dimeşe tinebû, ji aliyê tevlîbûna civakî ve jî pirsgirêk derdiketin. Lê belê înşaa kirin tê maneya tiştek afirandin yan jî pêkanîn û meşandina têkoşînê. Li şûna ku were înşaa kirin, ya amade ye tê xwestin. Çawa ku seknên bi vî şiklî û seknên bi bendewarî, îradeya xwecihî nakin hêz, pêwîst e were zanîn ku ev helwest navendperestiyê didin teşwîqkirin û li gorî wê jî hewce dike têkoşîneke rast were meşandin. Di encamê de di serî de komîn û meclisên ku yekeyên esasî yên rêveberiya xweser û ji boyutan qut in, bi tevlîbûneke bi vê terzê, îradeyên kanton û rêvêberiya xweser bi pêş nakeve. Her wiha aşkere ye, pergala ku hatiye bi rêxistinkirin jî wê nemeşe.

Konfederalîzma demokratîk pergaleke wisa ye ku dike hedefa xwe di ser komîn, meclis, akademî û kooperatîfan re întiyaca heyî civakî bike, di ser komîn û meclîsan re çînan bi feraseta demokratîk veguherîne û bi pêvajoyên keda kollektîf pratîka mûçexwariyê ji holê rake, sûkên nenavendî yên xwecihî yên bi hev re hevkar dibin çêbike, têkiliya rêveberin û hatin rêvebirinê ji holê rake, bi hişmendiya civakparêz a demokratîk, îradeyek ku xwe bi xwe bi rêve dibe bi pêş bixe û van bi parastina cewherî re bike yek. Lewra di çarçoveya înşaaya rêveberiya xweser a demokratîk de, li ser esasê ceribandin û pêdiviyên polîtîk û civakî de ji bo ku xwe gihandina van hedefan pêk were, timî nîqaşek hatiye meşandin û hewl hatiye dayin pergal were nû kirin. Pergala ku li Rojava hatiye înşaakirin, di maneya ku gel tevlî pêvajoyên biryargirtinê bibe û bi taybetî jî jin tevlî avanî û pêk hateyên xweser bibin de pêşketinek heye. Lê belê di navbera rêveberiya xweser û înîsiyatîfa xweser (komîn û meclis) de ji ber tevlîheviya rolê ya ku çavkaniya xwe ji navendîbûnê digire, li ser pratîkên komîn û meclisan bandorên neyînî bi pêş dikevin. Di pêvajoya nû de ji bo ku herêm bibe xwediyê înîsiyatîf, komîn û meclis fonksiyonel bibin, nîqaşên peymana nû hatine meşandin, ji aliyê nîqaş, biryar girtin û pratîza kirinê ve înîsiyatîf ji bo komîn û meclisan hatiye dayin û biryara ku boyut di herêmê de (bi şiklê xwecihî) xwe bi rêxistin bikin bi pêş ketiye. Pêwîst e li gel meclisên gel Boyut jî bi terza meclisê xwe bi rêxistin bikin, wê demê ev ê pergalê hê jî demokratîze bikeû wê meclisên boyutan di nava civakê de berbelav bibin û di nava komîn û meclisan de şênber bibin. Her wisa hewce dike ku pêvajoyek wisa bi pêş bikeve, komîn û meclis di her maneyê de pêşengiya vê qonaxê bikin. Bendewarî heye, ji bo ku saziyên xweser, meclisên gel û meclisên boyutan di nava ahengekê de û bi şiklekî ku hev temam dikin bixebitin, rêveberiya xweser ku rol bigire li ser milê xwe, li ser esasê modela mekanizmaya konfederal, pêvajoyên biryargirtinê di herêman de (di maneya xwecihî de) bi pêş bixin û pêvajoyeke fonksiyonel a rêxistinbûna cewherî bi pêş bixe. Hewce dike girêdayî bi mantiqa peymana nû, avanî-pêkhateyên xweser hê li jortir xwe bi rêxistin dikin ên eleqadar bi Kantonan ve di bin navê 'rêveberiya xweser' de werin bi pêşxistin, modelên wan bi baldarî û bi hesesiyet werin bi destgirtin û bi şiklê koordînasyon werin tengkirin. Niyet çi dibe bila bibe, her çendî navên wan ji destêyê wekî boyut hatibe guhertin jî, meclisa her boyutê wekî tedbîr hatibe bi pêşxistin jî, eger pergala demokrasiya radîkal û demokrasiya xwecihî neyê çalakkirin (neyê meşandin), wê aliyek ji bo navendîbûne vekirî bimîne. Di encemê de zemînek ku li ser avanî-pêkhateyên otonom-xweser zextê dike û wan bê rol dihêle bi pêş bikeve. Ji derveyê rewşên ku rasterast di binê bandora çendek buroyên navendî ku taybet in û berjewendiyên giştî yên neteweya demokratîk yanî giştî eleqadar dikin, ji derveyê ku ew jî bi şiklekî konfederal têne birêxistin kirin, hemû biryar û selahiyet ji civakê re hiştin hewcedariyekeparadîgmayê ye. Bêyî ku ev feraset û biryardarî bi pêş bikeve û bêyî ku bandorên neyînî yên li ser pêvajoya herikîna komîn û meclisan ji holê werin rakirin, aşkere ye ku pergal nikare fonksiyonel bibe û bi rola xwe rabe.

**Rêya herî bingehîn ji bo xwe gihandina van esasan, li ser bingeha ku ji komîn û meclisan dest pê bike boyutên neteweya demokratîk heta bi avaniyên rêveberiya xweser bi rêxistin kirin e**

Hêzên pêşeng ên esasî ku di komîn û meclisan de boyutên neteweya demokratîk bi temamî bi rêxistin bikin û îradeya wê derxin holê, tevgerên jin û ciwanan in. Di komînbûn û meclisbûnê de herî zêde bi rola xwe radibin ev beşên civakî ne. Pêwîst e ev di înşaakirina boyutên netewebûna demokratîk de ji her beşa civakî hê zêdetir bi rola xwe rabin. Bi taybetî rola girîng a tevgera ciwanan ne ku tenê xwe bi rêxistin bikin. Wezîfe û berpirsiyariya wê ya esasî ew e ku pêşengiya rêxistin kirina neteweya demokratî û civaka demokratîk pêk bîne. Di xebatên înşaayê yên Rojava de hêza ku herî dûrî vê rastiyê disekine tevgera ciwanan e. Ev hê jî bi temamî nehatiye sererastkirin. Eger xebatên rêxistina komînal demokratîk îro neserkeftî bin, rast nameşin, heta kêmasiyên wê hebin, di vê de ji her kesî zêdetir di destpêkê de berpirsiyariya van hêzên pêşeng heye. Her wiha înşaaya neteweya demokratîk berpirsiyar e ku li herêman di ser boyutan re, di her her boyutên wekî ekonomî, civakî, siyasî, hiquqî, ekolojik, parastina cewherî de xwe bi rêxistin bike.





Mijareke din a girîng jî ew e; hewce dike were zanîn û were fêmkirin ku bêyî şaxsên azad werin çêkirin komîna demokratîk, civaka demokratîkyan jî neteweya demokratîk nayê înşaakirin. Rêber Apo hilweşîna sosyalîzma real wisa pênasekir; "nekarîbû şaxsê xwe yê azad ava bike", perwerde nekirina şaxsê ku pergala wê ya konfederal bide jiyîn, wekî faktora bingehîn îfade kir. Sosyalîzma real ji ber vê yekê ji hev ket. Wê demê wê hişmendî çawa were çêkirin? Rêbertiyê di destpêka wezîfeyên înşaayê de wezîfeyên entellektuel bi cih kir. Pêwîst e were zanîn; wekî wezîfeya destpêkê ya înşaaya ji nû ve ya konfederalîzma demokratîk, bêyî ku wezîfeyên entellektuel werin pêkanîn, ji beriya ku hişmendiya wê were çêkirin, herî kêm bêyî ku ji hişmendiyê were destpêkirin ya din bi pêş nakeve. Di sosyalîzma real de derketiye holê ku bi rêbazên zext dayina li ser civakê, mayinde nebûye. Hedefa rêbazên wekî hişmendî bi xebatên entellektuel xurtkirinê, bi her awayî xebatên bi armanca perwerdeyê, propaganda, ajîtasyon, çêkirina zanebûnê û rêbazên din ên qeneakirinê, hewce dike çêkirina hişmendiyê be û di vê de israr werekirin.







# ŞOREŞA 19'Ê TÎRMEHÊ

# HER TIŞT DI JÎYANÊ DE TÊ QEZENCKIRIN!

ROZAN MÊRDÎN



Wek tê zanîn li Rojava di sala 2012'an de şoreşa gel pêk hat û ev pêvajo hîn berdewam e. Niha em pêwîste di hûndire şoreş de şoreş çêbikin. Bikevin nava kitekiteyan û şoreşa xwe çandî bikin. Şoreşa çandî çênebe em nikarin behsa şoreşe bikin.

Beguman di hundire şoreşe de şoreş hatin jiyan kirin û pir guhertinên bingehîn çêbûn. Lê ya girîng me bi şoreşe çi dixwest û me çi kir? Pêwîste em li ser van mijaran bifikirin. Li Rojava şoreşa ku çêbû hêvî da mirovahiyê, bû deriyeke nefes girtine. Projeyên ku pêk hatin, di civake de guhertinên bingehîn çêkir. Pergala hevserokatî, netewa demokratik, komîn, meclîs, reveberiya xweser, kooperatîf, parastina cewherî û hwd, tev bi heza xwe ya cewherî pêk anîn. Di vir de ya girîng emê şoreşa xwe çawa mayinde û gerdunî bikin e. Di serî de ji bo jiyana azad em ava bikin pêwîste em di jiyana xwe de guhertin çêbikin, jiyaneke alternatîf ava bikin.

Ji bere ve jî pir şoreş hatin jiyan kirin lê di dawiye de bi pergale re bûn yêk, çima? Ji ber şewaza jiyana pergala desthilatdar derbas nekirin. Lewma mijara herî zede em li ser bisekinin emê jiyana azad çawa ava bikin e. Reber APO got "şoreşa civakî û jiyana nû" û bi berdewam got, her tişt di jiyanê de tê qezanç kirin.

Ji bo şoreşa me mayinde bibe bi qanûn, hiqûq, sepandinên derve zedetir bi guhertina hişmendî yanî bi dînamîkên xwe yên hûndirîn emê xwe ava bikin. Wek tê zanîn tekoşîna me di bingeha azadiya jin de pêş ket. Çiqasî jin xwe nas kir, guhert, zincîre koletiye hilweşand di civake de jî guhertinên bingehîn çêbûn û ber bi azadiyê meşiya. Di cihane de jî wisa ye; jin, çiqasî dikeve tevgere, rexistinbûna wê pêş dikeve, paşverutî û desthilatdarî deşîfre dibe, pirsgirêkên dîtir jî xuyayî dibe. Rexistinbûn çiqasî pêş dikeve demokrasî pêş dikeve, pirsgirêk şenber dibin. Îro jî şoreşa me bi YPJ, jineoloji tê nas kirin û cîhan li derdora van kom dibe. Ji bo vê li ser şoreşa jin sekinandin girîng e.

Li Rojava guhertina jin, zilam, malbat û derbas kirina zayendperestî pir stratejik e. Îro li cîhanê mirovahî li derdora durişmeya "jin, jiyan azadi" de kom dibin. Di sedsala 21'emîn de tevgerên ku azadiya jin ji xwe re neke bingeh û li ser wê xwe ava neke derfeta wê ya serkeftine nîne. Lewma di pêşengtiya jin de pêwîste em şoreşa civakî pêk bînin. Ji bo serkeftina vê şoreşe bi qasî jin, berpirsiyarî dikeve ser aliyê zilam jî. Wekheviya jin û zilam esas girtin, li ser hevjiyana azad jiyaneke sosyalist ava kirin, malbat demokratik kirin, demokrasî esas girtin û li ser ve hîme xwe ava kirin wê bi me bide serxistin



## Zanista Civakî Pêşxistin Çareserîya Bingehîn e

Her şoreş di bingeha zanist de pêş dikeve. Şoreşa me jî demokrasî dike bingeha xwe û li ser esase demokrasîya sosyalîst pêş dixe. Nave birdoziya me sosyalîzma demokratîk e. Serokatî dibejê “şoreşgeriya bê zanista civakî yan xiyanetê dike yan jî cînayetê dike.” Lewma pirsgirekên ku em jiyan dikin bi nerandineke ilmî pêwîste em binerin û çareseriyê bigerin.

Zanist, ji bo çareseriya pirsgirêkan heye. Ger çareserî pêşxist zanist e, ger pêşnexist tê wateye ku li wir zanist nîne. Rojhilatanavîn, çima ewqas di bin pirsgirêkan de ye? Ji ber ku zanista xwe pêş nexistiye û bi çave zanista cihana rojava ya pozîtivîst û oryantalîst li mesele dinihere. Heta niha zanista ku cihana Rojava pêş xist bi perçe ye û yek aliyê. Di serî de pêwîste em ve derbas bikin. Li gorî rastiya civaka xwe, curbecurbûne wê berçav girtine re zanist pêşxistin pir girîng û jiyanî ye. Civaknasî pêwîste objektîf be û li gorî rastiya civake tevbigere, çareseriyan pêş bixe. Pirsgirekên ku di hûndire civake de derdikevin emê çawa çareser bikin pêwîste li ser wan sere xwe bieşînin, rê û rêbazan bigerin. Nerandina xwe ava bikin.

Ji bo ji pirsgirêkan re çareserî bibînin serokatî paradigmaya civaka demokratik, ekolojik û azadiya jin pêş xist. Wekî tê zanîn pirsgirekên herî bingehîn di demokrasî, ekolojî û azadiya jin de kûr dibê Lewma çareseriya xwe jî emê di vir de pêş bixin. Çareseriya me paradigma me ye, li cihekî dîtir em negerin.

Emê Çawa Xwe Bi Rêvebibin?

Pirsgireka me ya bingehîn di xwe revebirine de ye. Projeya me jî reveberiya xweser a demokratik e. Yanî gel wê xwe bike îrade û xwe bi rê ve bibe. Ji ber ku xwe bi rêvebirin esase hebûn û azadiyê ye.

Wek tê zanîn niha krîza reveberiyê heye. Ji ber wê pirsa “emê bi kîjan şewazê xwe birevebibin” pir girîng e. Çareseriya me ji krîza ku tê jiyan kirin re reveberiya xweser a ku xwe bi şewaze konfederalizma demokratik rexistin dike ye. Çanda me çi be polîtîka me jî ew e. Heta niha siyaseteke ne li gorî çanda me ji me re dihate sepandin ew jî netew-dewlet bûn. Ev siyaset gele herêmê ya ku bi hezaran salan bi hevûdu re jiyan dikirin kir dijmine hevûdu. Lewma Konfederalizma Demokratik çareseriyeke ji çanda me re guncav e.

Niha li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî pir netew, bawerî, nerandinên cûda, beşên cûda yên civake hene yanî avaniyeke kozmopolitîk e. Ji ber wê jî çareseriya me li gorî rastiya me ye. Ne ku em hevûdu perçe bikin lê belê divê yekbûnê esas bigrin. Serokatî Netewa Demokratîk ji bo me pêşniyar kir û got: **“Ger azadiya wê ji azadiya gelên dîtir û azadiyên nû re rê vedike di wateya rastîn de azadi ew e.”** Ji bo wê tenê xwe esas girtin zedetir bi yekîtiya gelên herêmê re em bawer dikin ku emê xwe azad bikin. Lewma bê ku hejmar, bawerî, ziman, netewan binerin têkilî pêş xistin û jiyana hevbeş esas girtin pir girîng e û di şoreşa Rojava de ya ku pêk hat jî ev bû. Ji ber çi dibe bila bibe her netew, bawerî, ziman mafe xwe ya jiyan kirin û domandine heye. Ger em bi hevûdu re jiyan dikin wê demî divê modelekî li gorî wê ava bikin.

Her civat xwe bi şewazeke xweser rexistin dike lê têkiliye xwe bi hevûdu re wê demokratik be. Di vir de tevahî çavkaniyên welat yê tevahî gel e û li ser esasê edaletê civakî tê parve kirin. Ger li cihekî av nîn be cîhen dîtir wê alîkar be, li cihekî genim nîn be wê li ser gelê herêmê were belav kirin. Ger li ser welat xeteriya şer hebe herkes berpirsiyar e ku welate xwe bipareze. Di vir de mijarên ku me bi hevûdu re girêdide çi ne û em yekîtiya ruhî û fikrî çawa çêbikin e. Çiqasî par ve kirin çêbibe ewqasî bi hevûdu re girêdan û yekbûn çêbibe. Ger li Tebqa jinek tê qetil kirin ev pirsgirêka me ya hemûyan e. Ger pirsgirêka pêdiviyên bingehîn li Halebê hebe ev pirsgirêka me ya hemuyan e.

Divê em bi vê hişmendiye tevbigerin. Ji bo xwe bi rêvebirinê jî civak polîtik kirin pêwîste. Ew jî bi çanda demokrasî, bi siyaseta demokratik wê pêşbikeve, ku jin pêşengiya wê dike. Çareseriya jin xwe bi çek kirin, şer û hilweşandin zedetir; piştgirî, civakbûn û hilberîn e. Jiber ku ev taybetmendiyên bingehîn yên jin in. Li derdora çanda jin civakbûna ku ava bibe heqîqeta perçebûyî wê yekpare bike û bike îrade. Desthilatdariya ku niha di asta herî jor de xwe rexistin kiriye û bûye sedema perçebûn, şer, talan û tûne kirina xwezaye encex bi siyaseta demokratîk dikare were biçûk kirin. Azadî û wekhevî bi siyaseta demokratîk tê qezanç kirin.

Wekî dîtir ji bo em deskeftiyên xwe mayinde bikin pêwîste em xwe bi pergal bikin ew jî bi hevpeymana civakî dibe. Lewma hevpeymana civakî pir girîng e. Hevpeymana civakî peymana gel e. Gelên Bakûr û Rojhilatê Sûriye li ser esase hevpeymana civakî wê xwe bikih yek. Xalên ku di hevpeymanê de derbas dibin wê bibe çanda jiyanê. Wekê Îbn-i Xaldun dibêje; **“şoreş dema ku bibe çand, têk naçe”!**

Ji bo şoreş bi serkevin beguman aliyê wê ya xwe parastina fizîkî jî pir esas e. Wek tê zanîn di her alî de hezên hegemon naxwazin şoreşa me ji gelan re bibe heza çareserî û alternatîf. Lewma dixwazin şoreşa gelan bifetisînin. Li hemberî wê bi çanda demokrasî xwe kirina vîn û xwe spartina hêza xwe, bi tifaqa gelan pêşxistina şere gelê şoreşgerî ve xwe biparezin. Emê diruşmeya Rêber APO ji xwe re esas bigrin; **"Ger hêza me ya li hemberî hemû hêzên cîhane şer bikin hebe jî emê erîşê nekin; lê ger hemû cîhan li ser esasê tûnekirina me werin ser me, emê mafê xwe yê parastinê bi kar bînin".**

**Bi Aborîya Civakî Emê Xwe Azad Bikin**

Niha pirsgirêkên pir ciddî yê aboriye hene. Ji ber ne aborî lê belê qirkirina aborîyê heye. Deshilatdarî civakan bi rêya birçîbûne terbiye dike, îradeya wan dişkîne û bi xwe ve dide giredan. Aborî, wek banka û tîcaret tê dest girtin. Ji ber wê jî pirsgireka aborî her diçe girantir dibe. Lewma pirsgirêka aborî pir girîng e ku li ser were sekinandin.

Bazar wê çawa be? Hilberîn wê li ser kîjan esasan were bi pêşxistin? Rêber APO got "eko aborî" yanî aboriya ekolojîk. Rêgeza me ekolojî ye. Niha li cîhane hilberîn bi lêza xwe ya herî dawî pêşdikeve, çavkaniyên bin erd û ser erd, dîsa feza bi xwe jî bûye cihe zibale; her der zibale ye. Ger hêzen hegemon aborî bisekinînin wê hilweşin; lê ger nesekinin wê ekolojî hilweşe. Lewma aborîya ku were pêşxistin pêwîst e pêdiviyên bingehîn ên civake esas bigre û aborîyeke bi derdora xwe re dostanî esas digre pêş bixe.

Aborîya me xwe dispere çandinî û xwedî kirina sewalan. Ji şoreşa neolîtîke heta niha civak li ser çandinî û sewaldariye jiyan kir û dike. Lê niha pergala sermeyadar ên kapîtalîst, dixwazin vê tûne bikin. Bala xwe bidin, niha her tişt bi şewaze sinaî tê pêş xistin, tiştên xwarin û vexwarine êdî bûne sinaî. Ev çandeke cuda ava dike. Ji ber xwarin ne tenê ji bo jiyan kirineye, ew di heman demê de çand e jî. Nêrandina jiyanê, têkiliya bi xwezaye re ye. Pergala kapîtalîst a niha mirovan ji ax, ked û xwezayê dûr dixe û çandeke ji jiyanê qut ava dike. Bi taybet di van salên dawî de di hişmendiya mirovan de xwe aîdî tû cihî nedîtin, xwe bê nasname dîtin ve girêdana mirovan bi ax û welat re ji holê rakirin. Ji ber wê di asta herî jor de bê exlaqî pêş dikeve. Mirov bi rehetî dikarin axên ku bi hezaran sal in li ser jiyan dikin biterikînin û bi buhaya ku di behran de nokî avê bibin diçin welatên ku ti girêdana wan li wan deran nînin. Jiyan dadikeve asta tenê xwe têr bike, nefes bigre û bide. Mirovan tîne wê halî ku wek miriyên li ser lingan bigerin.

Ji bo ku li ser kokên xwe em xwe ava bikin serokatî kooperatîfên Dicle-Fırat a çandinî û avdaniyê pêşniyar kir. Em di navbera du çeman ku di diroke de wek bihuşt dihat pênase kirin de dijîn. Derfetên me hene ku em li ser esasa çanda ku beriya hezaran salan li ser van axan bihûşta mirovahî ava kirin, ji nû ve çanda xwe zindî bikin û xwe bi nasname bikin.

Bi gotineke Antonio Gramsci dixwazim bidawî bikim:

"Xwe perwerde bikin, ji ber wê pêdiviya me bi tevahî zekayê we hebe.

Zindî bibin, ji ber ku wê pêdiviya me bi tevahî coşa we hebe.

Xwe rexistin bikin, ji ber ku wê pêdiviya me bi hemû heza we hebe."







